


# NÜDEM

No 12 1994



Kovara Huneri, Edebi û Çandî

# WEŞANÊN NÛDEMÊ

## MEHMED UZUN

### HÊZ Û BEDEWIYA PÊNÛSÊ

Ev pirtûka han ji nivîsên M. Uzun yê ku berê di kovar û rojnameyên kurdan de hatibûn weşandin pêk tî. Hemû nivîs li ser rewşên bîriya kurdî û problemên rewşên bîrên kurdan in. Pirtûk 203 rûpel e.

## ROHAT

### DI FOLKLORA KURDÎ DE SERDESTIYEKE JINAN

Heta niha li ser jinên kurdan pir kêm lêkolîn çêbûne. Rohat di vê lêkolîna berfireh de li ser jinan, rola jinan di civatê de û erotîzmê rawestiyaye. Pirtûk 153 rûpel e.

## CELADET ALÎ BEDIR-XAN

### BINGEHÊN GRAMERA KURDMANCÎ

Li ser navdêr, mêjer, tewang, veqetandek, pronav, rengdêr û gelek term û formên din yê gramercî ye. 93 rûpel e.

## JOHN STEINBECK

### MIŞK Û MIROV

Mişk û Mirov di derheqê du karkerên çiflikê; Georgeê hûrik û biaqil û Lennieê girs û kêmaqil de ye. Herdu heval ji hev naqetin, ew mîna goşt û neynûkê bi hev ve ne, her tiştên xwe bi hev re par ve dikin, heta ew şirikên xewn û xeyalên hev in jî.


Ev romana kurt resimekî jiyana karkeran yê Amerîkaya salên silih radixe ber çavan. Werger: **Firat Cewerî**, 126 rûpel.

## DOSTOYEVSKÎ

### ŞEVÊN SPÎ

Di Şevên Spî de Dostoyevskî perîşanî, şerpezetî, tenêti, rebenî û evîna du mirovên dilpak; Nastenkaya hîvdeh salî û xortekî bîst û şeş salî bi hostetî tîne ziman.

Werger: **Firat Cewerî**, 79 rûpel.



# NÛDEM

ovara Hunerî, Edebî û Çandî

Xwedî û Berpirsiyar  
Chief Editor

**Firat Cewerî**

Hejmar 12  
Zivistan: 1994

Şertên abonetiye (salek)  
Swêd: 190 Kron  
Welatên din: 39 Dolar

Postgiro: 636 36 25 - 2

ISSN: 1103-1964

Wêneya bergê: E. Kelho

Pergala berg û rûpelan:  
Nûdem

## Hevkarên Nûdemê

Mehmed Uzun, Nacî Kutlay, Zeynelabidin  
Har, Xelil Duhokî, Mehlûz Mayî, Hesenê  
Metê, Husên Düzen, Sebri Botani, Havîz  
Qazî, Şahînê B. Soreklî, Bedirxan  
Epözdemir, Tosinê Resit.

## Navnîşan Adress

Termov. 52, 2tr.


75 77 Järfälla-Sweden

Tel û Fax: 8-583 564 68

# N A V E R O K

- 4 NÛDEM BÛ SÊ SALÎ ♦ **Firat Cewerî**
- 6 REXNE Û EDEBIYAT ♦ **N. Zaxûranî**
- 11 HELBESTEK JI ♦ **Taha Xelîl**
- 13 BÎRA QEDERÊ ♦ **Mehmed Uzun**
- 32 BARAN ♦ **M. Saîd Alpaslan**
- 33 ÎNTELEKTUELÊN KURD Û POLÎTÎKA ♦ **S. Sulevanî**
- 38 HELBESTEK JI ♦ **Necîb Balayî**
- 45 NIMÊJA SER BALGÎ ♦ **Tosinê Reşîd**
- 52 XELATGIRÊ NOBELÊ YÊ ÎSAL ♦ **Kenzaburo Oe**
- 53 HÎVÎ BERWARÎ ♦ **Xelîl Duhokî**
- 56 ÎNTELEKTUELÊN KURD ♦ **Cemil Gündogan**
- 60 CEJNA XIDIRNEBÎ ♦ **Aza Ozmanya**
- 64 PÛŞKÎN ♦ **Suleyman Demîr**
- 70 XELATGIRÊ NOBELÊ YÊ PÊŞÎ **Sally Prudhomme**
- 71 YÊ MEKSÎKÎ ♦ **Jack London**
- 92 HELBESTEK JI ♦ **Mervanê Keleş**
- 93 GIRTIYÊ ŞEVA REŞ ♦ **Firat Cewerî**
- 103 ŞÊX MEMDÛHÊ BIRÎFKENDÎ ♦ **Z. Zinar**
- 107 ÇEND NAMEYÊN KAFKA
- 112 BERD ♦ **Mehabad Qeredaxî**
- 114 XEWN ♦ **Tengezarê Marînî**

# NÛDEM BÛ SÊ SALÎ



**Firat Cewerî**

**P**ayizan dawiya rojên Swêdê yê dirêj tên, dirêjîya şevan dest pê dike. Piştî wê jî berfa zivistanê bi ser Swêdê ve digire. Ev berfa ku derengê payizan dibare, heta destpêka biharan jî li erdê dimîne. Bi xêra hin cejn û şahiyên, zivistana dirêj, reş û sar li swêdiyan hebekî kurt dibe. Cejna Noelê di dawiya meha donzdehan de tete pîrozkirin. Ev cejna ku ji motîvên dîni zaye, ji aliyê biçûk û mezin, çep û rastên swêdiyan ve tete pîrozkirin. Herweha şahiyêke din di vê mehê de heye, ew jî bûye mîna cejneke swêdiyan ya neteweyî. Ev cejna dawî jî xelata Nobelê ye. Li Swêdê bi navê Nobel gelek xelat tene belavkirin. Lê xelata herî balkêş xelata Nobel ya edebiyatê ye. Ev xelata ku ji sala 1901'ê û vir ve tete belavkirin, her sal baleke ecêb dikişîne ser Swêdê. Xeltgirê yekem yê vê xelatê Sully Prudhomme'yê fransî bû û yê îsal jî Kenzaburo Oe'yê japonî ye.

Em jî digel xemgîniya dilê xwe, derxistina kovara xwe, li vê welatê ku welatîyên me di çirokan de jî navê wî nebihîstibû, berdewam dikin. Berî sê salan, me bi dilşahiyeke bêpîvan dest bi weşana Nûdemê kiribû. Îro, piştî sê salan em dîsan bi dilşahiyeke bêpîvan jiyana wê ya weşanê didomînin. Lê di hundurê van sê salan de li dinyayê û li welatê me gelek guhertin çêbûn. Di van guhertinên hem erîni û hem jî neyîni de, gelek gundên kurdan hatin şewitandin, tibabek kurd koçber bûn û bêhejmar mirovên xwende, nivîskar û rewşenbîr hatin kuştin. Di nava vê kategoriya dawî de pir kesên nêzîkî min jî hebûn. Piştî apê Mûsa, hevlingê min Mehmet Sincar, birayên du hevalên min yê herî nêzîk, birayê min yê jî min biçûktir û komek dost û merivên min. Û gava ez van çend rêzan dinivîsînim, Xwedê zane li welêt çi diqewime. Herçiqas em dixwazin edebiyatê û siyaseta rojane ji hev veqetînin jî, dîsan rewşa welêt me dikişîne nava siyasatê.

Lê mîna ku me di pêşgotina hejmarê yekê de jî dabû xuyakirin, me hetanî niha bêhêlbûna xwe ya rêxistinî parastîye. Ji xwe

armanceke me ya ku em ji siyasetvanan re bibin alternatîv jî tune ye. Edebiyat û siyaset, huner û partî, kultur û tevgerên siyasî ne alternatîfên hev in. Lê dikarin nêzikî hev bin, bi hev re bixebitin, kêmasiyên hevdu rast bikin, rê nîşanî hev bidin, an jî riyên nû li ber hev vekin. Yê me jî bi qasî ku em hewcedarî tevgerên kurdan in, em ewqasî jî dixwazin ji wan re bibin piştgir û alîkar. Bi riya edebiyat û hunerê em dixwazin kultura bingeha tevgera kurdî bilind bikin, rewşenbîriyeke ji biyanîtiyê danisîfî ava bikin. Ev xwestek e, armancek e; her xwestek û armanc jî bi ser nakevin. Lê ji bo biserketinê em bi înad li ber xwe didin. Ev sê sal in, ji bo ku em Nûdemeke tekûz, demokratîk û bi nave-rok pêşkêşî kurdan bikin, em bi şev û roj dixebitin. Lê belê hûn ê bêjin, ma gelo bi rastî jî Nûdem tekûz û bê kêmasî ye? Na, bi qasî qencyên Nûdemê kêmasiyên wê jî wê hebin. Çawan ku em qencyên wê bi hev re ava dikin, em ê kêmasiyên wê jî bi hev re ji navê rakin.

Digel başî û xerabiyên xwe, mîna ku hûn dibînin Nûdem gihîştîye hejmara xwe ya 12'an. Yanî sê salên xwe dagirtiye û dikeve sala çaran. Em behsa zehmetiyên van salan nakin, lê serfiraziya van salan ji me re rûmeteke mezin e. Di jiyana çapemeniyê de, em di hundurê van salan de fêrî gelek tiştan bûn. Em hêvîdar in, hûn ê berhemên tecrube-yên van salan di rojên pêş de di nava rûpelên Nûdemê de bibînin.

Tiştêkî din jî heye, ku em ji guhertinan hez dikin. Em ji guhertinan natirsin. Guhertin nîşana pêşketinê ye, qanûneke diyalektîkî ye. Pêşketin xwenûkirinê bi xwe re tîne. Xwenûkirin gaveke pêşverû ye.

Guhertinên ku em dixwazin di Nûdemê bikin, ne tenê guhertinên şeklî, herweha em dixwazin guhertinên naverokî jî tê de bikin. Yanî qet nebe em dixwazin di her hejmarê de, nivîsek an jî çend nivîsên teorîk û ilmî hebin. Ji bo vê yekê jî em ê bi zanayên kurdan re têkevin danûstandinê, bê ku em li îdeolojî û nêrînên wan yê siyasî binihêrin, em ê ji wan daxwaza nivîsên di vî babetê de bikin. Nivîsên fêrker û ji dijminatîya kes û rêxistinên dîr...Guhertinê şeklî ku me di vê hejmarê de kirine, mîna ku ji we ve jî xuyaye, bi kurtî ev in: Me stîla nivîsê guhert, em ji Timesê derbasî AGaramondê bûn. Me xêzên nava stûnan rakirin, stûn hebekî firehtir kirin, di binê xêza bin rûpelan de, me navê Nûdemê, hejmara wê û demsala wê nivîsand. Sernavên nivîsan, tîpa destpêka nivîsan, navê nivîskaran jî hatine guhertin. Herweha me rengêkî din da nivîsa "Editorial" jî. Ev nivîsa ku ez ê di her hejmarê de binivîsînim û wê bêtir agahdariyên li ser kovarê bin, wê ji du rûpelan nebuhurin. Herçî dosya kovarê ya demsalî ye wê bi celebêkî din bidome.

Lê bi raman û pêşniyazên we em ê guhertinên hê xweştir di kovarê de bikin. Ji bîr nekin, Nûdem ya we ye jî!

Bê hêviya salên xweş, bê şer û pevçûn, bê kuştin û xwîn, bi aştî û evîn...✍

# REXNE Û EDEBIYAT

N. Zaxûranî

Rexne diyalog e di naberaxwendevaran û metnên edebî de. Bi saya rexneya zanyarî çeşnên edebî geş dibin. Mîna kulîlkên biharê yên rengîn tên xemilandin. Ger îro edebiyata kurdî weke edebiyata gelek neteweyên hevçax di serpehatina pêvajoka dîrokî de nepîşkivî ye û hêdî hêdî geş nebûye, li gel gelek faktorên din yên netewî û navneteweyî - ku bi saya ronakbîrên me yên tradîsyonî pêwendiyên edebiyata me bi ronakbîr û edebiyata cîhanê re birin - kêmasî û valahiya rexna edebî cihêkî xwe yê girîng di dîroka edebiyata kurdî de dide nîşandan. Herwekî ku têtê zanîn, sê faktorên herî girîng ku ew jî ji nivîskar, xwendevar û rexnegir pêk tînin, dibin bîngeh ji bo geşbûna edebiyata niştîmanekî. Heger em bi awireke zanyarî li dîroka edebiyata kurdî binêrin - ji ber hoyên ku tînin zanîn, hingê mirov dibîne ku edebiyata me ji van faktorên ku di rêzên jorîn de hatine zîman, bêpar e. Vê bêpariyê tesîreke mezin ya negatîv li ser edebiyata kurdî kirîye. Eger bi awirekî zanyarî rê lê neyê girtin wê vê tesîra xwe ya neyînî her berdewam bike.

Ji aliyê din ve baş têtê zanîn ku welatê me kurdan hatiye kolonîzekirin. Dijminên kurd û Kurdistan welatê me di nava xwe

de perçe kirine. Civata me kurdan bi alîkariya pêkolya xwe tar û mar kirine. Hê jî ew wêrankirin ji aliyê dagîrkeran ve li seranserê Kurdistanê têt bi cih kirin. Ji ber vê yekê jî rewşenbîrên Kurdistanê tu mecal nedîtine ku edebiyata xwe pêş ve bibin. Bi gotîneke din her tradîsyoneke ku ji aliyê ronakbîrên Kurdistanê ve hatiye lidarxistin, bi hemû şeweyên barbariyê ji aliyê dagîrkeran ve hatine serkurtkirin. Di rewşeke weha kambax û wêran de bi hêsanî tu edebiyat nikarin tradîsyon û hebûna xwe li gor ku ji wan têt xwestin pêş ve bibin û berdewam bikin.

Wêzîfa rexnegir ya pêşîn ew e ku girrikiyê ji ser metnên edebî rake, da ku xwendevarên hêja baş di naveroka metnên edebî de bigihîjin. Bi vî awayî jî metnên edebî bi awayekî diyalektîkî ji hemû avahiyên din yên îdeolojîkî û polîtîkî tê veqetandin. Çi ku herçiqas tekstên edebî ne belgeyên dîrok û îdeolojîkî bin jî kêma zêde di wan de dîrok û îdeolojî hene. Çi ku mijara edebiyatê ew e ku jiyana mirovatîyê ya civakî li gel hemû xeml û hêzên wê bi alîkariya zîmanekî zelal îfade û temsîl bike. Bêguman vê yekê romanîvîser bi awayekî û şair bi awayekî din pêk tîne.

Rexna edebî divê ku hîmên xwe yên bin-

gehîn baş nas bike. Lê belê divê ku rexna edebî rastiyê bi van hîmên xwe ve tixûb neke. Çi ku zanistiya edebî nabe ku mirov bi tu sînoren "fermî" ve girê de û bi wî awayî pêşiyê li geşbûna wê bigire. Herweha lêkolîna dîroka rexne, angorexna edebî di kîjan şert û şîrûdên dîrokî û civakî de derbas bûye û ji bilî wê jî rexna edebî li ser çi bîngehî û bi çi amancê têt bikaranîn, pêwîstiya herî girîng ya dîrokî ye ji bo rexnegiran. Ma gelo em weke rexnegirên sosyalîst yê Kurdistanê divê ku bi çi awayî dest bavêjin rexna edebî? Bi gotineke din, wê pîvanên me yê rexna edebî li gor kîjan norman bêne ava kirin?

Berî her tiştî divê baş bê zanîn ku rexna Marksîstî ya edebî ne bi tenê hebûna xwe bi alîkariya berhem û rexneyên edebî yê kevînar berdewam dike. Bêguman tesîra wan li ser pêşketina rexna edebî têtê kirin, lê eger ku rexna edebî nikaribe van rexneyên edebî yê klasîk ji hev vewejêre û li gorî demê ku jê têtê xwestin tu gavên dîrokî navêje, hingî wê rexna edebî dîr an nêzîk li ber şek û pêlan biçe. Ji ber vê yekê jî divê rexna edebî ya Marksîstî berhemên edebî bi şew û rayên materyalîstî mîna gundiyan Kurdistanê qirş, zîwan û genim ji hev vediqetandin, bi wî awayî divê ku rexnegirên sosyalîst pîrşîrêkên edebî ji hev vewejêrin. Bi ya min mirov dikare wezîfên rexna Marksîstî ya edebî bi awayê ku wê di rêzên jêrîn de ji bo xwendevanên hêja bêne diyarkirin, şîrove bike.

Her berhemeke edebî şeweya hunera wê çi dibe bila bibe, dîsan li ser jiyana civakî têtê hûnandin. Ji xwe weke têtê zanîn jiya-

na civakî pîralî ye û hemû şeweyên tevgeran - çi kevin an nûjen bigire - di xwe de bi cih û war dike. Ji aliyekî ve tevgerên polîtîkî, ji aliyê din ve tevgerên demokratîkî, aborî û felsefî jiyana civakî dineqîşînin. Ji ber vê yekê jî ez dibêjim ku wezîfa rexnegiran ya herî girîng ew e ku fikra ku ji aliyê nivîskar ve di berhema edebî de pêk hatîye, bêguman berhema edebî pê têtê xemilandin û herweha ji aliyê nivîskar ve divê ku wê xeml û xêza wê ya hunerî bi jiyana civakî ve bê girêdan. Çi ku mirov bi vê perspektîva civakî li geşbûna berhemên edebî di serpêhatina pêvajoka dîrokî de nemeyzêne. Hingî fenomenên edebî jî jiyana civakî têtê qutkirin û bi vî awayî jî têtê abstrakkirin. Abstrakkirin jî di ser pêkhatina dem û dewranan de dibe hoyê îmajkirina wan. Ji ber vê yekê jî bi giştî berhemên hunerî û bi taybetî berhemên edebî jî aliyê hinek êkol û nûnerên van ve bi yekalî bi felsefê ve girê dane. Ev girêdana çewt jî dibe asteng ku edebiyat weke birekî zanyarî û serbixwe di jiyana civakî de şax û perr dide.

Ji aliyê din ve jî ji ber ku mijara berhemên edebî bêsînor û fireh e, herweha ji berhemên zanyarî bi orjînalbûna xwe ya bi taybet têtê veqetandin û tu carî nayê dubarekirin. Ji lewra divê ku rexnegir berhemên edebî (şîr, roman û hwd.) bi tenê bi jiyana civakî ve sînor neke. Ger rexnegir weha bike, hingî wê berhemên edebî bibin weke fenomeneke dîrokî, felsefî an jî polîtîkî ku ev yek jî dibe kelem ji bo geşbûna hunerê bi xwe.

Weke ku têtê zanîn di vî warî de gelek hevalên rexnegir yê Marksîst hene ku di

derheqê hunerê de xwediyê perspektîfeke çewt û asoyeke teng in. Ji ber ku li gorî van biraderan berhemên edebî xwedî rûmet in, ji ber ku mirov bi alîkariya berhemên edebî dikare bi hêsanî di qonaxake dîrokî de xwe fêrî psikolojiya çîneke civakî bike. Bêguman dîrok û psikolojiya çîneyê dibe mijar ji naverokên berhemên edebî re. Lê belê ku mirov mijarên berhemên bi wan re sînor bike, hingî rûmeta estetîkî ya berhemên edebî tete kuştin. Çi ku wê demê bi tenê berhema edebî dibe belgeyê dîrokî. Lê bila baş bête zanîn ku rastî tiştekî din e. Lewra berî hemû tiştî divê ku berhema edebî xîtabî hîsên min û halê min yê ruhî bike. Ger ku mirov bi awireke zanyarî li dîroka huner ya gelê Kurdistanê binihêre, mirov dikare vê yeka han bi hêsanî serrast bike. Di vî warî de gelek mînak hene, lê ez dixwazim bi tenê li ser MEM û ZÎNA Ehmedê Xanî rawestim. Ez bawer dikim ku gelek hevalan yên ku li ser edebiyat û hunerê mijûl dibin, ew bi rêk û pêk xwendine. Di vê berhema edebî de dîrok, politîka û felsefe heye. Ehmedê Xanî bi alîkariya felsefê bi zîmanekî hunermendî rewşa kurd û Kurdistanê di dema xwe de bi awireke zanistî ji bo me rewşenbîrên kurdan şirove dike. Ji aliyê din ve jî ji bo ku derd û meremên me yên netewî û civakî bêne çareser kirin, wêfên rewşenbîrên kurdan nîşan dide.

Lê belê ger yek ji me rewşenbîrên kurdan vê berhema edebî ya Ehmedê Xanî bi tenê bi politîka û dîrokê ve sînor bike, wê çaxê ew rewşenbîrê kurd Mem û Zîna Ehmedê Xanî ji dinya hunermendiyê diqewirîne.

Lewra weke ku min di xetên jor de jî got, Mem û Zîna Ehmedê Xanî dibe belgeyê dîrokî an jî sosyolojîkî û ne tiştekî din. Lê peywendiyên Mem û Zîna Ehmedê Xanî bi mirovantiyê re ne bi tenê tesîrên dîrokî an jî felsefî ne.

Li gel van tesîrên dîrokî, felsefî û sosyolojîkî jî Mem û Zîna Ehmedê Xanî bi tesîra xwe ya hunerî (şairane) xîtabî hîsên min û halê min î ruhî dike.

Erê, çewtiya van hevalên marksîst ku kirasên berhemên edebî yên estetîkî ji wan dikin û wan tazî dihêlin, ji ku tê?

Mirov dikare vê çewtiya wan bi kurtî weha şirove bike: ev biraderên marksîst têkilîyên di navbera bingehên civakî ku ji aboriyê û çalakiyên maddî pêk tên û sergehê civakî ku ji çalakiyên ramanî, hunerî, huqûqî, îdeolojîkî û kulturî pêk tên bi awayekî mekanîk şirove dikin. Li gora van biraderan bingehê civakî yê aborî sergehê civakî li gora dilê xwe têkûz dike. Bi vî awayî huner û edebiyat jî li gora vê xwestina bingehê civakî yê aborî tete afirandin. Bi gotineke din ku mirov nêrîna van hevalên "marksîst" bîne ser zîman, bi kurtî mirov dikare weha bibêje: kategoriyên estetîkî bi awayekî mekanîk kategoriyên bingehê civakî yên edebî taqlîd dikin.

Lê li gora dîtînen Marks, Engels û mirovên weke Troçkî ku serê xwe li ser pirsgerêkên hunerî eşandine, ji wan biraderên "sosyalîst" ku min di rêzên jorîn de bi kurtî behsa wan kir, xwediyê perspektîvên gelek cûda ne. Çi ku li gora Marks û Engels di navbera bingehê civakî yê aborî û edebiyat û huner de têkilîyêke asîmetrîk heye. Lew-



ra gîhandin û pêşketina edebiyat û hunerê rast û rê ne girêdayiyê avaniya binî ya civakê ye. Edebiyat û huner ji avaniya binî xweser in. Ger ku mirov berhemên Troçkî yên ku li ser huner hatine nivîsandin bi awayekî bi rêk û pêk bixwîne, hingî mirov dibîne ku Troçkî bi awayekî zanyarî li dijî van hevalên "sosyalîst" derketiye û xweserîya huner û edebiyatê li dijî awira wan ya ku bi awayekî mekanîk huner û edebiyatê weke siya avaniya binî ya civatê dibînin, li gora karînen xwe rawestiyaye. Ji ber vê yekê jî ez dixwazim ku em bi hev re guh bidin Troçkî: "Di berhemên hunerî de (Raskalnîkof), ku çî wan dike berhemên hunerî xwe li nezaniyê dideyne. Ev yeka han gelekî eşkere xwe di nêrîna wî ya seyr ya li ser Komedyaya Îlahî ya Dante dide xuyakirin. Li gora nêrîna wî ev bi rûmet e, çî ku di demeke diyar ya dîrokî de psîkolojiya çînekî diyar bi me dide fêhmîkirin. Ger ku pirsgirêk bi vî awayî bê danîn, divê ku mirov Komedyaya Îlahî ji cîhana hunerî bavêje. Eger ku ez bêjim girîngiya Komedyaya Îlahî ew e ku di çaxekî diyar de rewşa psîkolojî ya hinek çînan bi min dide têgihîştin, ev tê wê manê ku ez wê dixim bi tenê belgeyeke dîrokî. Çî ku Komedyaya Îlahî weke berhemê hunerî divê xîtabî hîsên min û halê min yê ruhê bike..." (Troçkî, Edebiyat û Şoreş, r, 7.)

Êdî mirov dikare bi hêsanî bibêje ku hêdî hêdî pirsgirêk têt fêhmîkirin. Bêguman her berhemek edebî di demek diyar ya dîrokî de têt afirandin. Psîkolojiya çînen civakî yên wê dema dîrokî ku berhema edebî têt de têt afirandin, kêm-zêde teksta berhe-

ma edebî pê têt neqîşandin. Lê ku ev neqîşa psîkolojî ya çîneyê xeml û xêza berhema edebî di nav şax û perên xwe de wînda bike, hingî ne Mem û Zîna Ehmedê Xanî û ne jî Komedyaya Îlahî ya Dante dikare xîtabî hîsên min û halê min î ruhî bike. Bêguman hingî tu cudabîna wan ji berhemên dîrokî an jî sosyolojîkî namîne. Ji aliyê din ve jî divê baş bête zanîn ku tu pirtûkên dîrokî an jî felsefî mîna Mem û Zîna Ehmedê Xanî û Komedyaya Îlahî ya Dante ku berî niha bi sedsalan hatine nivîsandin, nikarin mîna berhemên hunerî tesîrê li ser hîsên min û jiyana min î ruhî bikin.

Baş e, mirov çawan dikare tesîra berhemên hunerî ku li mirov bi awayekî hîsî û giyanî têt kirin, şirove bike? Bi gotineke din ev jî çî têt? Bi ya min ev jî vê yekê têt. Dante û Xanî bi zeka xwe ya hunerî rewşa hîsî û jiyaniya mirovantiyê di dema xwe de bi îfadeyên xwe yên bi hêz, kûr û fereh hiştine ku bi ser jiyana dema wan ketiye. Ji ber vê yekê jî berhemên wan yên hunerî bi demî dibin ku kevnar bîna dîtin, lê weke berhemên hunerî wê herdem serçavî bin ji bo mirovên hunermend di serpêhatina dîroka mirovantiyê de.

Lê baş têt zanîn ku mirov nikare xwe ji çewtiyên "nezanê çepan" ku pir caran li ser navê materyalîzma dîrokî ditînin çewt parastine, biparêze. Bi tenê bi alîkariya pîvan û çavkanî yê Marks û Engels rizgar bike û pirsgirêkê çareser bike. Bêguman Marks û Engels jî bo me marksîstan rêçenas û hozan in. Teoriya wan ya bi taybetî heye; "materyalîzma dîrokî" jê re têt gotin. Materyalîzma dîrokî weke hemû zanyariyên civakî di

serpêhatina jiyana civakî de pêwîstiya wê bi geşbûn û pêşveçûnê heye. Ger ku mirov li dîroka teoriya Marks û Engels di serpêhatina dîrokê de binêre, hingî mirov dibîne ku teoriya Marks û Engels di gelek dem û qonaxên dîrokî de derbas bûne. Îro gurrkirin û balkirina wê li hêviya marksîstên serdema me ye.

Ji aliyê din ve jî ez endîşa birêz Şerefxan Cizîrî ku dixwaze persepektîva marksîstîzmê li ser edebiyatê ji lepê “nezanên çepan” rizgar bike, baş têdigihê. Lê ne weke ku ew dibêje: “Bi raya min pîvan û çavkanî divê Marks û Engels bi xwe bin. Pir caran kesên weke Zdanov, Stalîn an jî hinek serok li vî alî û wî alî li ser navê Marks û Engels di warê edebiyat û hunerê de dîtinan pêşkêş dikin. Lê di rastiya xwe de têkiliyên wan dîtînan û ramanan bi materyalîzmê re tune ne.” (Nûdem, hejmar 10, r. 12.)

Rast e, ez bi te re, lê peywendiyên wan “nezanên çepan” ji dûr an nêzik ve bi marksîstîzmê re tune ne. Lê malava, em ê çawan weke marksîstên Kurdistanê, mîna ku tu dibêjî “Bi raya min pîvan û çavkanî divê Marks û Engels bi xwe bin” bikaribin pirs-girêkên hunerê di dema xwe de çareser bikin. Ez bawer dikim bê çawan pirs-girêkên teknolojiya serdema me mirov nikare bi zanistîya teknolojiyê ku ji serdema Marks û Engels maye, an jî weke ku di serdema xwe de Lenîn paşvebirina komunîzmê bi elektro-teknîkê ve girêdida, mirov nikare bi perspektîva wê serdemê pirs-girêkên teknîkî yê îro çareser bike, herweha pirs-girêkên hunerî jî mirov nikare bi tenê bi alîkariya pîvan û çavkaniyên Marks û Engels çareser

bike. Çi ku divê neyê jibîrkirin ku bi awayekî global mirovantî ne di serdema kiştû-kaliyê (zîraetê) an jî di serdema îndustarîzmê de dijî. Êdî civakên gelek welatan keli bi keli xwe li gorî pîvanên civaka înfôrmasiyonê (zanistîyê) jiyana xwe organîze dikin. Ji ber vê yekê jî divê ku mirovên hunermend jî kar û barê xwe yê hunerî li gora pîvanên civaka îro bihûnin, ji xwe dîroka huner jî vê yekê serrast dike. Bê çawan berhemên serdema ronensansê ji berhemên beriya xwe bi naverok û şêwe dihatin veqetandin, herweha berhemên hunerî yê serdema me jî ji berhemên hunerî yê serdema ronensansê bi hemû awayî tînin veqetandin. Vêca dem dema bûxtekirinê (xulasekirinê) ye: Sêwîtî û bêmecaliya edebiyata me kurdan bi hemû kêmasî û rebeniyên xwe tînin xuyakirin. Di nav lepên barbariya pêçekên gurrên ergenekonê de dinale û dikale. Rizgarkirin û pêşvebirina wê li hêviya ronakbîrên Kurdistanê ye. Ji ber vê yekê jî divê ku ronakbîrên Kurdistanê kar û xebata xwe ya hunerî bi serhildanên ku ji aliyê gelê Kurdistanê ve tînin lidaraxistin, bi awayekî bi can pê ve girê bide, da ku em weke hinek êkolên edebî yê rewşenbîrên Kurdistanê ji serçawiyên xwe neyên dûrxistin û bi vî awayî kar û xebata me ya hunerî neyê jibîrkirin. Ji aliyê din ve jî divê ku ronakbîrên Kurdistanê kar û xebata xwe ya hunerî di warekî netewî de nehêlin û peywendiyên bi nûnerên êkolên edebî yê cîhanê re deynin da ku em bikaribin li hember nezaniya “çepên sosyalîst” ku bi awayekî ortodoksî dixwazin pirs-girêkên hunerî “çareser” bikin, rawestin. ❧

# Li Ser Milan Xezal Diçêrin

Îro min dît, tozeke kevin  
ta niha çavên min pê neketibûn...  
Şaxên dûr, min pîvan, bi wan pelên tenik  
ku davêtin ser min.  
Bejna zirav, min didît, ditewiya di bin sêvên xwe de!  
Hirmî û kunciyên li ba yê destê we bela kir!  
Îro, dema dilezand libên hinaran jê diweşîn!  
Pîrekek bi şewq e û heyvek "Esmêr" e!  
Îro, çi gavek radida biyanek dihat der û ez dikuştim  
min jî tiştê nekiriye, ne jî li biyana we dipirsim  
îro, roja wê ye! davêje ser milên xwe û diçe!  
Milên bilind ku Xezal li ser wan diçêrin...  
Pist pist û him hima me diçêrin!  
Xwezka çiya werîsê dost û yaran ba na  
min ê bi alî xwe de bikişanda  
îro çavên min li Gustîlka bi Ronî ket  
û guhestina derengmayî  
û mêrên hişk bûne ji dûrbûnê!  
Îro ez ê şîna xwe xweş hildim...  
Destmalkên yaran ji diwêr rakim  
û bişewitînim wan nanên rûsorbûyî ji evînê!  
Şîlêr û Alalên Qamişlokê ji dest xwe berdim...  
Tevlî qebqeba kewan ku di canê min de ye  
ji hezarê ferşê teht û keviran!  
wilo tenê ez ê xweş zanibim  
û bi dilekî şîna çavan bigirim  
li şitlên kul û birînan!  
Hîn ez xemgîn nebûme  
hîn min bêriya tu kesî nekiriye!  
Hîn ji kesî hez nekiriye  
hîn ez negiriyame  
ne jî xeyidîme!

Yazdeh sal û bîst û pênc rojan li hêviya wê nemame.

Bi rastî, îro ez ê van tiştan tevan bikim!  
Îro çavê min li canê min ket!  
Îro min dizanî ez ji zû ve bêcan im.  
Min dizanî ku ba li wê xe, ez dêşim!  
Û kutkuta çavên min ji ber porê wê ye!  
Tak ji porê xwe di çavê min da ji bîr kir û çû  
Îro, dema bi guliyên xwe ên kesk di min de derbas dibû  
wek ewrekî Xwedê bû... dût û bilind diçû!  
Îro, bayê min ê dawî ji min bir...  
    Pê xweş dihat  
    dereng dima  
    xwe digivaşt di xewa min de!  
Îro, dema bejna rihanî xwe giha li min  
xewn û kilên xwe dizîn...  
    ji bin balîfa min û çû.  
Ew dengê wê ê spî diçû avê  
îro dema di min de derbas bû  
herdu kevokên xwe bilind difirandin...  
Gerdûn baskoyî dikir li min!  
Îro, dema bi herdu milên bilind  
    di min de derbas dibû  
Tevlî Xezalên li wir diçêriyan  
Zîwanoka ser dêmên xwe bi min dadikir.  
Şîlan û şahiya jîyanê tev gêj dikir  
Ez berdidam "Berzexek" kwîr û tarî  
û bi şûrên çavê xwe dihate min  
îro tiştê ku bi min dike  
    nayê bîra kesî  
    ne jî ji bîra min diçe...  
Evîna li ser milên wê min çandî  
    îro bû mêrga Xezalan!

10. 6. 1994 Bern

**Taha Xelîl**

## FOTOGRAF 2

BEDIRXANÎ; MÎRÊN KURDAN,  
XWEDANŞAN, LÊ BINDEST

**E**v fotograf di wan salan de ku êdî gotinên “Ceco, Cecoyê min” li ser lêvan in, tê kişandin. Sal 1895 e, ji deman payiz e. Li hemû Kadiköyê du fotografkêşên hoste hene; Th. Servanis û R. Xendamian. Yê yekemîn cihû, yê diwemîn ermen e. Mîna her tiştê Kadiköyê, fotografkêşî jî di destê endamên milletên têkel de ye. Fotograf û fotografkêşî, hem li Stembol û Kadikoyê hem jî di nav hemû tixûbên dewleta Osmanî de, nav û tiştên nû ne. Nav û tiştên nû ku pir bala xelkê, lê bi taybetî jî pir bala giregir, dewlemend û paşayên dewleta osmanî dikişîne. Berê lewhe û wêne hebûn, niha jî fotograf. Berê wênekêş û resam radihiştin pênûs û firçan û li ser kaxiz û cawan bi rojan, mehan, dixebitûn da ku resimek, wêneyek bînin pê. Lê niha fotografkêş, bi alîkariya makîna xwe, di nav kêliyê de, xebateke demeke dirêj tîne pê. Meriv, rû, çav, dev, nihêrîn, awir di nav biskekê de direşin ser kaxizên taybetî yên spî û dibin nemir.

Fotograf nemiriyê direşîne ser kaxizan. Fotograf rehetîyeke nû, bi riyeke pir erzan, dide merivan. Meriv çî jî bike, çiqas hoste be jî, resim tu carî bi eslê xwe namîne. Hin tişt, hin xêz, hin reng yan kê mîna in, yan jî zêde. Lê fotograf, ev îmkana nû, ne welê ye; her tişt mîna eslê xwe ye. Fotografkêş makîna xwe datîne ser sêpiyê, kêlikê jî çavîka makîne, li kesê ku dixwaze bibe nemir dinihêre, dibêje “dîqet” û pê li qumçîka makîne dike. Ew kurte-dema ku fotografkêş pê li qumçîkê dike, êdî kurte-demek e ku tu carî jî bîr nabe; fotograf hatiye kişandin, kopiyek jî eslê wê hatiye pê û ya girîng, ew kopiyê dê her û her bimîne. Ne



Mehmed Uzun

wext û herikîna wextê ne jî mêjî û kalbûna mêjî êdî dikare wê kurte-demê bide jîbîrkirin. Kopya ku eynî mîna eslê xwe ye, dê li ser dîwaran, di nav bêrîkan de, di nav kaxiz, defter û kitêban de bîn parastin. Meriv dê car bi car, dem bi dem, li wan binihêre û kesê li ser fotografê bi bîr bîne. Ew kes êdî ne wînda ye, bêdeng û bêziman be jî, ew her û her heye.

*"Fotograf û fotografkêşî şoreşeke yekta ye."*

R. Xendamian, fotografkêşê yekta yê Kadikoyê li ser qertêke danasînê ya hunera xwe, bi fransîzî, weha nivisiye. şoreş... Ew ne neheq e. Hem wî hem jî fotografkêşê din ê Kadikoyê Servanis xwendina xwe li Fransê, Parîsê kirine. Haya herduyan jî ji guherînen cihanê, dîtînen nû yên civakî û pêşketînen teknîkî heye. Herdu jî baş pê dizanin ku dinya ketiye nav heyameke nû ya guherînen welê ku her yek bi serê xwe şoreşeke mezin e. R. Xendamian li Parîsê hîn bûye ku fotograf di warê pêşketina merivahî û teknîkê de şoreşeke mezin e. Şoreşeke mezin li hember wext, herikîna wextê, dewr û tarîxê... Fotografek ku îro tê kişandin, sibê û dusibê jî dimîne. Fotografek ku li vir tê kişandin, li her aliyê dinê nemiriya xwe diparêze û didomîne. Ji ber vê yekê ye ku R. Xendamian, li ser eynî qerta danasînê, weha didomîne; "ev şoreşa mezin a pêşketinê ku sala 1839-an keşif bû, niha hatiye nik me Stembol û Kadikoyê. Eger hûn dixwazin, ev şoreşa li ser zimanan alîkarî li we û nasên we bike, kerem bikin... fotograf ê we bike nemir..."

Stembolî, bi taybetî jî Kadikoyî hê nû bîr bi nemiriyê û hunera fotografê dibin. Ew

yek bi yek, rêz bi rêz derin atolyên Servanis û R. Xendamian û xwe dikin nemir. Ew fotografên xwe nîşanî hev didin, wan mîna kitêbeke muqedes di paşlên xwe de vedişêrin û bi serbilindî, car bi car, li kopya xwe dinihêrin. Şoreşa nû xwe gîhandiye Stembolê û pêl bi pêl fireh dibe. Meriv bi hêsanî dikare bibêje ku eger di destpêka salên 1890-an de, li hemû Kadikoyê, du kesên ku şixulê wan herî baş be hene, ew jî Theodore Servanis û Rafael Xendamian in. Belê, pêşnavê wan Theodore û Rafael e. Lê belê tu kes wan bi pêşnavê wan bi nav nake, ew monsiuer Servanis û Xendamian in. Atoljên wan hertim tijî ne. Paşa, zabit, dewlemend, nivîskar, rojnamevan, beg, jin, zarok, pîr û kal hemû tîn, xwe didin hev, li hember makîna reş a ecêb rûdinin, li qulîka biçûk dinihêrin û tiştêkî pir nû û xweş li jiyana xwe zêde dikin; fotograf.

Monsiuer Servanis û Xendamian hem hevalên hev in hem jî raqîbên hev. Bala wan pir li ser xweşî, zelalî û dewlemendiya fotografan e. Kî di van waran de bi ser keve, ew, bêşik dibe hoste û yekta. Li gora gotinan û xweşî û mezindahiya atolyê û neqşên qertên fotografan, meriv dikare bibêje ku R. Xendamian hîn bêtir biserketî ye. Li pişt qertên herduyan jî hin neqş û wêne hene. Li pişt qertên Servanis, stêrkeke şeşkoşe heye. Stêrk li herî jor e. Tîrêjên stêrkê bi xetên xuya ber bi jêr dibin. Tîrêjên ku ji zikê stêrkê derdikevin, her ku dere ji hev vediqetin û navbera wan fireh dibe. Ji nav tîrêjan nivîsarek bi tîpên erebî derdikeve. Li vir bi tîpên erebî weha hatiye nivîsîn; fotografane-i T. Servanis - Kadikoy. Di bi-

nê vê nivîsarê de, îcar jî jêr ber bi jor, bi tîpên latînî weha hatiye nivîsîn; Th. Servanis, *Photografhe - Cadi keuy*. Herçî qertên Xendamian in, li piştta wan, berî her tiştî, du zarok dixuyîn. Zarok li hember hev in. Umrê wan, mîna Celadet, lawê Emîn Beg, ne zêdeyî du salan e. Yek jî wan tazî, yê din bi pêşgîrekî xwe dipêçe. Li ber zarokê tazî makîneyeke fotografê, li ser sêpiyê, heye. Destên zarok li ser sêpiyê, çavê wî li ser qulika makînê ye. Ew hazirîya kişandina fotografê dike. Li hember wî jî, zarokê din, bi rûkenî, li kamerayê dinihêre. Kêfa vî zarokê pir li cîh e, wî piştta xwe daye stûneke xweş a kevnar, bi destan herdu milên pêşgîrê girtiye, piyên xwe di ser hev re birine û bi ken li hember dinihêre; sûretê wî dê, niha, li ser kaxizan derkeve, ew ê, di nav kêlikê de bibe nemir. Ev herdu zarok, bi hev re, wê kurte-dema ku şoreşa nû dike nemir, dijîn. Doraliyê zarokan jî bi pel û gulan rapêçayî ye. Li ser serê zarokan jî, bi tîpên erebî yên mezin, fotografane-i R. Xendamian - Kadikoy hatiye nivîsîn. Îcar li ber lingên zarokan jî, bi tîpên mezin û neqîşkirî yên latînî û bi fransîzî *Photographie*, Raphael Khendamian - Cadikeuy hatiye nivîsîn.

Ji van neqş û nivîsaran jî baş dixuye ku R. Xendamian hîn bêtir hosteyê karê xwe ye. Motîvên zarokan kêf û rehetiyekê didin, nivîsar xweş xuyane û neqîşkirî ne, doraltî jî bîr nebûye û lihevhatî ye. Di ser de jî R. Xendamian fotografên ku reş û spî ne, bi pênuşîne taybetî xweş reng dike. Pêwendîya R. Xendamian û romana Bîra Qederê li vir dest pê dike, R. Xendamian hem fo-

tografkêşekî hoste ye, hem jî ew dostê malbata Bedirxaniyan e. Ji mêj ve ye ku pêwendîya Bedirxaniyan bi ermenan re xurt e. Bedirxanî ermanan mîna cîran û pîsmamên xwe dibînin. Li hember ermenan, ew xwediyê germahiyeke boş in. Kadikoy, warê mîletên têkel, niha bûye stariya kurdan û ermenan jî. Li wir bi qasî kurdan, ermen jî hene.

Mala R. Xendamian nêzikê qonaxa mamê Celadet Alî Şamîl Paşa ye. Ew qata yekemîn wekî atolje û herdu qatên din ên xênî jî wekî mal bi kar tîne. Fotografê duwemîn a romana Bîra Qederê jî destê R. Xendamian derketiye. Wî ew kişandîye. Fikra kişandina vê fotografê jî, dîsan, ya wî ye. Mîr Bedir Xan ku binemala Bedirxaniyan navê xwe jê digirin, hem li Stembolê, hem jî di nav tixûbên fireh ên dewleta Osmanî de navdar e. Ew bi gotin, jîyan, kirin, serpêhatî û serhildana xwe tê nasîn. Li ser wî çîrok hatine gotin, stran çêbûne, pesn lêbûne. Dîfn û bîfîla wî, enî û porê wî, dev û lêvên wî, poz û çenga wî, çav û birûyên wî, bal û bejna wî bûne rêzikên gewher ên dengbêj û çîrokbêjan. Lê belê, ne resim û wêneyek ne jî lewhe û bergehêk jê maye. Kesî bîr nebiriye û lewheyêk wî çênekirîye. Kesî di salên 1850 û 60-an de fotografêkê wî nekişandîye. Ew bi tenê bûye lehengêkî navdar ê serpêhatî û destanan... Ji herkesî bêtir jî R. Xendamian, ji ber karê xwe, bîr bi vê kêmaniyê dibe û li ber vê kêmaniyê dikeve. Loma, ew car bi car jî law û keçên Mîr Bedir Xan re, behsa vê kêmaniyê dike. Loma jî law û keçên Mîr Bedir Xan, hema çi bigire her roj, derin nik cîra-

nê xwe R. Xendamian û kêmaniya ku li pey bavê wan maye, bi sûretên xwe dadigirin. Li pey bavê wan tu sûret û wêne neman, lê qet nebe, bila ew bê sûret û wêne nerin...

Fotografa diwemîn a romana Bîra Qederê yek ji wan fotografan e ku hingê, li ba R. Xendamian tê kişandin. Li ser fotografê du kes, jinek û mêrek, hene; Emîn Alî Bedir-Xan û jina wî Samîha Xanim. Yanê bav û diya Celadet. Di wê kurte-dema ku ev fotograf tê kişandin de, gelo Emîn Beg û Samîha Xanim çi difikirin, çi dijin, çi hîs dikin, çi dibêjin? Bêguman e ku tu gotin, bi çi awayî dibe bila bibe, nikare wê kurte-demê ji nû ve vejîne. Rû û sûret, bi alîkariya kamera fotografê, ji nû ve, eynî mîna eslê xwe, tê vejandin. Lê ne hîs û jiyana ku mîna lehiyekê diherike... Digel vê hindê, fotografên bêzar û bêziman dikarin alîkarî li taswîr û salixadana hîs û jiyane jî bikin. Di fotografa Emîn Beg û Samîha Xanimê de tiştê ku berî her tiştî bala merivan dikişîne, çavên wan in; du cot çavên reş, mezin, germ ku dikenin. Meriv li ser rûyê wan ken nabîne, rû bi qasî xwe ciddî ne. Lê çavên germ dikenin. Keneke kîbar, ne boq, lê bi pîvan. Meriv dikare ji vê kenê derxe ku hem Emîn Beg hem ji jina wî ziravbihîstiyar û diltenik in. Ew bi xwe bawer û têgihîstû ne. Ew ji jiyane hez dikin, lê bîr bi zehmetiyên wê jî dibin.

Di wênê de tiştê diwemîn ku hema bala merivan dikişîne, destên wan in. Herduyan jî destên xwe, bi awayekî serbest, danîne ser çogên xwe. Ew li ser du kursiyên rûniştine. Piştî wan rast, sîng û rûyê wan li pêş

e. Emîn Beg serê xwe jî hinekî hildaye. Di destê rastê yê Emîn Beg de tomareke kaxiz heye. Wî herdu destên xwe jî kirine mîna gurmist û ew anîne ser herdu çogên xwe. Samîha Xanimê jî kêr, zêde, bi vî awayî, destên xwe danîne ser çogên we. Di destên Samîha Xanimê de cotek lepikên reş hene û di destê wê yê çepê de jî detmaleke spî heye. Meriv dikare bibeje ku tiştê spî yê hemû fotografê, ev destmal e. Ji awayê rûniştin û danîna destan, meriv têdigihê ku Emîn Beg û jina wî hînî fotografkêşanê nebûne. Bi gotina R. Xendamian, ew hê baş nebûne fotojenîk. Lê belê, ev awayê rûniştinê, di eynî wextê de nîşan dide ku hurmet û giramî, rêz û rêzdarî, ji bo wan, qayîdên esasî yên jiyane ne. Li Stembolê, di nav Osmanî û girgirên wan de adet e, gava meriv bixwaze bi hurmet û rêzdarî rûne û vê yekê nîşan bide, hingê meriv destên xwe, bi ûsil, datîne ser çogên xwe û rûdine. Ji wênê jî baş dixuye, Emîn Begê ku bi terbiya rêz û rêzdarî, qedr û qîmet rabûye, bi hurmet jî dijî.

Cil û bergên herduyan jî reş in. Li ser Emîn Beg taximeke kincên reş hene. Qumçikên çakête wî heta berstû girtî ne. Li berstû qirawatek dixuye. Kincên ku Emîn Beg li xwe kirine, ne ew kinc in ku herkes dikare li xwe bike. Ew buha ne û bi tenê kesên ku hal û wextên wan di cîh de ne û pêwendiya wan û saraya Osmanî heye dikarin li xwe bikin. Çaxa R. Xendamian, fotografkêşê bîrbir, dibêje, "ji kincan meriv dikare derxe ka ew kes ji kîjan aliyê civata rengîn a osmanî ye", ew ne neheq e. Kinc, nîşana çîn, kom û gelên civata Osmanî ne.



Li ser serê Emîn Beg jî kumekî sor ku Osmanî jê re dibêjin fes heye. Ev fes jî baş li kincan hatiye û hîn xweştir nîşan dide ka Emîn Beg kî ye.

Cil û bergên Samîha Xanimê jî, ji serî heta lingan, reş in. Fistanekî dirêj û reş ku heta lingan tê, lê ye. Jorê fistan bi sermaleke dirêj ê reş ve hatiye pêçandin. Sermal ji serî heta ber çogan tê û hemû stû, mil û pî vedigire. Di binê sermalê de jî, dîsan reş, dolbendek heye ku ser û porê Samîha Xanimê baş radipêçe. Lepikên reş, reşahiya wênê temam dike. Meriv ji reşahî û pêçandinê fahm dike ku Samîha Xanim dilpak, hezkira mala xwe, sade û dîndar e. Di nav sermal û dolbendê re, tayeke porê wê yan jî ya cênîkê wê naxuyê. Bi tenê rûyê wê ye gulover, mîna heyveronê, dibiriq. Çavên wê yên reş, di bin bijangan re, li hember dinihêrî û bi germahiyeke xweş dikenin. Gumên wê mezin û gulover in. Pozê wê, li gora pozê Bedirxaniyan, pahntir e. Devê wê fireh, lê lêv girtî ne. Lêv, ne lêvên kesê ku pir dipeyive, ne. Samîha Xanim li kêleka mêrê xwe, bi giramî, bêdeng, çavbiken, porgirtî, rûvekirî, rûniştîye. Samîha Xanim, alîgir û piştigira Emîn Beg, dilsoza mala Bedirxaniyan, bi aramî û bawerî, li kamerayê dinihêre.

Herçî Emîn Beg e, ew jî, bi bawerî û çavkenî, li kamerayê dinihêre. Lê di nêrîna wî de tiştêkî zêde heye; maxrûrî û asalet. Wî serê xwe hinekî ber bi jor kiriye û li makîna fotografê dinihêre. Ew ji jor ve li hember xwe dinihêre. Wî di wê kurte-dema kişandina fotografê de jî ji bîr nekiriye ku ew, lawê Mîr Bedir Xan e, lawê serokê mîrekiya

Cizîra Botan û rêberê welatê Kurdistanê ye. Ji nêrîna wî dixuye ku ew xwediye berpirsiyariyên mezin û zehmet e. Nêrîna wî, nêrîna serok û rêberan e. Kaxizên di destan de jî nîşan dide ku ew merivê heyama xwe ye, ne paştamayî, lê pêşketî ye. Ew bîr bi guherînên mezin ên civakî yên cîhanê dibe û bala wî li ser şoreşên teknîkî ye. Heye ku loma ew di vê fotografa duwemîn a romana Bîra Qederê de dibe pardarê şoreşa ku R. Xendamian di qertên xwe de behs dike. Di welatê Osmaniyan de zû bi zû meriv rastî kesan nayê ku di destê wan de kaxiz hene. Bi tenê komeke biçûk a civata Osmanî bi karên kaxiz, xwendin û nivîsînê rabûne. Ronakbîrî, lebatên çandî, edebî, hunerî û felsefî, bi tenê karê komekê ye. Komek ku di bin tesîra pêşketinên Awrûpayê de maye û bi Awrûpê re di nav pêwendiyêke xurt de ye. Kaxizên ku di destê Emîn Begê de ne, nîşan didin ku Emîn Beg jî mensûbê koma bijarte ye.

Rûyê Emîn Beg, li gora rûyê Samîha Xanimê, dirêjtir e. Poz, pozê Mîr Bedir Xan e; pozê beranan. Riya wî ku êdî spî dike, xweşiyêke taybetî dide rûyê wî. Rî hem asaleta nêrînê temam dike hem jî germahiya çavan dineqîşîne. Lê belê, di fotografê de cîhê hema bala merivan dikişîne, çav in. Meriv pêşî li çavan dinihêre, paşê çavên xwe li ser rû, beden, û kincan digerin û bi dû re dîsan li çavan vedigere. Çav, navenda fotografê ne. Çav mezin û vekirî ne; ew mîna du libên stûr ên tiriya reş dibiriqin. Li ser çavan ken û germahiyeke însanî dixuye. Lê ne bi tenê evçend, tevî ken û germahiyê, êş û nermahiyeke şexsî jî dixuye.

Çav dipeyivîn û saloxdana hîs û jiyana Emîn Beg dikin. Ew êş û nermahiya şexsî ku li ser çavan dixuyin, du stûnên jiyana Emîn Beg in. Wî çavên xwe bi wan vekirine û bi wan dijî. Wî çavên xwe li welatekî xerîb, li sirgûnê vekirin. Sal, 1851 bû. Sal, xedar û dijwar bû; bi ser têkçûna serîhildana bavê wî Mîr Bedir Xan re, bi tenê pênc sal derbas bûbûn. Bi dû têkçûna serîhildanê re, bavê wî, dê û dêmariyên wî, mam û metên wî, kek û etên wî, hemû kesên malbata Mîr Bedir Xan, zaro û zêç, kal û pîr, ji welatê Cizîra Botanê hatin bidûrxistin. Rûyê wan ber bi welatên nenas û xerîb hate zivirîn. Mîr Bedir Xanê ku ji bo heyîn û hebûna welatê xwe serî hildabû ji welatê xwe bûbû. Ew pêşî li Stembolê hatin bicîhkirin, paşê jî Mîr Bedir Xan sirgûnî girava Girîtê bû, dan û standina wî bi hemû dinê re hate birîn û vegera wî ya welêt hate qedexekirin. Emîn Beg, lawê Mîrê kurdan, çavên xwe, rojek ji rojên zivistana Zerya Spî ya bi ba û baran, ji welatê bav û kalan pir bi dûr, li girava tenê û bêkes, li dinyayê vekir. Xerîbiya welatên nenas û hesreta welatê bav û kalan ji roja bûyînê ve mora xwe li jiyana wî xist. Jiyana wî bi xerîbî û hesretê hate rapêçandin. Ew êş û nermahiya ku li ser çavan in, meriv dikare bibêje, xerîbî û hesret e.

## 2

- Cecoyê min, kurê min, ew êş û nermahiya ku ji çavên bavê te dixuye, meriv dikare bibêje, xerîbî û hesret e. Tu hê pê nizanî, derdên xerîbî û hesretê dijwar in.

Samîha Xanim lawên xwe Celadet û Ka-

muran li kêleka xwe dane rûniştin, li pêlên Zerya Marmarayê dinihêre û ji zarokan re behsa bav û kalikê wan dike. Ji salan 1898 e. Celadet ketiye sala pêncan, birayê wî yê biçûk ku du sal bi dû wî re hatiye dinê, nû ketiye sala sisiyan. Birayekî wan ê din jî nû hatiye dinê; Hîkmet.

Dinya havîn e, esman çik sayî ye. Li dûr ewrine spî û tiral dixuyin. Hawirdor di nav hêşnahiyeke gelek xweş de ye. Zerya Marmarayê, hêdîka, xwe dilivîne û pêlên xwe yên spî û qels, bi zehmetî, radigihîne qiraxa avê. Li ser ava ku mîna cawekî hewreşimî dixuye, keştî, bot û qayik giran giran digerin. Ji dûr ve keştiyeke dükeltî yê mezin dûtî yê xwe berdide û avê diqelişîne, dere. Samîha Xanim, tevî lawên xwe û du cêriyan, li Büyükkada, girava havîngeha malbata Bedirxaniyan e.

Li Büyükkadayê, li milê bakur, li ber quntara girê İsa ku tirk jê re dibêjin İsa Tepesi, du xaniyên havîngeh ên malbata Bedirxaniyan hene. Herdu xanî jî mîna hev, lê ji hevûdu hinekî dûr in. Ew bi du qatan, ji ber û keviran lêbûne û bi siwaxeke spî hatine siwaxkirin. Xanî fireh in, lê bêguman ew têtî malbata mezin a Bedirxaniyan nakin. Loma jî endamên malbatê bi dorê tên Büyükkadayê. Büyükkada, xweştirin havîngeha Stembolê, lûlûya Marmarayê, warê diwemîn ê Bedirxaniyan e. Ew bi hêsanî xwe radigihînin Büyükkadayê. Jixwe Kadiköy û Büyükkada ne zêde durtî hev in. Ji lengergeha Kadiköyê, bi keştiyê, di bîskêkê de, meriv xwe digihîne Büyükkadayê. Loma jî endamên malbatê kengê bixwazin, hingê derin Büyükkadayê.

Büyükada û çend giravên din, mîna ya-qûdên zumrudî, gewriya Zerya Marmarayê dineqîşînin. Giravên Kınalı, Burgaz, Kaşık, Heybeli, Büyükada, Pide, Tavşan û Sedefê bûne cihê starê, cihê bîhnvedan û îstirihe-tê. Stembola kevnare, Konstantinopolisa cîhana xiristiyanan, navenda tevgera ronak-bîrî û çandî ya dewleta Osmanî êdî roj bi roj teng dibe. Ji her aliyên tixûbên bêser û bêber ên Osmanî, ji her millet û gelî, bi he-zaran kes tên li Stembolê bi cih dibin. Stembol, payitextê dewleta Osmanî êdî ji kargerîndeyên dewletê re biçûk tê. Ew xwe davêjin cihê havingeh û seyrangehan. Girav, bi av, plaj, çem, rûbar, ger, hêşinahî, daristan, bax, baxçe, rez, gelî û girên xwe, bûne koşeyekî bihuştê. Bi taybetî jî Büyükada. Büyükada, girava kulîlkan e. Sal donzdeh meh girav bi rengên gul, binevş, şîlan, nûlufêr, sosin, nêrgiz, qerenfîl, berbiro, gulale û beybûnê dixemile. Reng-gek winda dibe, yekî nû tê dewşê. Büyükada, girava rengên dewlemend e. Girav hemû zerya direngîne. Rûniştevanên giravê yên esasî, hema çî bigire hemû, masîvan in. Ew adet û ûsilên hezar salan, ji dem û dew-rên Bîzansê, didomînin. Ew ji zeryayê wer-digirin û dîsan didinê. Büyükada, girava tarîxî, bi qasî ku havingeh e, ew parêzgeh e jî. Ew, di nav zerya de, adet û ûsilên kevnare, li hember wext, dewr û dewranê diparê-ze.

Xaniyê ku Samîha Xanim û lawên wê tê de ne, li kêleka avê, li ser kaşekî, ava bûye. Wî piştî xwe daye girê Îsa. Li dora xênî dar-rên spîndar û bî hene. Şaneşîneke fireh û dirêj a xênî heye. Dora şaneşîne bi caxên

textîn rapêçaye û ji şaneşîne hemû Marmara bi rengê xwe yê yaqûdî li ber lingan e. Li herdu koşeyên şaneşîne du mêwên stûr ên tîrî hene. Qurnên mêwan fireh in û ta û çî-qilên wan, mîna banekê, hemû jorê şaneşî-nê dagirtiye. Mêw mîna holikekê, bi dû-zan, taldeyekê dide şaneşîne. Çaxa dinya germ û xweş e, şênîyên xênî li wir rûdinin. Samîha Xanim û lawên wê Celadet û Kamuran li wir, li ser cilên raxistî rûniştine. Dinya çikronî ye, danê sibê hêdî hêdî di-qulipe ser danê êvarê. Celadet ku pir zû mezin dibe, niha ketiye heyama xwe ya pîr-siyaran. Ew her tiştî merak dike, her tiştî dipirse, dixwaze her tiştî bizanibe.

- Yadê, ka kekê min Sureya li ku ye? Yadê, em çima narin Cizîra Bota? Yadê, em çima li malê bi tirkî napeyivin? Yadê, çima çavên bavê min carina kelgîrî dibin? Yadê, ez dikarim hilkişim ser vê darê û xwe jê bavêjim? Yadê, leglega ku bebîş Hîkmet anî, çû ku? Yadê, çima mam û metên min evç-end pir in?..

Samîha Xanim jî hêdî hêdî bersîva wî di-de. Ne bi tenê Samîha Xanim, lê Emîn Beg, cariyên malê, ap û met jî bersîva pîr-sên Celadet didin. Pîrs pir in, têra hemû-yan dikin.

*Bêguman pîrsên min nayên bîra min. Piştî demek pîr dirêj, bi alîkariya feylesofên almanî, ez hîn bûm ku pîrs û pîrsiyar lehiya ava zelal e. Lehî hertim, pihêt, diherike. Ava zelal û paqij dibiriqe. Lê gava lehî bi kar were, ew hêja ye. Gava meriv bikaribe ji quwet, zelalî û paqijîya wê destketî bibe, ew giranbî-ha ye. Pîrs jî, gava bersîv hebin, hêja ne. Gava bersîv hebe, pîrs dibin lehiya ava zelal û*

*diherike. Ez bawer im ku Yadê bîr bi vê yekê dibir. Me jê çi jî bipirsiya, wê bi aramî û pir sakîn bersîva me dida. Wê dixwest pirsên me biqulîbîne ser lehiya ava zelal.*

*Ew havîna ku tu niha behs dikî, mîna xewnekê tê bîra min. Sûretên wê havînê li pey mij û dûmana umrekî dirêj û westiyayî ne. Lê paşê Yadê ji min re, bi kitekit, gotibû; wê havînê ez derketibûm ser wê çardaxa ku tu behs dikî. Min bi gotina xwe kiribû, ji ser çardaxê re jî min li Marmarayê nihêribû. Ez çiqas li wir mabûm, min li wir çi kiribû? Kes bi vê yekê nizane. Lê çaxa ez daketime jêr, ew bûyera ku hemû malê her qal dikir, diqewime; ez ji jêr heta jor diqelişim. Belê, te çewt nebihîst, ez diqelişim. Gava ez xwe bera jêr didim, ez rastî koşeyekî tûj ê stûna hesinî yê ku qurnê mêwê pê hatiye girêdan, tîm û ji nav şeqan heta ber sîngê diqelişim. Çîroka vê bûyerê ku şopên wê her û her li ser bedena min diyar bûn, dirêj e. Ez serê te neêşnim, lê, li gora gotina Yadê, ez ji mirinê xelas dibim, çend car, çend gavan ber bi aliyê mirinê jî davêjim, lê bi dû re jê vedigerim. Vegera min kêfa bav û diya min û hemû malbatê tîne. Lê bîrînên min jî zêde dibin; li bîrînên serê min ku ji roja hatina dinê yadigarî min bûne, bîrînên berzik, zik û bersîngê jî zêde dibin. Wê havînê, li Büyükkadayê, ez ji bêgavîyê dibim hevalê cîh û nivînan. Pirsiyarên min jî hingê hin pirtir dibin. Pirs li ser pirs, gotin li ser gotin... Yadêya reben... kê dizane wê ji ber pirsên min ên hîç û pûç çi kişandiye û çiqas hewl daye ku wan biqulîbîne ser lehiyeke xurt, zelal û delal...*

Celadet û Kamuran li herdu aliyên Samîha Xanimê rûniştine. Kamuran li ber

çogê wê ye. Siniyeke fireh a zebeşekî sor ê hûrkirî li ber wan e. Samîha Xanim perçeyekî biçûk dide Kamuran, destê xwe yê din di ser porê wî re dibe û gotina xwe didomîne,

- Cecoyê min, çavreşê min, ez li ber destê dapîra te û li mala Bedirxanpaşazadeyan mezin bûm. Ez wan baş nas dikim. Evîn û hesreta welatê Kurdistanê bûye kozeke agir û ketiye dilê wan. Nemaze evîn û hesreta bavê we... Ew lawê Mîrê mezin Bedir Xan Beg e û îro jî mezinê malbata mezin a Bedir Xan Beg e. Jê gelek tişt tînin xwestin.

Celadet li diya xwe guhdarî dika û zebeşê ber xwe dixwe. Ew perçeyekî biçûk dixwe devê xwe û perçeyekî biçûk jî, piştî ku dengdîkên wî jê derdixe, dide destê Kamuran. Kamuran perçe dixwe nav lepê xwe û ew jî wî dide diya xwe. Samîha Xanim û Celadet dikenin. Samîha Xanim serê Kamuran maç dika û jê re dibêje,

- Eferim kurê min, ji niha ve tu nîşan didî ku tu neviyê Mîr Bedir Xan î. Comerdîya wî bi te re heye. Eferim, Kamoyê min, eferim.

Celadet hinekî din nezîkî diya xwe dibe û dîsan jê dipirse,

- Yadê, çavên min jî, mîna yên Bavo, reş in? Çima rîha wî heye û rîha min tune? Yadê, tu dê ji min re ji kincên bavo bidî dirûn? Kincên Bavo pir spehî ne...

3

- Bavo, kincên te pir spehî ne, gava ez mezin bim, ez ê ji kincên te li xwe bikim.

Emîn Beg bi gotina lawê xwe Celadet di-

kene. Wî herçar lawên xwe, Sureya, Celadet, Kamuran û Hikmet dane dora xwe û bi hev re li çayxana seyrangeha Modayê rûniştine. Emîn Beg û lawên wî Sureya û Celadet çay, Kamuran û Hikmet jî leymonata vedixwin. Murebiya zarokan Madam Stella jî bi wan re ye. Sal ber bi 1900-an dere. Ji 1900'î re hê şeş meh hene. Wext mîna avê diherike. Celadet hinekî din mezin bûye. Kamuran bi tirkîyeke wisan xweş dipeyve ku mezin diheyirin. Hikmet, bi lez û bez, li dora xwe çerx dibe. Herçî Sureya ye, simbelên wî êdî reş dikin.

Seyrangeha Modayê ku Osmanî jê re dibêjin Moda Çayırî, cîhekî ji cîhên herî xweş ên Stembolê ye. Moda Çayırî ji qonaxa Bedrî Paşa hinekî bi dûr, li ser çend giran, bi dar û ber tijî, li peravên Marmarayê, bihuşteke bira ye. Ew di navbera Moda Biçûk û Moda Mezin de, lê bêtir nêzikî Moda Mezin e. Moda Çayırî, nemaza bihar û havînan, dibe seyrangeheke yekta. Hingê her der di nav hêşînahîyeke bêpayan de ye. Gul û kulîlk bi rengên xwe yên cuda hemû hawirdor dixemilînin. Ji ser daran dengê bilbil û şalûran tê. Dengê ava coyên biçûk li dengên çûk û teyran zêde dibe. Li seyrangê çend çayxanên havînê hene ku hertim tijî ne. Ji çayxanan, Marmara mîna xweştirin bergeha cîhanê dixuye. Rojên îniyan, çaxa ku xelk ji kar û şixulên xwe vala ne, ew pêl bi pêl tîna seyrangê. Hingê, rojên îniyan, ne îşê aqil e ku meriv were seyrangê. Lê niha, di vê roja şêşemiyê de, seyrangê û çayxane hinekî sakîntir e. Emîn Beg merivekî bi qayide ye. Wî gelek tişt ji xwe re kirine adet. Ew divê her roj îş-

ligekî paqij li xwe ke, her roj serê sibê bi meqes û mûçikê simbêl û riya xwe çêke, bi xwarina firavînê re li rojnama Icmal-î Ahval binihêre, ken û henekên ku dibîse yan jî tîna bîrê di defterekê de binivîse, heftê carekê hin bira û xwişkên xwe yên ku li Stembolê dijîn ziyaret bike, heftê carekê êvarekê yan jî danekî lawên xwe li dora xwe bicivîne û bi wan re bipeyve, ders û şîretan bide wan û bi wan re bi kurdî bipeyve...

Hatina seyrangeha Modayê jî yek ji adetan e. Gava dinya bihar yan jî havîn be, her çaxa ku ew tê serîdana birayê xwe Bedrî Paşa, ew tê seyrangê jî û du qedeh çay vedixwe. Îcar wî zarok û murebiya wan Madam Stella jî bi xwe re birin mala Bedrî Paşa, cîhê ku Celadet lê hate dinê. Sebebê çûyîna jî tiştêkî pir pîroz bû; birayê wan Mîthed, li Misirê, rojnama kurdan a yekemîn Kurdistan derxistibû. Gerçî wan bihîstibûn ku rojnamê dest bi weşanê kiribû, lê wan rojname bi xwe nedîtibû. Rojeke berê, serê sibê, dostekî wan ê malbatê ku bi keştiyê ji Kahîrê, Misirê hatibû, du nusxeyên rojnamê bi xwe re anîbûn û ew dabûn Emîn Begê. Dostê Emîn Beg hatibû Kiziltoprakê, mala wan. Gava Emîn Beg rojname dîtibû, ji kêfan, hêstir ketibûn çavên wî. Mîna ku ji wan re zarokêkî nû çêbe, eynî welê, Emîn Beg, bêpayan, kêf kiribû. Wî dostê xwe, ji kêfan, hembêz kiribû, ew dabû rûniştin û di bîskêkê de hemû rojname xwendibû. Ne bi tenê carek jî, du caran. Ew bûbûn xwediyê rojnameyekê. Kurd êdî ketibûn defteran. Navê Kurdistanê bûbû navê rojnama birayê wî. Navê we-

latê kurdan ê êdî li ser lêvan bûya. Xewn û xwestekên wan êdî bi cîh dihatin... Wî ji dostê xwe hal û hewalê birayê xwe yê biçûk Mîthed pirsîbû, li ser rewşa rojnamê jê agahî wergirtibû. Wan bi hev re firavîn jî xwaribûn û piştî firavînê wî bang zarokên xwe kiribûn û ew bi hev re, bi faytonekê, ber bi qonaxa Bedrî Paşa, ketibûn rê.

Wê şevê ew li qonaxê mabûn. Birayên Emîn Beg ên din Alî şamil Paşa, Evdirrehman, Zubeyir, Husên, Mistefa, Kamil, Mirat û birarziyê wan, lawê Necîb Paşa Avdurrezak jî hatibûn qonaxê. Ew bi birayê xwe Mîthed serbilind bûn. Belê, Mîthed li ser şopa bavê wan Mîr Bedir Xan bû. Wî kurd kiribûn xwediyê rojnameyeke kurdî û millî. Li ser rûpela yekemîn a rojnamê bi tîpên reş û mezin Kurdistan hatibû nivîsîn. Di binî de jî bi tarîxa Hicrî1315 hatibû nivîsîn. Li kêlekê jî weha hatibû nivîsîn; "Heçî kaxizek vê rêke, divê rêket Misirê ser navê xweyîyê vê cerîdeyê lawê Bedir Xan Paşa Mîqdad Mîthed Begê... Her car du hezar cerîdeya bêpere ez ê rêkim Kurdistanê, de bidin xelkê... pazde roja carekê têt nivîsandin." Rojnameyê bi "Bîsmîllahîrrehmanîrrehîm" dest bi nivîsê dikir. Di rûpela dawîn de jî, "Li Misrê Metbeet El-Hîlal de tebî' bîye" hatibû nivîsîn. Wan wê şevê heta destê sibê rojnama xwe û serfiraziya birayê xwe Mîthed pîroz kiribûn û li ser halê malbatê û kurdan peyivîbûn. Dotira rojê, piştî nîvrojê jî, Emîn Beg zarok wergirtibûn û hatibû seyrangeha Modayê.

Bask tune bûn ku Emîn Beg bi wan bifire. Li hemû dinê, merivê herfî mesûd û bextiyar niha ew e. Ew seriyekî şekir dixwe

nav qedeha çayê, bi kefçî çayê tev dide, jê qultekê vedixwe û li zarokên xwe dinihêre. Ev çaya diduyan e ku ew vedixwe. Madam Stella alîkarî li Hîkmet dike da ku ew lîmonata xwe vexwe. Rojnama Kurdistan'ê, vekirî, li kêleka qedeha Emîn Begê, li ser masê ye. Danê êvara Modayê bi aramî dadikeve. Aso bi sorahiyeke vekirî hatiye neqîşandin. Tîrêjên jar ên tavê li ser ava paqij a Marmarayê dikenin. Ji doraliyên coyên avê, niha, dengê beqan jî tê. Sureya ku bi qelafetê xwe êdî ne kêmtî bavê xwe ye, li kêleka bavê xwe rûniştî, li dara mezin û qehîm a çinarê ku ew li binî rûniştine, dinihêre. Dara bedew hêlîna çivîkan e, jê dengên ewçend xweş tên ku meriv pê mest dibê. Celadet, bi heyranî, li çavên bavê xwe dinihêre. Kamuran, pantolên kin li lingan, li ser kursiyê rûniştî, lingên xwe ba dide û lîmonata xwe vedixwe. Emîn Beg çend qultên din jî çaya xwe vedixwe û rojnama li ber xwe dixwe destê xwe. Ew carek li rojnamê, carek jî li Celadet û Sureya dinihêre û bi ken dibêje;

- Sureya û Celadetê min, lê guhdarî bikin, binihêrin ka mamê we yê zîrek, bi zîmanê xwe yê spehî, çi dinivîse.

Bi gotina xwe jî, ew rûpela diwemîn vedike û bi dengê xwe yê gur dest bi xwendinê dike; "Gelî mîr û axano! Gunehê zarûyên we wê stûyê we be. Ûn jî zarûyên xwe rêkin bidin xwendin. Dewlemendên we bila gunda de mekteba çêkin, riya Xwedê de xêra bikin... Gelî mîr û axa û Kurmanco! Dinya zane kurd camêr in. Lê vê zemanê ha de şer bi camêrî tenê nabitin... Hekî we guh neda van nesîhetên min, hekî dîsa hûn

şivanî û rênçberiyê tenê bikin, zemanek hindik de Kurdistan wê yekcar xira be..."

Xwendin bi vî terhî demekê dewam dike. Ji xwendin û dengê Emîn Begê fahm dibe ku ew kêfxweş e. Serê Sureya ber bi jor, ber bi dara çinarê ye. Celadet, bi dîqet li bavê xwe û xwendina wî dinihêre. Piştî ku Emîn Beg xwendina xwe diqedîne, ew bi ken, yek bi yek, li zarokên xwe dinihêre. Ev zarok heyîna wî, rûmet û pêşeroja wî ne. Ev ê bidin ser şopa bav û kalan û mirazên bav û kalan bi cîh binin. Loma jî ew divê bixwînin, perwerde bibin, têbigihên, jîr û zana bin, desthilat û bîrbir bin, wela-tevîndar û bîrewer bin. Ew çaya li ber xwe vedixwe û wê diqedîne û paşê jî li Celadet vedigere û dibêje,

- Ceco, kurê min, li min guhdarî bike, ez, bi qewlê mêrê qenc, soz didim te. Eger tu jî mîna mamê xwe Mîthed jîr bî û di rojên bê de mîna mamê xwe rojnameyêke weha bijarte derxîni û serê me pê bilind bikî, ez ê ji te re ne taximek, lê çend taxim kincên ji yê min jî xweşikîr bikirim.

- Bavo, ez ê derxim, tu dê bibîni, ez ê cerîdeyêke pir spehî derxim.

*Belê, rast e, min hingê weha got... Qewl û soz mîna tovan in. Meriv wan di zikê dewr û dewranê de diçîne da ku ew di pêşerojê de hêşîn werin. Lê herwekî ku ji tov re ax, av, tav, germahî û hewa divê, ji qewl û sozan re jî rûmet, xebat, sebat, lêgerîn, xîret û evîn divê. Di ser her tiştî re jî evîn. Evîn reh e. Evîn ruh e. Tov li ser rehan hêşîn tê. Ma heta tov xwe bi rehan bernede nav kûrahîyên axê, ew dikare bibişkove, zîl bide û bejn bavêje?.. Min jî, bi evîna ku ez ji mala xwe, bav û di-*

*ya xwe hîn bûbûm, soz da bavê xwe ku ez rojnameyêke spehî, mîna rojnama mamê xwe, biweşînim. Ez bûm rojnamevan. Min rojnâme jî derxist û ne bi tenê yek, dudo. Ez nizamim ka ew di hêjahiya rojnâme mamê min de ne, lê min bi aşq û evîn ew derxistin û yadîgarî miletê xwe kirin. Gava umrê min hinekî mezin bû û min êdî bîr bi çerxa gerdûnê û qesta felekê bir, bavê min ji min re çend taxim kinc dan dirûn. Lê bêtî ku ew rojnamên min bibîne... Belê, wî rojnamên min nedîtîn. Gava her hejmareke rojnamên min derdiketin, min jî mîna bavê xwe li hejmarê nû fedikir, rûpel bi hêdika diqulîpan-din û ez, bi dengêkî berz, difikirîm û min digot, "xwezî niha bavo vê hejmarê bidîta." Mixabin, wî ew nedîtîn.*

#### 4

- Mixabin ku wî ew nedîtîn, lawên Mîrê me yê gorbehîşt niha bûne paşa, wezîr, aqilmend, zabit, muteserif û ew karê dewletê digerrînin. Ew li ser lêvan in, herkes qala wan dike, bi hezaran, sed hezaran kes bi navê wan sond dixwe. Lê gelek heyf ku Mîr Bedir Xan ew nedîtîn... Ma ez çî bibêjim, xwezî we kalikê xwe bidîta!

Amojna Sitî, bi axîn bîhna xwe berdide û weha dipeyive. Pêwendiya Amojna Sitî û romana Bîra Qederê li ser zimanê romanê ye. Celadet Beg dixwest romana xwe bi kurdî binivîsiya. Romana Bîra Qederê bi kurdî tê nivîsîn. Eger meriv li reh û sebebên vê yekê bigere, meriv divê xwe bi Amojna Sitî bigihîne. Amojna Sitî, dilgira malbata Bedirxaniyan, zarşêrîna zarokan û

çîrokbêja meclîsan e. Ew ji dem û dewra Mîr Bedir Xan maye. Bav û diya wê li qesra Mîr Bedir Xan, mîna seyis û berdestên Mîr jiyane. Ew botî û kurdên êzîdî bûne. Bavê Amojna Sitû di serhildana Mîr de jî hertim li ba Mîr bûye. Gava serhildanê jî aliyê Osmaniyan şikest xwariye û Mîr mecbûr bûye ku xwe vekişîne keleha Erûhê, bav, dê û Amojna Sitû jî pê re bûne. Umrê Amojna Sitû hingê 7-8 sal bûye. Bi dû serhildanê re jî sirgûn û koç hatiye. Hemû malbat, tevî herkesî, jî Cizîra Botan hatiye bi dûr xistin. Hingê ew jî, bavê Amojna Sitû Apê Xelef, diya wê Gulîzer û ew bi xwe, ketine ser rîya welatê xerîbîyê. Sala 1846-an, bi hespan û di bin çavdêriya ordiya Osmaniyan de, piştî rêwîtiyeke çend mehan, ew gihîştine bajarê Zerya Reş, Samsûnê. Ji wir jî, ew bi keştiyeke mezin, jî zeryayê, çûne Stembolê, payitextê dewleta Osmanî. Roj û mehên wan ên Stembolê pir dijwar bûne; Mîr Bedir Xan, çar jinên wî û sê zarokên wî jî wan tîr veqetandin û ew li koşkeke biçûk tîr bicîhkirin, lê yê mayî hemû qor bi qor di nezareta Zaptiyê de hepis dibin. Ro û tav li wan dibe heram, nan û ava wan tê birîn, dinya li wan dibe zîndan. Bi dû zîndana Zaptiyê re, ew dîsan, bi keştiyeke mezin ber bi girava yewnanî Girîtê tîr şandin. Mîr Bedir Xan, çar jin û sê zarokên wî û malbatê, tevî Apê Xelef û mala wî, li bajarê Xaniyayê tîr bicîhkirin. Lê belê Osmanî malbat perçe dikin û gelek endamên malbatê jî li Stembolê, li aliyê Anatoliyê, Kadiköyê tîr bicîhkirin.

Amojna Sitû heta sala 1862-an jî li Girîtê dijî. Piştî ku bavê wê wefat dîke û diya wê

jî tevî Mîr Bedir Xan dere şamê, ew jî tevî hin endamên malbata Bedirxaniyan, tîr Stembolê û li ba Bedirxaniyan bi cîh dibe. Rojekê li vê malê, rojekê li wê malê, di navbera malên Bedirxanan de, ew porê xwe spî dîke. Hemû zarokên malbatê ku li Stembolê tîr dinê, jî ber destê Amojna Sitû derbas dibin. Amojna Sitû kûpa gotinên kurdî ye, gencîneya stran, dîlan, çîrok, çîrçîrok, methelok û mamikên kurdan e. Ew şahîda tarîxa malbatê û serpêhatiya Mîr Bedir Xan e. Ew rû û zimanê adet û ûsilên kurdî ye. Ew dengbêj û çîrokbêj e. Serpêhatiya Mîr Bedir Xan, sirgûna wan, salên Xaniyayê, deşt û zozanên welatê kurdan, çemên Dijle û Firatê, çiyayên Cûdî û Herkolê, şikeftên spehî û xweşbergeh, jiyana eşîrî û koçerî ya welêt... ev hemû bi zimanê Amojna Sitû dibin lehîyeke zelal û diherikin, dibin berfendeyêke spî û hawirdor vedigirin, dibin destaneke bêdawîn û mêjiyê guhdaran dîneqîşîn. Ma meriv li welatê xerîbîyê, li Stembolê dikare jî Amojna Sitû çêtir mamostayêke hêja bibîne? Ma kî dikare jî wê çêtir zimanê bav û kalan, kurdiya welêt hînî zarokan bike?

Digel ku Amojna Sitû nêzîkî çil salan li Stembolê, di nav navenda zimanê Osmanî de jiyaye, ew hê jî bi gotineke tirkî nizane. Mîna ku ew ne li dinya îro, lê ya do dijî. Bedena wê li Stembolê, lê bîr û heşê wê li welatê zarokiya wê ye; welatê salên zarokiyê bihuşteke rastîn û nemir e. Ew gorîcana Malbata Bedirxaniyan, pîrika zarokên wan e. Zarokên Bedirxanî, jî kijan bav û diyê dibin bila bibin, ew hemû nevî û torinên wê ne. Niha jî, di vê roja xweş a payiza



1902-an de, ew li Kiziltoprakê, li mala Emîn Begê, li nik torinên xwe Celadet, Kamuran, Hikmet, Tewfik û Safter e. Belê, niha Tewfik û Safter jî hene. Hejmara lawên Emîn Alî Bedir-Xan gihîştîye şêşan. Lawê herî biçûk Safter, bi gotina Amojna Sitî, çilkeke zêr e, melayikekî bêbask e, ronahî û çira mala Emîn Beg e.

*Tu dizanî, her mirov cîhaneke xweser e. Her mirov, tevî jîn, serpêhatî, tecrube, hîs û pejnên xwe, hêjayî cîhaneke ye. Nasîna mirovekî, keşfkirina cîhaneke nû ye. Lê nasîna Amojna Sitî, keşfkirina sed cîhanan bû. Di umrê wê yê keserkûr de sed cîhan gîhabûn hev; cîhana bedew a zimanê kurdî, cîhana spehî ya mîrekiya bapîrê min Mîr Bedir Xan, cîhana kambax a xerîbiyê... cîhan dikarin weha heta û heta dirêj bin. Min tahma zimanê kurdî ji gotinên wê wergirt, hest û heyecana stran û çîrokan, hez û evîna welatê Cizîra Botan ji çîrokên wê yên ku şevên dirêj ên zivistanan têrî nedikirin, wergirt. Amojna Sitî meşaleyek bû ku li mala me û li malên mam û metên min ronahî direşand. Di wan rojan de ku tu niha qal dikî, min û birayê xwe Kamuran li dibistana taybetî Halîle-i Mahmudiye ku ji mala me hinekî bi dûr li Fenerbahçe bû, dixwend. Dibistan, ya herî baş a hemû Kadiköyê bû. Xaniyê wê nexweş bû, xaniyekî textîn ê sêqat Lê ders baş bûn û mamostayên wir jî bijarte bûn. Bi taybetî jî dersên fransizî, ziman, tarîx û zanîna welêt ku jê re "Malûmat-i Vataniye" digotin, pir baş bûn. Bavê min perene mezin didan dibistanê da ku em li wir bixwînin. Hefîê du caran jî em diçûn aliyê din ê Stembolê, Beyoglu yê û li wir, nêzikî Cade-i Kebir,*

*me ji Signori Giovanni Parovel dersên musikê digirtin. Signori li dibistana italî Giuseppe Garibaldi mamosta bû, lê dersên taybetî yên musikê jî li mala xwe dida.*

*Em hertim bi xwendinê mijûl bûn. Lê belê, gava ku Amojna Sitî dihate mala me, êdî min xwendin dida aliyekî, min xwe li nexweşiyê datanî û ez li malê dimam. Mala ku bi stran, çîrok, serpêhatî û gotinên Amojna Sitî diqulipî ser qesra Birca Belek a welatê bav û kalên min...*

- Ma ez çi bibêjim, Amojna Sitî çavên xwe li zarokan digerîne û dibêje, xwezî we kalikê xwe nas bikira. Gotin têrî pesindana wî nakin. Ma ez rebena Xwedê çawan wî bidim nasîn?.. Bejna wî dirêj, laşê wî gir bû. Dengê wî gur, gotinên wî xweş bûn. We digot qey, ew şêr û pilingê çiyayên şengalê bû. Çavên wî, mîna çavên teyrê simîr ê çiyayê Sîpanê Xelatê, spehî û dûrbîn bûn. Çaxa wî gava xwe davêt, erd li bin lingên wî dihejiya. Çaxa wî serê xwe ber bi jor dikir û rîha xwe şeh dikir, stûyê wî dibû mîna stûyê hespê Bozê Rewan ê Memê Alan. Hertim kincên spî yên neqîşkirî û hewreşîmî lê bûn. Ew dostê feqîran, dijminê neyaran bû. Ew bi pişta xwe xurt, bi gotina xwe mêr bû. Çar jinên mahrkirî û şanzde jî cêriyên wî hebûn. Ev mam û metên we yên bêhesab hemû ji pişta wî ketine. Wî bi şîrê teyrê baz dest bi xwîrîniya xwe dikir û bi şîrê şêrê dirende paşîva xwe diqedand. Mîna îro tê bîra min, çaxa em ji welêt hatin bi dûrxistin, em bi qasî salekê li ser rîyan man. Hingê li ser wan rîyan, ji Mîrê me re, sê zarok çêbûn, Yezdanê Pak sê zarok danê. Şûrê wî jî, mîna pişta wî, xurt bû. Lê qewlê

wî nerm, wîjdanê wî paqij bû. Lo, zarokno lo, çavreşên mino lo, ma ez çi bibêjim, Mîr Bedir Xan şêrê welatê Kurdistanê bû.

Kamuran ku heta hingê bi dîqet li Amojna Sitî guhdarî dike, xwe ranagire û gotina wê dibire,

- Amojnê, tu dibêji "şêr û piling û teyr". Ma meriv qet dibin şêr û piling û teyr? şêr heywan e, însan, însan e...

Celadet û Amojna Sitî bi gotinên Kamuran pir dikenin. Amojna Sitî û zarok ne li ser kursiyan, lê li erdê li ser xalîca raxistî ya salona malê rûniştine. Safter li ser çoga wê ya çepê rûniştiye, Tewfîk jî li kêleka wê ya rastê. Celadet, Kamuran û Hîkmet jî li hemberê. Amojna Sitî bang Kamuran dike. Kamuran, bi çarpiyan, tê ba Amojna Sitî. Amojna Sitî bi destê xwe yê rastê porê wî mist dide û ji herdu çavên wî radimûse û paşê dibêje,

- Kamoyê min, aqilfahmê min, gotina te ye, lê eger te bapîrê xwe bidîta, te dê hingê şêr nas bikira. Ew rêberê kurdan, şêrê welatê Kurdistanê bû.

## 5

Teyar Begê Ertûşî, tevî Emîn Beg, birayê wî Alî şamil Paşa, xwarziyê wî Evdîrezaq Beg, serokê eşîra Hewêrkiyan Samed Axa û lawên Emîn Beg Sureya û Celadet, ber bi kursiya rûniştinê ya kêleka masa xwarinê dibe û dibêje,

- Mîr Bedir Xan rêberê me hemû kurdan, şêrê welatê Kurdistanê bû. Hûn lawên wî jî rêber û serekên me ne. Bi sedhezaran meriv, bi gotineke Mîr Bedir Xan, dikari-

bûn biçûna mirinê. Li jor gotina Rebbil Alemîn, li jêr jî gotina Mîr Bedir Xan bû.

Mala Emîn Begê dîsan şên e. Axa, beg, şêx û giregîrên welatê Kurdistan hertim tî Stembolê ji bo serîdana bedirxaniyan. Ew, piraniya caran, derin qonaxên fireh ên Bedrî Paşa, Alî şamil Pasa, Osman û Husên Paşa. Lê carina jî, mîna vê êvarê, ew tî mala Emîn Begê. Zarokên Mîr Bedir Xan jî welatê Mîr Bedir Xan hatine veqetandin û vegera wan qedexeyê, lê dewlemend û desthilatên welatê tî Stembolê nik wan. Bûyerên berî 52 salan wan bi hev re girêdide. Tarîxa wan a hevîrtî dibe pira navbera wan û welatê û xelkê kurd. Mîr Bedir Xan jî ji Goristana Kurdî ya Şamê rêberiya wan hemûyan dike.

Eger giregîrên kurdan zêde nayên mala Emîn Begê, ji ber ku mal, li gora malên din, biçûk e. Mal, li Kiziltoprakê, hinekî ji taxê bi dûr e, ew jî bexçeyekî fireh û xaniyekî duqatî tê pê. Her qatek çar ode hene. Odeyên qata jorîn, yê razanê ne; oda Emîn Beg û Samîha Xanimê, oda Sureya, oda Celadet û Kamuran û oda Hîkmet, Tewfîk û Safter. Di qata jêrîn de jî saloneke fireh û dirêj ku ji du milan tî pê, odeyeke fireh a xebatê, odeyeke mêvanan û odeyeke mezin a hizmetkarên malê hene. Oda xebatê, odeyeke fireh e û li bexçê dinihêre. Li aliyê bexçê, li ber pencerê maseyêke dirêj û li koşeya rastê ya masê sandûqêke biçûk heye. Li kêleka sandûqê jî pênsîn û du murekêbdank, bi dûzan, hatine rêzkirin. Li ber sandûqê jî kitêbek, di nav bergêkî çerm de, mîna remzê masa xebatê, hertim bal dikişîne. Kitab, destnivîsa Mem

û Zîn' a şahîrê navdar û milî yê kurdan Ehmedê Xanî ye. Kitab ji kitabxana Mîr Bedir Xan a welêt maye. Bedirxanî wê mîna kitabeke miqedes diparêzin. Zarokên Mîr Bedir Xan bi vê kitabê dest bi dersên xwe yên zimanê kurdî û hesta Kurdistanê kirine. Hecî Qadirê Koyî, şahîrê kurd û perestişkarê Ehmedê Xanî ku li Stembolê, di salên 1860-70-an de, mamostayê Emîn Beg û birayên wî bû, li ser rûpela yekemîn a destnivîsa Mem û Zînê şihîreke dirêj nivisiye. Di şihîrê de ew qala mezinahiya Ehmedê Xanî û esera wî Mem û Zînê dike û dibêje; "Eman qedrê bizane em kitêbe / Le dînya êstekî hemtay nemawe / Le eyamî heyatî şêxî Xanî / Le ser nisxey xet ew nûsirawe..." Ji bilî kitab, pênuş û murekebdankan, li ser masê tu tişt nîn e. Ser masê her gav paqij e. Lê herdu aliyên dîwarên odê heta jor bi kitab, kovar, rojname û kaxizan ve tijî ne. Refên kitêban heta banê ber bi jor bûne. Li aliyê rastê odê, li ber refan nêrdewaneke dirêj heye da ku meriv pê hilkîşe û kitabên ku meriv nikare xwe bigihîniyê, daxê jêr. Ji pencerê aliyê paşê bexçê dixuye. Ev alî tevî dar in, lê di nav daran de, dareke çînarê bi qurnê xwe yê stûr û qehîm hemû dar xistine bin bandûra xwe. Li ser qurnê dara çînarê, hin rêz, bi çaquyan, ji aliyê zarokan, hatine kolandin. Yek ji rêzan, bi tîpên latînî, weha ye; Kurdi... Yek jî, bi tîpên erebî, navê Safter e. Lê tîpa dawîn r nehatiye nivîsîn. Bi tenê Safter hatiye kolandin. Hêlekaneke zarokan jî ji çiqilên darê ber bi jêr dibe.

Mitbaxa mala Emîn Begê jî li qata jêr e, lê ew biçûk e, bi tenê meriv dikare tê de

xwarinê çêbike. Loma jî aliyekî salonê ji bo xwarinê hatiye veqetandin. Di vê êvara zivistanê 1903-an de, malbat û mêvan li wî milê salonê, li ser sifra şîva êvarê rûdinin. Samîha Xanim, Amojna Sitî, Madam Stella û Şehrîban, berdesta Samîha Xanimê, li mitbaxê bi haziriya xwarinê mijûl in. Mêvan ji Cizîra Botan in, bi xwe re bîhn û tahma welêt anîne. Loma jî vê êvarê xwarinên Cizîra Botanê divên. Ji danê sibê ve ye ku Amojna Sitî li mitbaxê rûniştîye û xwarinan hazir dike. Xwarinên vê êvarê, yên wê ne; sê celeb kutilk, kutilkê mêlakê, yê bi dew û yê kulindê zer. Du celeb xwarinên bi goşt; singûsîr, merga mêlakê. Du celeb sawar; sawara tûzikê û ya kerengan. Du celeb jî şîrinahî; birinêşîr û tîllok.

Masa xwarinê gelekî dirêj e. Rûmaseyeke spî û neqîşkirî li ser e. Mazûban û mêvan li herdu aliyên masê rûniştine. Tayar Beg li hember û Samed Axa jî li kêleka Emîn Begê rûniştine. Li kêleka Tayar Begê, Alî Şamîl Paşa û li kêleka wî jî Sureya rûniştîye. Celadet jî li hember birayê xwe ye. Jin li dora masê nîn in. Amojna Sitî, Madam Stella û Şehrîban xwarinan tînin ser sifrê. Li ser sifrê her tişt bi dûzan û di wexta xwe de ye. Li vê malê qayide gelek girîng in.

*Ma te di bexçê mala me de tiştêkî ji bîr nekîr?.. Bîr,.. bîra ku bi qasî çend gavan ji dara qehîm bi dûr bû. Devê birê girtîbû, awa wê miçiqîbû. Ew bîr û doralîyên wê çihê listikên me bû. Em li dora birê, mîna hevya li dora dinê, dizivirîn. Bi taybetî jî ez. Ez her li dora birê dizivirîm û dor dibûm...*

*Herçî qayide, yanê bi gotina fransîzan prensipe in, ew mîna zeviyê ne. Wexteke wan*

*a çandinê û wexteke wan a kemilandinê heye. Ew pêşt tèn çandin, paşê jê, bi wextê, dikemilin. Kê ew çinara bexçê mala me çandibû? Min kir nekir, ez bi vê yekê negihyam. Lê eger kê jî ew çandibe, berê her tiştî ew dara qehîm, toveke biçûk bû. Bi dû re, bi wextê, ew kemilî. Qayide sitûnên mala me bûn. Bav û diya min, Amojna Sîtî, Madam Stella, Şehrîban, ew hemû ji bo çandina qayidan dixebitîn. Em zarok bi roj û şev perwerde dibûn. Amojna Sîtî, bi bejna xwe ya dirêj û zirav, zimanê kurdî bû. Madam Stella ku bi eslê xwe yewmana Stembolê bû, bi bejna xwe ya kin û bedena xwe ya gulover, zimanê yewnanî, fransîzî û hinekî jî îtalî bû. Gava wê her serê sibê digot "kalimera" û dîsan bi yewnanî halê me dipirsî û digot "tikanis", hingê em têdigihîştin ku rojê nû ya perwerdeyîyê dest pê dikir. Şehrîban, Şehrîbana bedew jî zimanê jîn û bedenê bû. Em zimanên cihê, cihêtiya jînê, jîna kurdî, kurdîtiya bîr û hes-tan, bîr û hestên tarîxî û tarîxa xwe ya keser-kûr hîn dibûn... Wext, wexta çandina qayidan bû...*

*Bi qasî çil salan bi dû wan rojan re, birayê min Kamuran di kovara me Hawarê de bi navê "Rabûn û Rûniştin" bendek weşand. Bendê weha dest pê dikir; "Kurd gelek bi edeb û terbiye ne. Rabûn û rûniştina wan, danûstandina wan bi rêz û tertîb e. Kurd nazik, giran û bi edeb in. Xwediyê gotina xwe ne; paşgotiniya xelkê nakin; dostê dostê xwe, dijminê neyarê xwe ne. Pir naxivin, gotina xwe bê sebeb dirêj nakin, gava erê dibêjin, erê ye û gava no dibêjin no ye..." Bend bi vî terhî dirêj dibû. Belê, bend, halê kemilî ye tovên qayidan bû.*

Ji salonê bîhna xwarinên kurdî difûre. Mase bi xwarinên cihê xemiliye. Ji milekî ve xwarin tê xwarin, ji milekî ve jî sohbeta li ser welêt û halê welêt germ dibe. Celadetê ku ji kutlikan pir hez dike, giran giran, bi kêr û çetelê, kutlikên teyfika xwe dike du perçe û hem wan dixwe hem jî guhê xwe dide xebirdanan. Û ew ji bin çavan ve, bi dîqet, li Samed Axayê ku kutlikan bi destan dixwe, dinihêre. Bav û mamê Celadet, ji peyivînê zêdetir, dipirsin û li mêvanan guhdarî dikin. Kurmamê wî û birayê wî Sureya bi germî dipeyivin û doza welatê Kurdistanê dikin. Kurmamê wî Evdirezak ku bi umir ji Celadet pir û pir mezintir e, bîskeke dirêj, li ser pêwîstiya yekitiya eşîrên kurdan û hişyarbûna welatê kurdan dipeyive. Tayar Beg, bi nermî, gotina Evdirezak dibire û berî ku kevçiyê sawarê bibe devê xwe, dibêje,

- Gotina te rast e, mîrê min. Lê kar û şixul bê serî nameşe. Her tişt bi rêber û pêşewan dikeve rê. Eger Mîr Bedir Xanê rehmetî nebûya, xelkê û eşîrên kurdan xwe li dora serîhildanê nedicivandin. Rewş li welêt aloz e. Li aliyekî zordariya Osmaniyan, li aliyekî jî şerê navbera kurdan û ermenan û navbera eşîrên kurdan... Welat li hêviya law û neviyên Mîr Bedir Xan e. Welat hewcedarê kar û şixulên we ye.

6

- Emin Ali Bey, Osmanlı ülkesi ve İslam dininin sadık evladı Bedirhan Bey'in değerli oğlu, Osmanı vatani her zaman size çalışma ve hizmetlerinize muhtaçtır. Hayır-

li, ugurlu olsun...

Emîn Beg spasî wezîrê ku weha dipeyive dike, rûyê xwe ber bi textê Sultan Evdilhemîd dizivirîne û du caran xwar dibe û spasiyên xwe berpêşt Sultan Evdilhemîd jî dike. Sultan Evdilhemîd jî bi ken, hêdîka serê xwe xwar dike û silavan li Emîn Beg vedigerîne. Piştî silavên rêzdariyê, Emîn Beg li wezîr vedigere û radiweste. Wezîr jî zabîte kêleka xwe nîşanek werdigire û bi rêzdarî, bi aliyê çepê yê sînga Emîn Beg ve dike. Paşê cynî tiştî dubare dike û nîşaneke din jî pê ve dike. Du nîşan, nîşana liyaqatê û nîşana Osmanî li ser redîngota reş, li ser sînga Emîn Beg dibiriqîn.

Celadet, bi kêfxweşî, li nik mamên xwe, ji nav mêvanan, li bavê xwe dinihêre. Di vê roja ronî ya payiza 1903-an de, li Saraya Dolmabahçe, salona Muayedê, bavê wî bi merasîmekê, nîşanên dewleta Osmanî ji Sultanê dewletê werdigire. Bavê wî ew jî bi xwe re aniye merasîmê. Bask nîn in ku Celadet pê bifire. Ew li Dolmabahçe, di salona bedew a Muayedê de ye û li bavê xwe û Sultanê dewleta Osmanî dinihêre! Wê şevê qet xew neketibû çavên wî. Di nav lehîfan de, wî mîna şujiyekê, xwe badabû û bi zehmetî kiribû sibe. Destê sibê jî, berî herkesî, ew rabûbû, dest û rûyê xwe şuştibû, kîncên xwe yên nû ku ji bo wê rojê hatibûn dirûtin, li xwe kiribûn û li hêviya bavê xwe mabû. Diya wî û şehribanê jî, xweş, porê wî şeh kiribûn û qirawata papyonê pê ve kiribûn. Herçî bavê wî bû, gava ew li dora saet heyştan ji qata jor peyayî jêr bûbû, redîngoteke dirêj û coteke pantolê reş li serê dibiriqîn. Ew jî ji bo merasîmê hazir bû. Me-

rasîm di saet dehan de bû. Piştî xwirîniyê, paytona mamê Celadet, Elî şamil Paşa hatibû ber derî, ew lê siwar bûbûn û tevî Elî şamil Paşa, Murad Beg, daketibûn lengergehê. Ji wir jî, bi keştiyê, bi hevaltiya teyrên zeryayê, ew derbasî aliyê din ê Xalîcê bûbûn. Li wî alî jî paytona mezin a mamê Celadet, Osman Paşa ku li ber destê Sultan Evdilhemîd dixebitî, li hêviya wan bû. Birayên din ên Emîn Beg ên seresker Bedrî Paşa, Necîb Paşa, Husên Paşa, Mehemed Elî Beg û kurmamê Celadet, lawê Necîp Paşa Evdilrezak jî li Dolmabahçe li hêviya wan bûn. Gava ew gihîştin Dolmabahçe, Evdilrezak Beg li ber deriyê bexçe Dolmabahçe li benda wan bû. Evdilrezak Beg li Sarayê, mîna vergervan û teşrîfatvan, dixebitî û gelekî nêzikê Sultan Evdilhemîd bû. Celadet heyranî kinc û lixwekirinên wî bû. Wê rojê jî kinceke nû ya frengî û feskî sor ê nû ahengeke taybetî dabû wî û bejna wî ya dirêj. Simbêlê wî badayî, rûyê wî bi ken bû. Wî ew biribûn hundir.

Li gora gotinan, salona ku ew niha lê bûn, Salona Muayedê, ya Dolmabahçe, salona herî xweş û mezin a hemû Awrûpayê bû. Salon, tîmsala xweşahî, mezinahî û spehiyê bû. Li erdê xalîcên mezin, fireh û rengîn raxistî bûn. Kêlekên deriyê mezin ên salonê bi mehfûrên rengîn ku ji her aliyên welatê fireh ê Osmanî hatibûn, raxistî bûn. Dîwar û banê salonê bi neqîşên naqaşên herî hoste hatibûn rengandin. Çire û şam-dankên zêrîn û zîvîn xweşahiya dîwaran temam dikirin. Pencerên salonê fireh û dirêj bûn û bi rengên keskesorê hatibûn xemilandin. Ji hemû salonê bîhneke mîna bîhna

gul û emberê difûrî. Niha, Celadet, tevî bav û mamên xwe, li vê salonê bû!

Îro, ji bo Emîn Beg û Bedirxaniyan, rojke tarîxî ye. Ji mêj ve bû ku zimanên hesûd û zikreş li Stembolê belav dikirin ku Sultan dê malbata Bedirxaniyan ji Stembolê derxe û sirgûnî deverenê dûr bike. Wan zimanan belav dikirin ku Bedirxanî li dijî Sultan di nav dek û dolaban de ne û haziriya serîhildanekê dikin û dixwazin axa Kurdistanê ji dewleta Osmanî rizgar bikin. Dewleta Osmanî û rêberên dewletê, malbata Osmanî, kar û şixulên dewletê, ji mêj ve, bi awayekî gelek taybetî ku hîç li ba dewleteke din nîn bû, digerlandin. Osmanîyan kar û şixulên xwe bi wezîr û paşayên ku ji gelên bindest ên dewleta Osmanî bûn, digerlandin. Loma jî li dora sultanên Osmanî hertim wezîr û paşayên ji milletên din, kurd, ereb, çerkez, laz, yewnan, bulgar, arnawit, boşnak hebûn. Bêguman van wezîr û paşayan jî kar û şixul li gora menfeatên xwe û milletên xwe digerlandin û ji hêzbûna wezîr û paşayên din hez nedikirin. Hertim di navbera wezîr û paşayan de dijîtî û berberî hebûn û ji Sultan re hevûdu gilî dikirin. Îro jî ev wezîr û paşayên li dora Sultan Evdilhemîd ji pîrbûn, mezinahî û quweta malbata Bedirxaniyan gelekî ditirsyan û dixwestin pêwendiya Bedirxaniyan û Bab-i Aliyê xirab bikin. Loma jî wan li dijî Bedirxaniyan gelek tişt ji Sultan re digotin û li der û doran belav dikirin. Sultan bi tenê li wan guhdarî dikir û bêdeng dima. Kesî nizanibû ka ew çî difikire. Lê li gora mamê Celadet Osman Paşa ku li Sarayê dixebitî û gelekî nêzikê Sultan bû, Sultan Evdilhemîd li gotina

wezîr û paşayên dorali guhdarî nedikir. Dîsan li gora Osman Paşa, Sultan Evdilhemîd li her derî weha digot; "Kurd û Bedirxan-paşazade birayên me yên misilman in. Em yên hev in..."

Jiber vê yekê jî, îro rojke tarîxî bû. Îro Sultan Evdilhemîd, bi vê merasîm û nîşandanê, hem, şexsî, qedrê Emîn Beg digirt û dilê Bedirxaniyan xweş dikir hem jî nîşanî herkesî dida ku kurd û Bedirxanî dostên wî ne. Lê di eynî wextê de, wî rê li ecizî û serîhildanên navdar ên Bedirxaniyan digirt.

Celadet, di vê roja tarîxî de, bi kel û coş, li dora xwe, li Sultan û bavê xwe dinihêre. Sultan li serê salonê, li cihê bilind, li ser textê xwe, bêdeng, çavên wî li ser merasîmê, rûniştiye. Textê wî yê zêrîn dibiriq. Li herdu kêlekên text, kevirên lûlû û yaqûd ku bi textê zêrîn hûnandî ne, rengên têkel ên spehî didin têxt. Rûyê Sultan, rûyekî hinekî dirêj û nûranî ye. Rîh û simbêlên wî dibiriqin. Keneke tenik û bi ûsil li ser rûyê wî ye. Ew qet napeyive, bi tenê li merasîmê û li şeniyên salonê, bi aramî dinihêre. Tevî bavê Celadet bi qasî bîst kesan li kêleka hevûdu di rêzê de û nîşanên xwe werdigirin. Sultan ji textê xwe peya nabe, bi wan re napeyive, xwe nalivîne, - bi tenê serê xwe hêdîka li ba dîke û silav dide wan. Hemû karên din ên merasîmê bi destê wezîr û zabîtan bi rê dibe. Hema çî bigire hemû wezîr, aqilmend û merivên Sultan bi simbêl û rîh, zabît jî tenê bi simbêl in. Rîha hinan tenik yên hinan jî bitr e. Simbêlê zabîtan jî qît î badayî ye. Li salonê tiştê herî balkêş fesên Osmanî yên sor in. Li wir zeryayek ji fesên hatiye pê, li serê herkesî feskî sor ê spehî

heye. Fesan, mîna helaleyên sor, hemû salon tijî kirine.

*Hingê salê min deh bûn. Meraqa min pir, mêjîyê min zarok bû. Di wê salona yekta de min ji kurmamê xwe Ewdilrizak Beg û ji mamên xwe her dipirsî; ev çi ye, ev çi ye, ev çi ye... Wan jî bi ûsil, mîna her merivê tégihîştî, bersîva min didan; ev, ev e. Ev, ev e. Ev, ev e. Bi nêrîna zarokekê dehsalî, min ew hemû tişt, avahiyên stûr, ode û salonên bedew, zêr, zêv, text, sultan, wezîr, paşa, şûr, fes, zimane tirkî, pêwendiya wan bi min, bavê min, mamên min re di heşê xwe de nivisîn. Lê gava ez mezin bûm û pêrgî dek û dolap, êş û zehmetiyên jînê bûm, careke din ez li xwe vegeriyam û min ji xwe pirsî; gelo ew çi bû, ew çi bûn?.. Bêguman, bersîvên van pirsên min ên cara dawîn ne mîna yên berê bûn. Şekil û sûretên ku berê di mêjîyê min ê zarok de çêbûbûn, bi temamî guherîn û qulipîn ser*

*yên nû. Li milekî din, ew şekil û sûret, tu carî, bi her awayî, zelal nebûn... Lê belê, pêwendiya me kurdan û dewleta Osmanî (û bi dû re dewleta Tirkîyê) û pêwendiya malbata me Bedirxanpaşazadeyan û rêberên dewleta Osmanî her û her mîna navenda jîna min ma. Hem bi başî hem jî bi xirabî. Mîna gelek kurdên din, min jî kir, nekir, nikaribû xwe, bîr û heşê xwe, hîs û pejnên xwe jê xelas bikira. Di destpêka salên hezarî de eşîrên tirkîkan hatibûn û welatê me kurdan vegirtibûn. Ji wê rojê û vir de, em û tirk bi hev re, mîna cîran, dijîyan. Lê cîraniyeke newekhev. Ew hertim xwedî dewlet, em bêdewlet, peregende û bindest. Lê tevî vê yekê jî, em di nav hev de bûn, bi hev re dijîyan, ji hev dizewicîn, bi tirkî perwerde dibûn. Ez çi bibêjim... Pêwendiya me hem pir baş hem pir xirab bû, hem çê hem neçê bû. Ez çi bibêjim?..*

## BARAN

Baran dibare  
Biharê pelên xwe daye havînê  
Nûroj  
Bi şahî ye  
Li pêy çar stêrk  
Yanî nuha li hemû cihên azad  
Weke çiyayê Gebar  
Dizgûn û Dêrsim  
Jiyaneke nû pêk tê

Baran dibare  
Bihar bi hemû ciwanbûna xwe di dilê min de ye.

**M. Saîr Alpaslan**




# ÎNTELEKTUELÊN KURD Û POLÎTÎKA

Pîştî telefona bi hêja Firat Cewerî û xwendina hevpeyvîna bi mamosta Mehmed Uzun ya di hejmarê Nûdemê a dehan de, min pêwîstiya nivîsandina çend rêzan dît. Sedema vê nivîsarê jî ew e ku peywendiyên herdu axaftinan jî bi rola rewşenbîrî di civata kurdî de hene. Birêz F. Cewerî digot: “Em kovareke hunerî ne û bes gotarên di vê çerçewê de diweşînin”. Ya din jî li ser peyva birêz M. Uzun ya ronensans û ronensansa kurdî ye.

“Întelektuel” û “polîtîk” du peyvên înternasyonal in û di zimanê akademîk de tê bikaranîn. Mijara me wê sivik û zelal be bi şirovekirina van herdu peyvan. “Întelektuel” peyvek latînî ye û di ferhengan de wilo tê şirovekirin: ew ê bi karê bîrî (fikrî) ve mijûl dibe; mirovê xwendevan. Û “polîtîk” ku peyveke yunanî ye û gelek wateyên wê hene, di ferhengê de wisa tê şirovekirin. 1) Hunerê birêvebirina dewletê. 2) Karê dewleta desthelat di warê rêvebirîya hundurîn û peywendiyên navneteweyî. 3) Komêk ji rêvebira bo rêvebirina karekî dewletê, organîzasyonê, partiyekê, çînekê û hwd. 4) Karekterê gîştî, xêzên taybetî bo rêvebirina karekî. 5) Serpêhatî û pirsyarên jiyana hundurîn û navneteweyî. Lê “polîtîk” di wateyek din de, metaforî jî tê ku mebesta peyvê jî sedî sed ew nîn e. Bo nimûne: 6) Bi taktîk û bi jîrî karkirina ji bo gihîştina armancekê; fêrbazî, peywendiyên pîvandî û plankirî di gel xelkê; pesinkirina bêbawerî û nerast.<sup>(1)</sup>

Tê zanîn ku rewşenbîr û ronakbîrên her miletekî mêjiyê wî miletî ne. Bi zêdebûn û pîrbûna wan, problem û astengên wî miletî kêr dibin, dijbera wê jî rast e ku bi



**Suleiman Sulevani**

kêmbûna wan ronakbîran, problem û alozî pir û zor dibin.

Kultur peyveke gelek bi wate ye, gelek beşên wê hene û yek ji wan beşan jî kultura polîtîkî ye.

Întelektuel û ronakbîrên welatên îndustrî an jî weke tê gotin miletê pêşketî, xwe kê-m-zêde demokrat nîşan didin û hewldanê xwe didin problem û astengên miletên xwe çareser bikin. Mirov dikare bi rengêkî giştî bêje ku ew loyal in, bi tolerans in û bi gotineke din ew xwedan kultureke polîtîkî ya berz in. Miletê kurd û întelektuelê kurd jî vê pîvanê di çi pilê de ye? Çiqasî loyalîtet û bi tolerans e? Di livbaziya xwe de çiqas demokrat û çiqas jîr û zana ye? Di ferhenga me kurdan de ev peyvên han di çi wateyê de ne? Ji ber dîtineke cûdatir wê çiqasî bikaribe xwe ragire?

Ger em ji rastiye bi dûr nekevin, kultura kurdan ya polîtîkî kê-m û nizim e, ev jî barê întelektuelên kurd girantir dike û berpirsiyarên wan mezintir dike. Yek ji fonksiyona rewşenbîrên kurd û weşanên kurdî ew e, ku vê kultura polîtîkî berz û bilind bikin.

Kêmasî, zehmetî û dijarî li ber çavan in. Nebûna dewleteke kurdan, neyekbûna kurdan, hebûna îdeolojiyên cuda û mirovên amator û xwedî dîtînen teng di karê polîtîkî de; vî karî jî bo ronakbîrên kurdan gelekî zehmettir û diwartir dike. Bêguman pêwîstiya me bi rexneyên avakar heye, rexneyên ku tiştên ne rast û şaş hilweşîne û di şûna wan de tiştên rast, bi nirx û qîmet ava bike. Nirxandina îdeolojî û partiyên kurd, nirxandina rewşenbîr û kesên bi desthelat di nav civata kurd de çi li hundur welat û

çi li derveyî welat, ku pêwîst e bi rengêkî hêja û berketî bêne rexnekirin û bi mebesta pêşveçûna wan partî û kesan ku encam de; daxwaza pêşveçûna miletê kurd be.

Ji Ewropa rojhelat (bloka sosyalîst ya berê) mirovên bi desthelat di hîerarşiya dewletê de wek parlementer (bo nimûne) tên swêd bo xwendin û fêrbûna demokrasiyê, çunkî hewcedariya wan bi demokrasiyê heye, lê hewcedariya me kurdan bi çi heye? (2) Bêguman pêwîstiya me bi her tiştêkî pêşveçûnê heye û yek ji wan demokrasiyê ye. Demokrasiyê proses e, tradîsyon e, kultur e û mirov bi şev û rojekê nabe demokrat. Mirov dipirse, çima hêz û dezgehên kurd, zana û pisporên kurd vexwendî kurs û semînerên wilo nakin û di eynî demê de çima ronakbîrên kurd dest bi înnîsiyatîvê nakin û pêşniyazên wilo nakin. Kurdayetî, objektîvî, dûrbîn û wirbûn xisletên girîng in ku di herdu aliyên de hebe. Ne hewceyî gotinê ye ku gotarên bi kurdî yên di vî warî de çi roleke mezin dilîzin û çiqasî girîng in.

Rast e û baş e ku weşanên kurdî di derbarî mijarên kulturî yên cûr be cûr de hebin, lê çima kultura demokrasiyê û polîtîkayê (di dema ku miletê kurd pêdiviya wî bi van herdu tiştan heye) jî tê de nebe?

Berî ez behsa dîtina mamosta M. Uzun bikim, ez hez dikim şaşiyekê rast bikim. Birêz M. Uzun dibêje "Ronesansa ku di qirnên 15-16'an de li Îtalyayê hate pê û pê re li hemû Ewropayê belav bû..."

Li vir şaşiyek heye. Ronesans ne di sedsalên 15-16'an de dest pê kir, lê di sedsalên 13-14'an dest pê kir û di sedsalên 14-15'an de li Ewropayê belav bû. Di sedsalên

15'an de gihîşte Swêdê. Ronesans berfê hemû tiştî tevgerike kulturî bû û bi taybetî di warê huner û avahiyê de bû. Stêrkên ronesansê Michelangelo û Leonardo da Vinci ne. Ronesans ku di wateya nûbûn an jî jidayikbûn e; stîlek bû wek baroko, rokoko û hwd. Ronesans bi hatina baroko di salên 1600'î tewaw bû.<sup>(3)</sup>

Nivîskarê hêja M. Uzun behsa rewşa aloz û kambax ya kurdan dike, dinyayê teng dike û peyva ronesansê layiqê kurdan nabîne.

Dîtineke me ya ji M. Uzun cûda li vir heye. Ez pê re ku kêmasî û problemên me pir in, lê em tişteki bi dest naxin, gava em tenê rastiyan rût û negatîv ên civata kurdî dubare bikin bê konkretkirin û dermankirin. Em çima berê xwe nadin herdu aliyan û tiştên pozîtîv jî nabînin. Peyvên wek welatê me hatiye perçekirin, li paş maye, nezan e, civat jihevketî ye, nakokî heye û hwd. peyvên gelek giştî ne û mirov pesimîst dikin û baweriya mirovan sist dikin. Bêguman mebesta min nîn e ku em derewan li xwe bikin, rastiyan xwe veşêrin û çavên xwe li ber fakta bigirin. Me nevê em xwe ji xwe mezintir bibînin, lê me nevê em xwe biçûktir jî bibînin. Eger mirov objektîv be û digel wijdanê xwe rast be, mîletê kurd çî caran wisa bi hevî nebûye, çî caran lîteratur, zîman û hestê netewî wisa berz nebûye, çî caran wisa hişyar nebûye, çî caran wisa navê Kurdistanê nehatiye bilêvkirin, lê ji aliyê din ve jî rast e ku çî caran nakokî wisa dijwar nebûye, çî caran dijminên kurd wisa dijayetiya xwe diyar nekirine. Ne zehmet e mirov bibîne ku pirtir hişyarbûna kurdan û daxwaza mafên wan, dijminên

kurdan hartir û hovtir kiriye.

Du fenomen diyar in û pêwîst e mîletê kurd xwe jê dûr bike. Yek fundamentalism û ya din jî ekstremism e, çûnkî ev herdu diyarde (fenomen) ne di xizmeta me kurdan de ne û ji dîroka dûr û nêzîk diyar e ku ev herdu rê bes kambaxî û malwêranî aniye û çî mîlet pê şa nebûye. Bêguman prensîbbûn û daxwaza mafên mirov çî peywendî nîn e bi ekstermîzmê û ne bi fundamentalîzmê. Divê mirov ne wisa hişk be ku bibe ekstremîst û ne wisa paşmayî be ku bibe fundamentalîst.

Bi dîtina min rojname û kovarên kurdan û bi taybetî yên bi zîmanê kurdî dikarin ji bo mîletê xwe xizmeteke pir hêja bikin (ku bi zîmanê kurdî derdikevin karekî pir pîroz e); bi êşkere û diyarkirina şaşî û çewtiyan kes, dezgeh, organîzasyon û partiyên civata kurd. Daxwaz ne ew e ku hemû rewşenbîr û întelektuel bibin polîtîkvan, lê pêwîst e ew rîya azadiyê baştir bibînin û rohnî û xweştir bikin jî. Ronakbîr ew e yê ku hestê xwe bi azadî diyar bike û hewl bide xizmeteke mirovahî pêşkêş bike. Gotina rastiyan û ewa di dilî de bi întelektî ser zîman be, hişyar be û nexasim ewên bi desthelat bin di civata kurd de.

Bi pêwîst nabînim nimûneyên şaş û negatîv li vir bidim û ez ê hewldanê bidim hinde nimûneyên baş û pozîtîv berçav bikim.

Rejîsor, aktor û stranbêjê kurd Nîzametîn Ariç di pêşgotina xwe ya ji bo filmê "Kilamek ji bo Beko" dibêje: "Em hêvîdar in ku em ê bikarin li ser axa welatê xwe bi aşî bijîn. Me hêzek heye ku di zarokên me

de mezin dibe. Dema her tiştên jiyânê ber ba bûye, hêvî bi tenê maye. Digel belavkirina dîroka me bo cîhana derve; hêvî jî mezin dibe. Û ji ber vê yekê jî min film çêkirîye.” Ariç di hevpeyvîneke TV’ya Swêdê de dibêje:”Em dixwazin digel milletên din bi-jîn, lê bi azadî, ne bê azadî.”

Birêz N. Ariç bi filmê xwe dokumentek pêşkêş kir û bi hunerê xwe kurdayetîya xwe diyar kir. Nemirên wek Ehmedê Xanî, Celadet Bedir Xan, Cegerxwîn, Dr. Nûredîn Zaza, Yılmaz Guney, Mûsa Anter û gelekên din bi berhemên xwe ên orjînal bûn sembol û ketin dilê millet, bûn îdol bi nêzîkbûna xwe ji realîta kurdî û ji jiyana kurdan.

“Balzak li ba Marks û Engels wek nivîskarekî pir hêja dihate pejirandin. Di dîtina xwe ya polîtîkî de Sheakespeare, Gothe û Balzak kevneperest bûn. Digotin ku tiştên em ji Balzak li ser civata kapîtalîstî û çîna burjuvazî li Fransayê fêr bûne, em tu caran ji dîrokvan, ekonomîst û statîstîkvanan fêr nebûne. Di berhemên Balzak de helweşandin, fen û sextekariya burjuvazî hebû. Li ba Balzak çewsandina gundiyan hebû, ji bo peran xwe firotin hebû, qehpetîya burjuvazî hebû. Balzak di nivîskariya xwe de xetêke realîst dimeşand. Yanî rastî çi bû, wî jî ew dinivîsand.” (4)

Çima lîteraturvan, întelektuel û zanayê kurd nabe wênekêşê jiyana kurdî û berevanê nasnava xwe. Şert nîn e mirov polîtîkvan be da ji vê kategoriyê bête jimartin. Ew kurd be û ronakbîr be, ew ê bibe polîtîkvan di çavê dijminên peyva azad her çend ew ji jiyana polîtîk dûr be.

Wek mamosta M. Uzun dibêje ku hatina ronensansê û geşbûna wê ne bê dijwarî bû û gelek astengî û zehmetî li pêşîya wê hebûn. Û ger em bawer bikin ku ev destpêka ronensansa kurdî ye û digel cudahiya cih, dem û rewşê ya herdu civatan; pêwîst e ew fakt û rastî derbas be bo milletê kurd jî. Eger bawer bikin ev destpêka ronensansê ye pêwîst e hêviya geşbûna wê jî hebe, lê her wisa pêwîst e xebatek bê westan jî bê kirin bo vê armanca pak.

Bi fêde ye ku ez li vir axaftina keçeke reş ya di filmê dokumenter li ser Afrîka Başûr berî Nelson Mandela bibe serok, dubare bikim.

Ew keç di temenê bîst salî de bû û diyar bû ku ji çîneke bindest û hejar dihat. Wê digot: “We have no right not to believe that we can make it” an ku me maf nîn e, bawer nakin em ê bi ser kevin. Wê li dereke din jî weha digot: “If you are too mauch in love with your dream, you have to work hard for it.” anku eger tu dixwazî xewna te bibe rastî, divê tu ji bo wê gelek xebatê bikî.

Du pirsîyar û du bersiv ji hevpeyvîna bi rejîsorê kurd Yılmaz Günay ku baş diyar dike rola ronakbîr û întelektuelên kurd di jiyana polîtîkî de çi ye.

Ji Yılmaz Guney tê pirsîn: “Çawa diguncînê di navbera rola te a polîtîkî û karê te wek rejîsorekî sînemayê?” Guney bersiva vê pirsê wisa dide:”Di nav tevgerên polîtîkî de mirovên cûrbecûr ji aliyê kar ve wek mamosta, karker, cotyar û hwd. digihên hev û bi hev re kar dikin. Min herdem hizir dikir û niha jî hizir dikim ku huner di xebata

miletê min de aletekî girîng e, lê pêwîst e mirov van herdu tiştan têkel neke, çunkî huner dikare alîkariya karê polîtîk bike lê nabe alternatîv bo wê.”

Di pîrsa duwemîn de “Gelo tu endamê kîjan rêxistinên kurdên Tirkiyê yî, an jî tu piştgiya kê dikî?. Bersiva vê pîrsê bi azayî û întelejentî wisa dide: “Rêxistinî, na. Lê bi rengekî giştî, bêguman ez piştgirê hemû rêxistinên kurd im yê ku ji bo azadiya milletê kurd xebatê dikin. Bêguman ev nayê wê maneyê ku ez digel hemû dîtinên rêxistinên kurdî me, herwisa nayê wê manê ku ez bi çavekî rexnegirî berê xwe nedim vê an wê rêxistinê. Lê ev tiştên han peywendî bi rengekî serekî bi polîtîka hundurî ya kurdî heye û pêwîst nake em li vir lêbikolin.”<sup>(5)</sup>

Ez di wê baweriyê de me ku pêşeroja lîteratura kurdî wek her tiştên din ên kurdî gi-

rêdayî pêşeroja polîtîka gelê kurd e û partiyên wî ne.

Di dumahîka vê nivîsînê de hêvîdar im ku tişteki pozîtîv tê de hebe. Li vir mebesta me ne ew e ku em xwe bi zana bidin nasîn, aqil bidin û şîretan bikin, haşa, lê dibe ku ev nivîs di nava rewşenbîrên kurdan de munaqeseyekê veke.

Têder

- (1) Ferhenga peyvên biyanî di zimanê bulgarî de.
- (2) Semînera Lund-930629-ser tema “Çihê kurdan di sistema çihanê ya nû de.” Kovara “Yekgirtin” jimar 16.
- (3) Ferhenga “Vad varje svensk bör veta.”
- (4) “Nûdem” 10, Şerefxan Cizîrî.
- (5) Studia Kurdica, januarî 1985, Kovara Înstituta kurdî ya Parîsê.

# MIN DIVÊ ROMANEKE SERKEFTÎ BINIVÎSIM

Li destpêkê peyv e û...  
pîrozîrîn peyv  
di ferhenga miletan de dîrok e.

li destpêkê peyv e û...  
pîrozîrîn peyv  
di helbesta helbestvanan de  
welat, evîn û çîrok e.

Li destpêkê peyv e û ...  
pîrozîrîn peyv  
di çeperên şorişan de  
peyva "şehîd" e.  
ew jî îro  
li govendê rwîs e,  
bê karûkok e!

Lê li roja îro  
milet, şa'îr û welat  
bûne peyvên romaneke bê serûbin.  
bûne werzên romana min  
qelema min jî serê xwe ranake  
di heft ciyan da şikestî ye  
tê de derz, tîk û tok e.

2

Li destpêkê peyv e û...  
ev peyva dûmahiyê ye  
Li destpêkê peyv e û...  
ev romana dûmahiyê ye.  
Li destpêkê peyv e û...  
ev dîroka dûmahiyê ye.  
Dîrok xwe dubare dîke...  
ev dubarekirina dûmahiyê ye.  
Peyv dê bête serjêkirin.  
Roman dê bête sotin û  
nivîser dê şehîd bin.  
qelem dê şikên  
bihar dê ji salê havî bin  
çunkî bêhn ji gulên kûvî bûne!  
gul ji baxçan disil in  
dîroknivîs  
gihîştin derazînka mirinê  
qelemê hilnagirin.

ji bo nivîsîna rastiyê  
bi du dil in!

Destpêka dûmahiyê ye  
dîroka me dîroka me ye  
dubarekirin û dubare ye.  
ketiyên me gelek in  
ne yek, du û sê  
bîst û çil in.  
Da ku fihêt nebîn..  
werin dest bidin tevr û bêran  
dîrokê bihelîşkêvîn  
şikestiya binixêvîn  
îro rastîgotin  
şehîd û xwînretin  
bo şorişa kilçiv û kil in.

3

Ev destpêka dûmahiyê ye  
hêşta li welatê min  
dayik dîrokê wekî xwe dinivîsin!  
serpêhatî û çîrokên efsaneyî  
bi zîmanê realîzmê werdigêrin!  
wekî cara dubare dikin  
heft zaroya  
bi sakoyekî dişînin xwendîngêhê!  
Heft birçiyar  
bi nanekî têr dikin!  
Heft birînên sava  
heft leşên nazik  
heft zaroyên şêhîdên serhildanê  
bi nexşê diyayî yê welatê min  
dişînin şehyana  
dişînin NEWROZ û dîlanê!

Hey wax...

bo wê dayikê!!  
ya ku hêşta hisreta wê  
maleke ava û...  
landikeke tena û..  
buxçkeka vekirî  
ji înanîdî û birînê

hey wax...

bo wî welatî  
dîroka wî hatiye tomarkirin  
li gizîrte û... deryayên jîbîrkirinê.

Hey wax...

bo wî welatî  
siyasî lê bûne hevîrê mirînê  
bo wî welatî  
seyda û mamostayên xwendîngêha  
dersa rastiyê dibêjin



pale û rencberan  
dest dahêlayn  
    ji karkirinê  
ez ji berê qelemê û çavê kamerayê  
lê werdigêrim û  
çavên xwe lê diniqînim.  
Min divê romaneke serkeftî binivîsim.

Min divê  
keziyên qîza  
bikime weris û..  
qerqodên şehîdan bikime gemî û...  
li vê derya miştî zîvrok derbas bibim  
Min divê romaneke serkeftî binivîsim.

4

Ez û dîrok  
bûne du peyvên hezjêker  
ez bi hemî viyan û giyan ve  
ew bi hemî pîrozî û şehîdan ve  
îro bûne cotek  
li ber derazînka tariyê û..  
tarî paşa ye li ser erşê xwe razayî.

Ez û dîrok  
du peyvên sava ne  
mamosta  
dergehê xwendîgehê li me girtû.

Ez û dîrok  
destpêka dûmahiyê ne  
peyama dûmahiyê ne  
birûska dûmahiyê ne  
    hatine şandin.

Em herdu  
gaziya dûmahiyê ne  
ku şehîdên HELEBÇE rahêlaye.

Ey miriyên sax!  
Ey saxên mirî!  
Bîra we têt  
dema dehmana vî bajarî ji ser avêtî?  
berêxwedan bûye fihêtî  
me dehman berdaday  
lê hêsta avahiyên vî bajarî  
ji ser ve şûşe ne  
ji nav de  
dîwarên delingpîs in.  
dergehên bêderge ne.  
roj hatin û...  
roj borîn  
li vî bajarî li ser pelên vê romanê  
serkeftin nerabûne westîka  
guhurîn werarê nakin  
li vî bajarî  
mîlê seatê nagere!  
av li axê rawestiyaye  
...û min divê  
romana xwe bikime bûk û  
zû veguhêzim  
tevnê dûmahiyeka bêdûmahî deynim  
nexşeke dî birêsim  
lê dav, peyv û qelem ji min kûvî bûne  
...û min divê romaneke serkeftî binivîsim!

5

Dîroka me dîroka me ye  
dubarekirin û dubare ye.  
Ji ferhenga me  
ji ferhenga mirovatiyê  
peyvên giran zû dikevin  
ev destpêka dumahiyê ye.  
Werin, em hemî  
romaneke binivîsin

ku kesên çîrokî û..  
pehlewana tê de nerevîn  
peyva "Hemayon", "Atatürk" û "Enfal"  
rûreş bin.

Werin  
da ferhenga ketina serûbin bikin.

Ji ferhenga mirovatiyê  
gelek peyv wînda bûne  
"Spartakûs" hîn nemiriye  
şorişa beniyana sîrodek nemir e.

...û dîroka me... dîroka me ye  
dubarekirin û.. dubare ye.

Dîroka me bûye stranek  
li çiyayê Cûdî  
... û li Akre pêhlewana vedilorînin.

Ya bûye tabloyên ji xetê bizmarî  
di entîkexanên biyaniyan de  
biyanî dixwînin!

Hero spêdê  
dême wê ji resenatiyê tete şuştin.

Hero êvarê  
diz dikevîne werzê dîroka me  
..û dîrkîvan nabînin.

Çira helkin  
ev ronahiye ne bes e  
dîrokê vecemînin  
romana xwe li ber binivîsîn

çira helkin  
ev ronahiye ne bes e  
cejna bûnê li ber bikin  
hena bûk û zavê li ber bişêlin  
mewkîbê şehîdên serhildanê  
li ber bigêrînin.

Çira helkin  
destpêka dîmahiyê ye û

roman gihîstû nivê.  
çira helkin  
da ku şehîd poşman nebin  
hêşta Helebçe tariye  
term li pişt ewran veşartîne  
çira helkin:  
rabe, nerûne  
qelem dipeyive  
roman dihête nivîsîn  
gelek werz û gelek qonax  
dibûrin  
nav û nîşan jî  
xema wî kesî ne  
yê pirtir çira hikîrîn.

**Necîb Balayî**

# NIMÊJA SER BALGÎ

**L**i welêt niha bahar e. Berfê niha daw-delîngê xwe berev kirine û tenê li berpalê çiya, yênerasî, yek jî li ser serê wan ê bilind maye.

Xelkê deştê niha derketine dolga û ji zomê dora Rewanê her sibe şîr, mast, rûn û penêr ji bo firotanê tînine bajêr. Gelek bajarî ji dengê “mast, mast” ji xewê hişyar dibin;”- Ereb mitala welêt kiribû.

-De rabe, rabe, yanî ji te tirê tu hatî mala hêsabûnê, - Îvan Sêrgêyîç qotê cigarêyî biçûk, ku îdî pêçiyên wî dişewitandin di wê de avêt û rabû ser xwe.

- Îcar çî ji mala hêsabûnê kêmtir e; daristan, hewa paqij, mixmixk jî tunene, Ereb bersiva wî da.

-Ne jî mîna germa Rewanê diqijilîne.

Îvan Sêrgêyêvîç lûlên cemedê, yêner ji burû ku bi bijan-gên wî ve darda bibûn, qetandin.

Herduya lepikên xwe yêner pînekirî kirin destên xwe, gir-debir hildan û dest bi karê xwe kirin. Wan darê qalind ên bilind dibirîn, bi bivir çiqê wan jê dikirin, paşê di ser berfê re dikişandin, derdixistin ser rê.

Îvan Sêrgêyîç mêtalûrg bû, profesore înstîtûteke Lê-nîngradê bû. Sala 1935-an wî dişîne Uralê, wekî alî mêtalûrgê cî bike, lê havîna sala 1937-an wî digirin. Heft zanê mêtalûrgayê ji Moskovayê û Lenîngradê şandibûn, her heft jî girtin.

Îvan Sêrgêyîç jî torna malbeta Trúbêskoya bû. Piştî şorişa Oktobirê malbata wî gişk ji welêt derket. Lê wî nexwest. Bi fikra wî ya hingê, ew çawa lawê Urisêtê gere tenê li Urisêtê û ji bo welatê xwe kar bike. Kî li ser text dibe bila bibe, ew merivekî zanyar e, karê wî bi sîyasetê neketiye.

Milkê wan, malhebûna wan gişk jê stendin. Lê wî gazi-nê xwe nedikir, difikirî çawa gişk, usan jî ew.



**TOSINÊ REŞÎT**

Helbet wî nerastî û neheqiyê li dor û berê xwe didîtin, lê serê xwe kiribû ber xwe, bi karê xwe ve mijûl dibû. Û di nava çend salan de di dereca mêtalûrgyayê de baş bi pêş ve çûbû. Bi metodê wî kombînatê mêtalûrgyê dihatine çêkirin, gotarên wî, yê zanyarî bi zîmanê ewropî dihatin wergerandin. Di nav hogirên xwe de ew îdî zanekî naskirî bû.

Kombînatê li Uralê çêdikirin jî gerekê bi metoda wî kar bikira. Lê destpêka sala 1937-an pareke wê kombînatêye biçûk teqiya. Çend cara civîn kirin û anîn bîra Îvan Sêrgêyîç, wekî wî berî çend salan gotiye ku di dereca mêtalûrgyayê de Almanyaya pir li pêş e û baş dibê seva hînbûnê çend kesan bişîne wira. Usane ew bi dijminê dewleta Sovêtê, mîr Trûbêskoy ve girêdaye û bi spartina wî ev tişt kiriye. Ber vê tawandariyê efûkirin tunebû û Îvan Sêrgêyîç Trûbêskoy him metel dima, him jî şa dibû, ew çawa bû, wekî ew nekuştin.

Nîvê gulanê bû. Rast e serma hinekî şikestî bû, lê dîsa jî heftûya buhurî pêçiyên lingê Malêvîçê ji Odêsayê surê birin.

Eva Kolîma bû, tu bi zivistana Kolîmayê re heneka dikî.

Berî êvarê, gava tarîgewrik di nava çiqê daran de bibû xumam, Îvançûkê xaxol kire gazî "Kar berdîn" û girtiyên qefilî û westiyayî bi carekê ve karê xwe hiştin, hacetê destê xwe berev kirin, birin ser xizika bi cîh kirin, bi xwe jî ketine cêrgê û berê xwe dane qijlê.

Rê wek du kîlômêtra di nav daristanê re diçû. Ew sed û bîst girtî bûn, li ser wan tenê heşt esker hebû. Dora wan tayga bê serobin. Û fikra revê bibû bizûz, dil û mêjiyê gelek girtiyan dixişivand. Axir firsenda revê li vir hebû.

Çend mehên pêşin fikra revê tabetî nedîda Ereb jî. Lê ne ku hema usa bireve, xwe veşêre û usa firarî bijî. Wî dixwest ji vira bifilite, xwe teherekî bigihîne Moskoyê û li wir her tiştî bibêje. Ne axir wir merivên zane ne, yê wî nas dikin jî hene, wê ese guh bidine wî, rastiye vebe û wê wî efû bikin.

Lê çawa bireve? Çawa çend hezar kîlômêtir bi dizî ve here, neyê girtin û xwe bigihîne Moskoyê?

Çend mehên pêşin wî her teherî dixwest pê bihese gelo kes ji wira revîye, yan na? Eger revîne jî paşê çi hatiye serê wan, hatine girtin, yan jî destê eskeran filitîne?

Lê girtî hebûn ku direvîn.

Gava yek direvî, Ereb her tişt dikir, wekî pê bihese çawa revîye, çi dîtiye, çawa bûye, wekî hatiye girtinê. Paşê gava yekî dinê direvî, wî reva wî jî bi hûrgilî analîz dikir.

Piştî salekê, gava êdî gelek rev ketine ser hev, Ereb texmîn kir, wekî rev ji Kolîmayê bê fêde ye.

Bade nîn bû, gava komê girtiyan yê nû dihatin, Îvançûk ew berev dikirin û digot:

- Heta niha tenê merivek ji destê me filitiye, ew jî peranîya gura berî me xwe gîhandi-bûyê û em tenê gihîştine ser hest û pestê wî.

Di pey re weke du sala jî ew wê hêviyê bû, wekî zû-dereng karê wî wê vebe, wê bibînin

ew ne gunekar e û wê wî berdîn. “Çira çawa bû, -ew difikirî, - min xortaniya xwe, zên û êginaya xwe gişk da şorişê, karê karker û cotkaran, min di şerê bajarvaniyê de xûna xwe rêt, lê niha jî navê xayîn û dijminan bidine ser min û pey ewqas zêrandin re min bişînine vî welatê çûyîn û nehatinê”.

Lê girtî dianîn û dianîn. Di nava wan de gelekê mîna wî hebûn, wekî jiyana xwe dabûne rihîna şorişê, lê dîsa jî navê xayîn û dijminan li wan kiribûn. Ew jî girtiyên nûhatî pê hesiya, ku di welêt de zilmeke nebînayî dibe, niha îdî ne bi hezaran, lê bi milyonan merivên am û tam, gelek caran bê dad digirin, yan dikujin, yan jî davêjine hepsan.

Û hêviya wî tê bêjî şikest. Çirûsiya di dilê wî de hebû, wekî wê zû-dereng jî vira bifilite, hêdî-hêdî temirî.

Lê di kûraya dilê wî de pirîskek ma: Ew hê çilsalî jî tune bû. Çira çawa bû, xwe bîst, sî salî wa namîne. Çawa jî hebe di nava çend salan de pir tiştê bîn guhastin, rastiyê derkeve û ew ê bêne efûkirinê. Lema jî gerekê bijî, gerekê her tiştî bike bona jiyînê.

Gerekê bijî: jî eynatî vê nerastî û neheqiyê re, eynatî bêbextî, şer û şiltaxê di wî de gilîkirî re, eynatî van rojên xeder û zelûliyê re.

Ereb hetanî çend roj berê jî tevî Nodarê gurc dar dibirîn. Wî hinekî gurcîkî zanibû û seva Nodarê, ku rûsî nizanibû, bibû xweyî û xudan, dayîna xwedê. Ciyê wan î razanê jî li bal hev bû, Nodarê kalemêr ser taxtê jêrê radiza, Erebb jî ser yê jorê.

Nodar berê jî nexweş diket. Te hew dinihêrî bê davîte piştî wî, lingê wî, milê wî û heta berbangê çare-zara wî bû. Car-caran, gava îdî tu çare nedima doktor dihate ser wî, derman didayê. Lê wan dermana tu kar nedida û zûtîrkê wî êdî gazî doktoran nedikir. Doktor jî ew jî bira kiribû.

Lê ev êdî jî hefteyekê zêdetir bû, ku ketibû nivînê. Vê carê lap jî taqetê ketibû. Dîsa gazî doktor kirin. Doktor germa wî pîva, ne bilind bû û hilnedane nexweşxanê. Lê jî wî re nivîsî, wekî nikare here ser kar jî. Û sibê heta êvarê tenê bînteng dibû, hema usa jî xwe û derda re digot. “Mala min xirav be, xeysetê min bûye yê jinebîya” carna bi xwe jî xwe sil dibû. Carna dikir rabe, lê hema çawa xwe dida ser lingan janeke usa davîte hêta wî, te digot derziya sorkirî tê radibe.

Ereb bi her teherî dixwest di ber dilê wî de bê, xemê wî sivik bike. Lema jî çawa kete hundur, nêzîkî wî bû.

-E, qet çawanî, Nodar.

-Bira, ez ê bimirim, - Nodar çavê xwe vekirin. - Halê min tune, ez texmîn dikim, vê carê êdî rabûna min tune.- Wî qasekê cavên xwe girtin, bêdeng ma, paşê dîsan gotina xwe berdeyam kir.-

-Sed heyf. Nodar Kalantazê ku di temamiya jiyana xwe de xwelî bêcer kir, xanî avakirin, xêr, bereket li dinê zêde kir, jî tu kesî re xirabî nekir awa, bi nemamî, bê gune, bê tawan girtin şandine vî welatê wêran û niha jî wê bê xeda here. Kî zane, dibe gotina we bol-

şêvîka ye, bi rastî jî xwedê tune. - Kerr bû, bîna xwe kûr kişand, serê xwe hinekî bilind kir û raste-rast li çavên Erebb nihêrî. - Seva çi, Erebb, seva çi? Tu merivekî xwendeyî, te dinê dîtiye, te û hezarên mîna te seva vê rojê şer kirine? Sibê nevî, nevîçirkê min ê rabin û pirs û pirsyaran bikin, ka kalkê wan seva çi hate girtinê, hûn ê çi bersiva wan bidin, hûn ê çi gilî bidine destê wan? Axir ev çend sal in malbeta Kalantazê ne zanibû mîlîsiya û girtin çine, axir der, cînar, heta xelkê gundê dorê jî tenê bi qencyên me em nas dikirin. Lê di vî welatî de qet tişekî rast nema?

Erebb tişt negot. Wê çi bigota, gava wan pirsê dil û cegerê wî jî dikotin, şev û roj tabetî nedidanê. Ew peşmorde binpiya Nodarr rûnişt, bi herdu destan bi serê xwe girt, hinekî mêl bû û demeke dirêj herdu jî bêdeng man.

Di nava van salên talî û tengiyê de, di nav wê zelûliya dîtû de Erebb dîsa jî dilovanî di nav xwe de parastibû û niha jî van gotinên Nodarr dilê wî tijî bû.

Nodarr ew yek texmîn kir.

- Biborîne, bira, kela min tijî bibû.

- Tişt nabe, yeke dor, berê me tenê derd û kul in, - Erebb serî di ber de got.

- Zanî gundê me pir kevin e, kes nizane kingê hîmê wî danîne, kê hîmê wî danîye. Û bav, kalê min gişk li wî gundî çelkirîne. Bavê min li wir e, kalkê min li wir e, kalkê kalkê min li wir e. Helbet yê berî wan jî li wê goristanê hatine veşartin, lê êdî gorên wan di kor de çûne, xuya nabin. Di şîna bavê min de, tu dizanî çiqas hewarî hatibûn. Axir tu nizanî, Erebb, di hemû navçê de rûmeta Kalantazê hebû, kurê wan bimire, kî bû sebeb, wekî min awa am û tam bigirin, bînin, derxine vî welatî. Niha jî ez ê bê xweyî, bê xudan li vîra bimirim, wê bi çîpa min bigirin bavêjin çalekê, yan wê hinek xwelî bavêjin ser min, yanê jî wê usa bihêlin, heta dibime xwarina gurê birçî.

Erebb guh dida van mitalê Nodare bilind gotî û difikirî: "Çi malbeteke bextewar e; bav û kalê wan gişk di gundê wan de, li ser axa xwe hatine veşartin, ne rev dîtine, ne jî kuştin. Û xwest kal û bavê xwe bîne bîra xwe. Bavê wî tirka li Axbaranê kuşt, kalkê wî li gundê Sûsîz, li navça Qersê miriye, bavê kalkê wî, bi gotina mezinan li nêzîkî Dêrika Entabê hatibû kuştinê, kalkê kalkê wî li berpalê çiyayê Sîpanî Xelatê. Ji wan wê de îdî wî nizanibû, lê di nava wan sed, sed û pêncî salê dawî de hê tu cara bav û kur di goristanekê de nehatine veşartin."

Erebb xwest dilbînê bide ber dilê Nodarr û van mitalê tal jî ji xwe dîr bixe.

- De ewqas jî li ber xwe nekeve, mal avayo, çira kî nexweş nakeve. Hîn jî em merivê Kavkazê teyax in, tu ê piştî çend rojên din rabî ser xwe.

- Xwedê dengê te bibhê, bira, lê bi rastî ez vê carê qet bawar nakim rabim ser xwe.

- De tiştekk bû min got. A va tuyê hefteyekê şûnda rabî ser xwe. Min nizanibû tu usan tirsonêk î, çi bûye, meriv usa jî ber nexweşiyê zarî nabe.

- De bila gotina te be. Lê ez ya xwe zanim, - hinekî bêdeng ma, paşê dîsa serê xwe bi-



lind kir,- de wekî usane were îşev ji min re namekê binivîse. - Xwe dîsa di nav cî de rast kir û got. - Tu zanî, çiqas nêt û meremê qencyê, çiqas miraz di dilê min de hebûn.

Ereb ji darbirînê pir diwestiya. Niha jî êşa milê wî alîkî, lê movikê piştê wî lê - lê bûn hev berdîn. Wî dixwest deqekê zû xwe bigihîne cî û hinekî pal bide. Lê pey ewqas gilî û gotin re nikaribû ji Nodar re bigota na.

Hilkişiya jor, ji bin balgiya xwe qelem û defter derxistin, qoncê piştê dêrî danîyî anî pêşberî Nodar danî û li ser rûnişt.

Nodar xwe li ser text hinekî bir û anî, ciyê xwe xweş kir û dest pê kir:

- Pêşiyê li neferên malê gişka silav bike, paşê binivîse, bila Têngîz û Valîko guh bidine Avtandîlê cînarê me. Ew xort in, xişîm in, dikarin şaşiyên mezin bikin. Lê Avtandîl merivekî xêrxwezî, dinêdîtîye, ew tev şer bûye, bi ûrisî zane. Binivîse bila Valîko tu cara terka aş nede. Aşvanî pêşekî baş e, şikeva aşvana tu cara vala namîne. Lê gava xelk tê aş nebî-nebî Valîko bi wana re dikeve gale-gala. Bila tenê di derheqê ar, arvan û dorê de bipeyive, wekî dinê karê wî bi xêr û şerê dinê neketiye. Ziman bela ye, zêdezmanî dikare xetayê bîne pêşiya merivan. Bila miqatî dayîka xwe bin. Heyşt meha ez di kela Tilbîsê de mam, feqîrê ezêlûlîke mezin ji min ra dît. Ê, çi min di wê kelê de dît, bila neyê serê gurê serê çiya jî, gur jî gune ne.- Paşê mîna merivekî ji nişkê ve bi xwe hesyayî, - Xwe te di derheqê kelê de nenivîst.

- Çîra ez xam im, Nodar. - Erebb serê xwe bilind kir.

Wê demê bû çîrînya dêrî û Zîganşînê teter mîna cîna li ber wan tîk bû.

- Selam ji cindiyê Kavkazê re, - wî bi tehrêkî şa got.

- Selam, - Erebb bêyî dilê xwe silava wî vegirt, - keremke, rûnê.

- A, namê dinivîst, - nêzikî Erebb bû û ji jor de li kaxeta nivîsar nihêrî, - Binivîse, binivîse, bila gişk bizanibin em di zelûlîke çawa de dijîn.

Ne Erebb, ne jî Nodar dengê xwe nekirin. Ji bédengiya wan Zîganşîn texmîn kir, wekî ew li wir zêde ye.

- Belê, belê, - Zîganşîn destê wî ser piştê carekê duda nav barakê çû û hat.- gotinên halan yê bi dizî hene. Ê, çibû, ez va çûm.

- Kûçikê kurê kûçika, -di pey derketina wî re Nodar di ber xwe de got, - yê weha xelkê vî welatî gişk kirine dijminên hev.

Zîganşîn berî şêş mehan anîbûn qîşla wan. Xortekî bi dest û pê, xeber xweş bû. Qey bêjî bi carekê ve rîya dilê gişka dît, nêzikî gelekên bû. Diçû baraka gişka, derê baraka gişka li ber wî vekirî bû. Di demeke kurt de bawar bikî di derheqê gişkan de zanibû.

Lê gelekê bawariya xwe bi wî neanî. Berî gişkî wê yekê şik pêşda anî, wekî ev xortê dest û pê timê dişandine ser karê hêsa. Paşê jî wî li ber gişka dilê xwe vedikir, di derheqê xwe de ji gişka re digot. Eva tiştêkî nedîtî bû di nav girtiyên Kolîmayê de.

Zûtîrkê her tiştî ciyê xwe girt. Di nav girtiyan de zû belav bû, ku heftê du caran Zîgan-

şin bi şev, bi dizî diçe bal serokê girtîgehê û her tiştî ji wî re gilî dike.

Dilxaxiya hinekan ku bawariya xwe bi Zîganşîn anîbûn, bû sebeb ku salê wan gelekî zêde bibin.

Yê mîna Zîganşîn di nav girtiyan de timê hebûn. Girtî zû-zû cîguhastî dikirin, hinek dibirin, hinek dianîn û heta pê dihesiyan kî, kî ye, cezayê hinekan êdî zêde dibû.

Zîganşîn roja pêşîn li Ereb xweş nehat. Ew ê ku giliyê Ereb kiribû û roja mehkemê hati-bû û şer avitibûyê jî paşnavê wî Zîganşîn bû.

-Em gihîştine ku? - Nodar Ereb ji nav mitala derxist.

Ereb li namê nihêrî.

- Wekî guhê wan ser diya wan be.

-Baş e. Hemîn ez êdî venagerim. Çawa jî hebe dîsa mezin e. Erê, ji Têngîz re binivîse, bira ew û diya xwe bi hev bişêwirin û Valîko bizewicînin. Xort e, îdî bîst û dusalî ye.- Nodar hinekî kerr bû û paşê dîsa gotina xwe domand, - E, bira, îcar minê şayîke çawa bikira. Felek xêrê nebîne, çawa seva min çep zivirî. Erê, seva keçîkê jî diya wî zane. Di gundê mala bavê wê de dostekî min heye, navê wî Gîvî ye. Bila herin xwezgîniyê keça wî. Seva xatîrê min na - na nake, em bi hev re mîna bira bûne. Hemîn mal jî maleke baş e, keçîk jî berbiçav e. Êdî çi ma. De bes bi ser ve zêde bike, wekî ez sax û silamet im, vê gavê hela hewcê tu tiştî nîn im, bila xema min nekşînin.

- Çawa, - Ereb guve ecêb ma, - tu ji min re dibêjî ez ê bimirim, ji wan re jî dinivîsî tu sax û silamet î.

- Lê gotina te çiyê. Binivîsim ez bedhal im, li ber mirinê me, ew marûmê xwedê wê çi bikin. Şîn û giriyê têkeve mal, derd û kulê kevaniya min a marûm, wê hê zêde bibin, ew kûçîkbavê ez dame girtinê jî, wê hê şa bibin. Lê niha wê namê bixwînin, bêjin welle bavê me baş e, ka em temiya wî bînin sêrî. Heta behsa mirina min bigihîje wan, dibe Valîkoyê min êdî zewicandibin. Lê, bira, ji te tirê min mîna we înstûtût tamam nekirine, ez êdî bi tiştêkî nizanim.

Ereb çend xet jî nivîsîn, name sêniçîk qat kir, navnîşana Nodare, ku ezber zanibû li ser nivîsî û dirêjî wî kir.

-Ez ê çawa bikim, tu didî min. Bila li ba te bimîne, tu ê sibê fireya xwe bişînî.-

Ereb name kire bêriya xwe û usa di ciyê xwe de hinekî ponijî.

- De rabe razê, tu ê berbangê zû herî ser kar, - Nodar ew ji nav mitala derxist.

- Erê, lê, - Ereb ji ciyê xwe rabû, potê xwe êxist danî bin balgiyê bi xwe hilkişiya jorê. Ew demekê dîsa tevî mitalê xwe bû, lê paşê dest bi çîroka xwe kir.

Wê şevê dora çîroka "Kurê baxvan û Koroxlî bû".

"Carekê cara, xeber hate zara, rehme li dê û bavê hazir û guhdara. Hebû tunebû baxvanekek hebû. Baxvan tevî lawê xwe li perê bajarê Alcawîzê dima. Baxekî wan î biçûk hebû. Bax gişk ji darê sêvan bû..."

- Te dîsa dest bi nimêja xwe ya li ser balgî kir, - Nodar pite-pita wî bihîst, - de bêje, bêje.

Ereb hinekî di bîra xwe de çîrok got, paşê dengê wî dîsa bilind bû.

“Li wî welatî sêvên lape baş di baxê kalê de digihîştin. Kalê her payîz sêvên xwe diçinîn, dikirin sepetan û bi barê guhdîrêja bi kurê xwe re tevayî dibire bazara bajarê Alcawîzê”.

“Nimêja ser balgî”, ew çîrokên kurdî bûn, wekî Ereb her êvar berî razanê di nav nivîna de digotin.

Ereb çîrok pir zanibûn. Salên zarotiya wî li welatê Qersê, mala wan çend salan di gundê melegana de mabû. Ew kesîv bûn û bavê wî li wir rênçberî dikir. Bavê wî, şevê zivistanan yên dirêj ji wan re çîrok digotin. Hetanî niha jî gotinên bavê wî di bîra wî de bûn: “Bi roj em bi karê xwe va mijûl in, kurik jî sibê heta êvarê tev zarokên melegana bi ûrisî xeber dida, em niha bi van çîroka usa bikin, wekî kur sibê diçe nav êl û eşîra, bila zimanê wî şikes-tî nîn be”.

Di salên zarotiyê de Ereb ji çîrokan hiz dikir, çîrok ji wî re bibûne hogir.

Her car, di pey temamkirina çîrokan re ew difikire, wekî hê çîlsalî tune, çawa jî hebe rojekê rastiyê derkeve, wê dergekî xêrê ji bo wî jî vebe. Û wî nedixwest piştî veğerandinê zimanê wî şikestibe.

Dotira şevê wê çîroka “Mîrze Mehmûd” bigota, dotira şevê wê “Mîrze Mehmûd” bibûya nimêja wî ya ser balgî.☞

## KENZABURO OE



Xelata Nobelê ya edebiyatê îsal gihîşte nivîskarê japonî Kenzaburo Oe. Qîmeta xelata îsal 950 hezar Dolar e.

Kenzaburo di sala 1935'an de li girava Shikokuyê hatiye dinyayê. Wî di navbera salên 1954-59'an de li Tokyoyê li ser edebiyata fransî xwendiyê. Di bîst û du saliya xwe de jî mîna nivîskar navdar bûye.

Hin berhemên wî yên sereke ev in: Karekî biyanî (1957), Rûmeta miriyan (1957), Û ji nişka ve bédeng bû (1958), Bûkikan jê bikin, zarokan bikujin (1958), Hivdeh (1961), Ji peyayê cinsê xwe (1963), Futbol (1967), Pêlên xwe li ruhê me dixê (1973).

# Helbestvana Hêja Hîvî Berwarî

Xelîl Duhokî

**H**îvî Berwarî di sala 1963-an de, li devera Berwarîbala, li Kurdistanê başûr, ji dayikê bûye. Li Duhokê xwendiyê û peymangeha mamostatiyê bi dawî aniyê. Her ji sala 1975-an dest bi nivîsîna helbestan kiriye. Helbestên xwe di rojname û kovarên kurdî de belav kirine û di festîvalên edebî de xwendine.

Ew ji keçên rêza yekê ye, ku li devera Badînan bi germî hatiye nav qada xebata edebî. Li ser şanoyan, mil bi mil di gel hevalên xwe, helbestên şoreşgerî pêşkêş dikirin û bi dilekî germ û netirs, xebata xwe ber bi pêş de dibir. Ji aliyekê ve li dijî faşîstan dicengî û ji



Hîvî Berwarî

peyvîn di gel kir. Bi dilxweşî ez dê helbesteke wê jî, ji tîpên erebî wergerînim yê latînî û ji xwendevanan re bikim diyarî.

**Xelîl Duhokî:** *Kengî û bo çi te dest bi ni-*

aliyekê din ve jî, li dijî adet, rewîşt û ûtalên kevin dixebitî. Helbestên wê ji aliyê naverok û formê ve bi hêz in û gelek wênên şîrî û muzîkî tê de hene. Zimanê wê sivik e û hevokên wê ciwan darêjtîne. Xwendevanê zîrek bi hêsanî dikare helbestên wê bisengîne. Mixabin heta niha delîve nebûye ku ew diwaneke xwe çap bike, lê berhev kiriye û nêzik e ronahiyê bibîne. Min li Kurdistanê başûr ew dît û ev hev-

*vîsînê kiriye?*

**Hîvî Berwarî:** Min di sala 1975'an de dest bi nivîsînê kiriye. Rewşa aloz a milletê min, karesat û bi dehan tengaviyên wî, siroştaya rind ya wî, ez palvedame nivîsînê.

*- Jin nîva civakê ye. Nivîskara kurd li devera Badînan, çi pêşkêşî milletê xwe kiriye?*

- Ez jî di wê baweriyê de me ku, di gelek civatên pêşketî de, jin nîva civakê ye. Jina kurd jî di gelek qonaxên jiyânê de, rola xwe ya pîroz lîzîye. Ji aliyê edebî û roşenbîrî ve û her wesa ji aliyê siyasî ve jî. Bo nimone çendîn jinên navdarên kurd, mîna Hebesxanî

Neqîb, Qedem Xêr û Mîhrebana Berwarî, roleka giring di pêşveçûna milletî de lîzîne. Lê mixabin, ji ber gelek sedemên diyar û nediyar, nivîskara kurd, çi li Kurdistanê û çi li devera Badînan, nikaribûye roleke mezin bilîzin.

*- Serhildan û paşê reva mezin, çi di mêjiyê nivîskara kurd de dirust kiriye?*


- Her çend berî serhildanê zulm û site-meka mezin li ser milletê kurd dihate kirin, lê serhildan, mezintirîn mizgînî bû, ji bo vî xelkê hejar û bindest. Lê reva mezin, dilte-

zîntirîn karesata me bû, çinku li çi aliyê dinê, ev karê hosan dirinde, beramber çi milleta nehatibû kirin. Vegeza me bo ser axa pîroz, mezintirîn xelat û diyarî bû. Vê çendê jî bi hezaran tişt di serê xelkê de dirust kirin.

*- Wek mirov dibîne, jina kurd nikaribûye mîna zilaman xwe rizgar bike. Giriftariyên wê di mişen e. Tu wek nivîskar, çawan pêşketina wê dibînî.*

- Di nav gelek milletên paşketî de, giriftarî hene. Sedemên wê çendê jî pîrr in! Lê bi bawerîya min, jin bi xwe dikare hinekan çareser bike. Divê jin zîrek û çalak be. Ew jî wek zilaman, xwedan dest û pê, mêjî û bîr û bawerî ye.

*- Amadebûna jina kurd, di semîner û civûnên edebî de, pîrr kêr e! Sedemên vê çi ne?*


- Rast e û ez dikarim bêjim, her tune ye. Ew jî divegerîte ve bo nivîskar û roşenbîrên me bi xwe. Ew rê li jin, dayik û xwişkên xwe digirin û dixwazin jin bi tenê bi karê mal û xwedîkirina zarokan ve mijûl be! Carina dibêjin, ev karekî ne rast e, lê mixabin, tenha dev e û ew jî dibêjin, lê napêjin. Ev rastiyeke tal e, lê divê mirov bêje...

# GAZINEK BO ROJÊ

Erê rojê her ji mêje  
Ewe ez li vê cîhanê bûme mêvan  
Min guh li navê te bûye  
Giş dibêjin..  
Pirr ciwan û jêhatiye.  
Helatina wê  
Li ser kêrî û zinara  
Hemî tav û ronahiye.  
Girni jîna wê li xelkê  
Tev de govend û tilîlî û şahiye.  
Panê rojê...  
Hemî dema her guhên min diveçînîne  
Bo hatina mizgîniya te.  
Cot çavên min nobedar in  
Bo dîtina ronahiya te.  
Lê rojê hindî ez li dû diçewirim  
Tu xwe li min xeware dikî  
Xwe dideye pişt  
Beten û çiyayên bilind  
Da negehîte min, têhin û germiya te.  
Belê rojê baş bizane  
Dê ji te ra evîndar bim  
Ger xelk te maçî ketin  
Ez dê her wekî dînê xwe  
Hêştî pirtir  
Perêsim ronahiya te.  
Ronahiya te.

**Hîvî Berwarî**

# ÎNTELEKTUELÊN KURD Û ŞERÊ GERM



**Cemil Gündoğan**

**D**ostê hêja, nameya te ya bi dîroka 2'ê çileyê pêşin berî bi çend rojan gihîşte min. Ji bo wê spas dikim.

Mîna ku wê bala te jî kişandibe name gelekî bi derengî hatiye. Ne zehmet e ku mirov sebebên wê fêhm neke.

Tu di nameya xwe de dût û dirêj li ser girîngiya nivîsandina bi kurdî rawestiyayî. Tu di derheqa piraniya tiştên ku tu dibêjî de bi heq î. Di gel vê ez dîsan bersiva xwe bi tirkî dinivîsim. Nameya ku min berî bi du rojan bi kurdî nivîsandibû, jî ber "tunebûna wergêran" jî aliyê karbidestên girtûgehê bi paş de vegeyriya. Loma ez mecbûr mam ku eynî nameyê vê carê bi tirkî binivîsînim.

Mîna tu ê ji van gotinên min jî fêhm bikî sedema bi tirkînivîsandina nameya min a pêşî ne nezaniya min a bi kurdî ye. Ez bi xwe zaza me, lê piştî ku weşanên bi kurdî (yên ne qedexe) hatin girtûgehê, min xwe fêrî kurmançî jî kir. Ez niha dikarim bi kurmançî bixwînim û binivîsînim.

Sedema ez jî te re bi tirkî dinivîsînim jî, ne ji ber ku ez jî xwendin û nivîsandina bi kurdî şerm dikim. Rast e, nêrîneke wilo li ba hin "ronakbîran" heye. Lê ez bi xwe ne ji vê komê me. Sedema ez vê nameyê jî te re ne bi kurdî nanivîsînim, ew e ku ez di hundur de me.

Xwesteka te ya ku hevalên girtûgehê jî kovarê re binivîsînin, min name bi dostên xwe yê kurdîzan da xwendin. Lê ez di vê mijarê de ne pir dilşa me. Di gel ku yê di hundur de ji elîtekî pêk tê jî, rewşa wan ya xwendin û nivîsandina



zimanê kurdî ne ji ya hevvelatîyên me yê li derve bi ferq e. Ger ez di reqeman de şaşîyan nekim, ez ne şaş bim ji nav me sed û pêncî girtîyan ancax duzîneyek-duzîne û nîvek dikarin bê problemên mezin kurdî bixwînin. Herçî nivîsandina bi kurdî ye, ne bi qasî tiliyên destekî ne jî. Bi kurdî rewş ne ewçend baş e.

Ew gotinên te di nameya xwe de di derheqa entelektuel û têkoşîna siyasî de gotine, ez qebûl dikim ku hin ji wan rast in. Dîsan jî ne mumkun e ez hemûyî bipejirînim. Tu bi kurdî dibêjî ku "me siyaseta ji siyaseta vanên kurdan re hiştiye, em ê jî di qada xebata întelektueliyê de bixebitin." Tu dibêjî ku kurdan ne ji ber tiştên wilo, lê ji ber kêmaniya întelektuelan winda kirine.

Sedema ku çima kurd bi ser neketine, mijara munaqeseyê dirêj e. Ez di ser vê derbas dibim. Ev rastiyeke e ku jiyana întelektuelî ya kurdan gelekî lipaşmayî û hovane ye. (Ji ber jiyana întelektuelî li welatên ku em xistine bin destên xwe ewqas li paş e, lipaşmayîna me jî ne ewçend anormal e.) Û rast e, vê yekê tesîreke mezin li ser windakirina kurdan kiriye. Ez di vê mijarê de bi te re me.

Lê ez ne bi te re me bê em ê çawan ji vê lipaşmayîna rizgar bibin. Bi ya min, çareserkirina vê, di bingeh de, di riya çareserkirina pîrsa kurdî re derbas dibe. Ger pîrsa me di wê derecê de çareser nebe, ne mumkun e riyeke din ya çareserkirîna hebe. Erê, bê ku çareserkirîna siyasî çêbibe jî, hin întelektuelên kurd dikarin têkevin nava mijûliyên întelektuelî, belkî çend kes ji wan li derveyî welêt, an jî li van deran jî ku fir-

sendê bibînin û werin ba hev, dikarin alîkariyeke girîng bi jiyana kurdan ya întelektuelî bikin... Ev hemû mumkun e, lê ev tenê dikare di pêşdexistina jiyana me ya întelektuelî de bibe alîkar. Di gel vê jî, alîkariyên weha, nikarin wê hovîtiyê xelas bike. Tenê riyeke heye. Ew jî çareserkirina pîrsa kurdî ye. Çareserkirina pîrseke weha jî ne mumkun e bê têkoşîna siyasî bibe. Ji ber ku hê mînakên wê nehatine dîtîn. Bi kurdî mîna gelek karên din, birêxistina karên me yê întelektuelî jî bi têkoşîna ve girêdayî ye.

Li vir mîna keke pîrr populer hate bîra min: Mijara azadkirina kurdî. Mîna ku te jî di hin cihan de behs kiriye, ger em îro bi kurdî nexwînin û nenivîsînin, wê piştî dehpanzdeh salan kesekî ku bikaribe bi kurdî bipeyive nemîne. Ev nêrîna ku di awira pêşî de bi mirov gelekî mantiqî tê, riya wê qet nakeve serê min. Ji ber vekirî tê gotin ku, ger ronakbîrên kurdan dest bavêjin zimanê kurdî wê ev rewş bête guhertin. Ger îro hemû ronakbîrên kurdan dev ji tirkî berdin û dest bi xwendin û nivîsandina kurdî bikin jî, wê di hundurê dehpanzdeh salan de bi temamî zimanê kurdî rizgar nebe. Ev vekirî, bi kovarên ku pênc-deh hezaran difiroşe, mirov ê nikaribe bi televizyon, radyo, telefon, rojnameyên rojane û danûstandinê civakî re têkeve qayîşê. Ev bi tenê wextwindakirin e. Ji ber ku li hemberî van hemû hejmaran firotina pênc-deh hezaran ji kovaran, mînaka li hemberî tanqan bikaranîna tîr û kevana e. Tew mîna hevalên parêzkarên vê ramanê dikin, ger mirov têkoşîna siyasî ya ku ev kurdiya me ya îro li ser lin-

gan hiştiye, bide aliyekî.

Em ji bîr nekin, ger îro balek li ser kurdî hebe, yanî ger bi sînor be jî îro kurdî di nava xwendevanên kurd de pêşketinê nîşan dide, sedema wê ya bingehîn ne xebata dostên li derveyî welêt ya întelektuelî ku ji têkoşîna siyasî dût e, lê ew jî ji ber têkoşîna li hundur e. Ger ne ji wê têkoşînê bûya, wê xebata van hevalên li derve ku îro kemilî ye û dikare li surgunê cidî bête girtin, wê ne tenê ji ber ku di mijarên xwe de diafirînin, lê wê bişîbiya xebatên întelektuelî ku demekê li Sûriyê û Lubnanê pêk hatibû, bi bûya. Yanî wê ne roja ku dihatin afirandin bi kêr bihatana, lê wê di rojên nediyar yê pêşerojê de, bi diyalektîkî, wê mîna jêrenotên bi qîmet bihatina bikaranîn. Ya ku îro ew ji aqîbeteke weha xelas kirine, ji sedî sed têkoşîna îro ya siyasî ye.

Ger em bicivînin ser hev, xelaskirina zimên, weke mînaka populer jî nîşan dide xebateke întelektuelî ku bi têkoşîna siyasî ve ne girêdayî be, wê tiştekî xelas neke. Xal girîng meydana têkoşîna siyasî ye. Ger bête gotin ku ez xebatên întelektuelî dikim û tenê temaşevanê têkoşîna siyasî be, ger ne bi qestî be jî, bi gotina herî sivik, wê rastî neyete dîtin.

Baş e, em di jiyana rastî de çî dibînin? Tam tiştên berevajîya wê. Wek mînak em dibînin beşekî girîng dibêjin, zimanê me wêran bûye, ger em nexwînin û nenivîstînin, wê dawîya her tiştî were, lê li hemberî têkoşîna siyasî ya ku wê zimên xelas bike, gelekî sar in. Li van deran gava xwîn diherike, hin kes dixwazin wê xebatê tecrît bikin û meydana wê teng bikin. Ma ziman wilo

xelas dibe? Tiştên wilo ne nêzikî aqilan e.

A din jî şaş e mirov bibêje xebata siyasî û ya întelektuelî li dijî hev in. Hela li welatên mîna yê me. Ji ber ku siyaseta bi xwe jî ilmek e û di wê maneyê de dikeve nava xebata întelektuelî. Divê em pê nexapin ku siyaseta kurdan ya îro bi seriyê do têtet meşandin. Ev ne ji ber nebihevrebûna siyaseta û xebatên întelektuelî ye, lê ev ji ber wê ye ku hê têkoşîna me negihîştiye pîvanên siyaseta hevdem. Di esasê xwe de jinavêrakirina wê paşdemayînê ne ku mirov xebata întelektuelî ji ya siyasî cihê bike, lê divê mirov tevî bike. Ji ber ku tu rîyeke din ya ku mirov ji siyaseta pêşiyên xwe derbas bike, tune ye.

Di dawiyê de, ez difikirim ku ev ramana han ne nêzikî rastiya me ye. Bi a min ev nêrîn, ji rastiya me wêdetir, nêzikî depolitizasiyona ku piştî Îlonê hatiye jiyana e.

Ji aliyê din ve jî gava mirov li xebatên întelektuelên xwediyê wê nêrînê dinihêre, mirov dibîne ku eynî ye. Wê gotina min hinekî dirêj bibe, lê ger ez hebekî ji vî alî ve jî nêzikî mijarê nebim, ez naxwazim dawîya gotina xwe bînim.

Gava xebata întelektuelî tê gotin, mijara edebiyatê, hunerê, siyaseta, ilim û hwd çî ye? Divê ev civata kurdî bi xwe be, yanî rastiya wê ya aborî, civakî, çandî, îdeolojîkî, siyasî û hwd be.

Baş e, ma mirov dikare wê rastiye jî derveyî siyaseta îro û şerê germ bîne ziman?

Bi a min ev ne mumkun e. Bi taybetî jî, kovareke mîna Nûdemê ku edebî, hunerî û çandî ye.

Ev ji ber du sedemên sereke wilo ye.

Ya yekê, têkoşîna siyasî (nemaze ya germ) di jiyana gel de xwediyê cihêkî girîng e. Ev yeka han ewqas belav bûye, bêî ku mirov wê bibîne û di ser re gav bike, hema hema bê îmkân e ku mirov edebiyat û hunerekê biafirîne. Wek mînak, ger mirov zulma heye nebîne, nalîna civakê nebîne, keder û liberxwedana gel nebîne, mirov ê çawan çirokê, helbestê, romanê binivîstîne? Lê resim? Ma mirov dikare resim çêbike? Hêkel jî, tiştên din jî... Wek mînak, bêî ku mirov tabloyên qehremanî bibîne, ma mirov dikare hêkelan çêbike?

Mirov dikare pirsan zêde bike.

Lê ne pêwîst e. Hûn jî dizanin, tevgera întelektuelî ne ew e ku mirov çarînen Ehmedê Xanî biweşîne û her tim wan şirove bike. Erê, mirov dikare vê jî bike. Ev mijarên girîng in jî; lê divê sînorekî vê jî hebe û jîyan ne tenê ew e.

Sedema dudan, ji bo hunermend û edebiyatvanekî, malzemeyên ku herî dikarin estetîze bibin, di nava vê têkoşîna germ de ne.

Nayê înkarkirin, îro qehremanî, berxwedan, evîn, fedekarî, coşî, heyecan, tirs, hînkari, îxanet, zulm, ketin, rabûn û hwd ku ji bo hunermendekî bi hêsanî nikarin peyda bibin, hemû di nava şerê germ de hene. Baş e, ma hunermend dikare vê malzemeya ku di nava şerê germ de ye û dikare estetîze bibe, bi piştî destê xwe wê de dehft bide? Lukseke wî ya weha heye? Ger ew vê yekê bike, gelo hunermendiya wî/wê hêja-ye çî?

Bi kurtî, gava mirov ji nixteya tevgera întelektuelî jî li meselê binihêre, mirov digi-

hîje eynî baweriyê. Divê îro li welatê me ronakbîr bi ser û binê xwe ve polîtîze bibin û bi taybetî pêwîst e ku ew şerê germ di hundurê xwe de hîs bikin.

Di gel van hemû sedeman jî, ez kovareke mîna kovara Nûdemê, yên ku can didinê, cihê bifikirin jî, nikarim ji derveyî têkoşîna siyasî bibînim.

Ez hêvîdar im min ê bi fikra xwe hûn aciz nekirbin.

Silav ji hemû kedkarên kovarê re.

Bi daxwazên min yên herî jî dil.

18. 2. 1993

Noteke biçûk:

**Cemil Gündogan** ev nameya xwe par bi tirkî ji Firat Cewerî re şandibû. Ji ber ku name li ser mijareke me ya girîng e, bi niyeta vekirina munaqeseyêke di vî warî de em wê bi wergera kurdî diweşînin.

Cemil Gündogan ronakbîrekî kurd e ku ji ber fikrên xwe yên siyasî û têkoşîna xwe îro di girtîgehên Tirkîyê de ye. Ji ber aktîvbûna wî ya nivîsandinê, em wî pîroz dikin. Herweha em di şexsiyeta wî de piştgi-riya xwe ji hemû ronakbîr û nivîskarên kurd yên di girtîgehan de nişan didin.

# CEJNA XIDIRNEBÎ



**Aza Ozmanî**

Jiyana her gelî bi kevneşop, tore, adet, rabûn û rûniştandina wî ve ji gelên din cihê dibe. Ew kevneşopî pir caran ji kûraniya hezersalan tên û dewlemendiya çanda gel tînin ber çavan. Lêgerîna li ser erf û adet û kevneşopi-yên gelê kurd pir kêr hatiye kirin. Di rojên me de, gava radyo, TV, dibistan, kovar û rojname di jiyana gelan ya her roj de guhastinên mezin dikin, ew erf û adet, ew kevneşopî têne jibîrkirin. Ji bo wê jî divê em li wê dewlemendiya gelê xwe xwedî derkevin, rojekê zûtir berhev bikin, lêkolîna wan, ya zanyarî bikin.

Ev gotara me di derheqa cejneke kurdên êzîdî, cejna Xidirnebî de ye. Divê em ji bîra nekin ku cejne Xidirnebî ji aliyê kurdên elewî û hinek kurdên sunî ve jî têtê pîrozkirin. Li ser vê pîrsê em ê di pêşerojê de binivîsin.

Di derheqa vê cejnê de hinek melûmat di lêkolîna zanyarê kurd, yê sedsala 19'an Mele Mehmûdê Bayazîdî "Edetên Kurdistanê" de hene, wisan jî di lêkolîna Emînê Evdal, Arîstovayê û Qanatê Kurdo de rastî me tên.

Em di vê gotarê de li ser wan malûmetan hîn dibin, yên me bi xwe ji nav kurdên Ermenistanê berhev kirine.

Xidirnebî nîlgareke evsaneya kurdan û hinek gelên Rojhilata Navîn û Qavqazê ye. Di nav gel de ew wisan jî bi navên Xidirnebî, Xizir, Xizirnevî, Xidireylaz, Xirdinevî têtê pîrozkirin.

Di derheqa Xidirnebî de kêr malûmat ketine destên me. Ji aliyekî ve ew hatine jibîrkirin, ji aliyê din ve jî nonerê oliyê, şêx û pîr gelek caran naxwazin bêjin.

Li gorî malûmatên ku me berhev kirine, Xidinebî salê carekê ji esmana peya dibe û qesta kurdên êzîdî dike. Ew mi-

razbexş e, yanî mirazan par dike, mirovan digihîne mirazên wan. Ew li esmana bext û mirazê keç û xortan digihîne hev, wana digihîne hevdu. Xên ji wê, Xidirnebî wisan jî zarokan ji nexwaşiyê diparêze. Ew mala ku Xidirnebî lê biqeside, karê wan temamiya salê baş dimeşe, ew bextewar dibin. Nîgarêke wek Xidirnebî wisan jî li bal ermenî û gurgên xaçparêz heye.

Cejna Xidirnebî di îna yekemîn de, ya meha sibatê (bi hesabê kevin), yanî meha yekemîn, ya piştî 13-e sibatê (bi hesabê nû) tê pîrozkirin.

Gerek bê gotinê, wekî kurdên êzîdî berê cejnên xwe bi taybetî di rojên çarşeman da pîroz kirine. Lê di dû re, çawa tê xuyayê di bin bandûra misilmantiyê de ew cejna xwe di rojên îne de pîroz dikin. Ewana cejnên xwe yên olî, ne bi salnama heyvê (wek misilmana), lê bi salnama rojê pîroz dikin, lema jî rojên pîrozkirina wan cejnan sal bi sal nayên guhastin.

Cejna Xidirnebî bi girtina rojiyan dest pê dibe. Ji wan rojiyan re, ku sê rojan dom dikin, dibêjin rojiyên Xidirnebî. Berî rojiya xanya didin hev, hewş, heyata paqij dikin, serê xwe û kincên xwe dişon. Pir caran ji bo roja cejnê cilên nû dikirin. Hinek mirovên oldar û nonerên olî çar rojan rojiyê digirin, ji wan re dibêjin, berva diçin. Ew rojekê zû dest bi girtina rojiyan dikin.

Pir caran, dema cejna Xidirnebî, bûkên salê tînin malê bavan.

Rojî ji êvara duşemê dest pê dikin. Piştî nivê şevê, berî ku pêwra Mezin here ava, radibine paşîvê. Kî ku wê rojiyê bigirin, xwarina xwe têr dixwin, ava xwe têr vedu-

xun, ji bo ku bikaribin roja tê tap bikin, piştî paşîvê, gava dikevin nav nivîna, van gotinên ha sê caran dibêjin: "Îşev bi nêt im, sibe bi rojî me, rojiya Xidirnebî, Xidirnîbî tu qebûl bike."

Êzîdiyên temenmezin, divê hemû rojiyê bigirin. Mirovên nexweş, jinên bi zarok û jinên ku şîr didine zarokan dikarin rojiyê negirin. Gelek caran hinek mirov, bi taybetî jin, ji bo mirovên xwe yên nexweş, yên li eskeriyê û li girtîgehan rojiyê digirin.

Hinek mirov tenê rojekê rojî digirin. Lê nabe ku du rojan rojiyê bigirin, hingê dibêjin wê wan mirovan, wê dinê têkne cot.

Mirovên rojîgirtî, êvarê piştî roj here ava, fitara xwe vedikin, yan şîva xwe dixwin. Di nav gel de dibêjin: "Ro çû ava, bû fitara êzîdiya."

Dema rojiyê bi rojê re girêdayî ye. Rojî berî derketina rojê dest pê dike û piştî roj here ava dawî tê.

Rojên rojiyê, her roj berî êvarê nonerên oliyê, şêx û pîr li nav gund digerin, dikevin her maleke gund û ber stêr (ku xudanê malê hesab dibe) qewla (nimêja êzîdîyan) dixwînin. (Helbet şêx û pîr qewla tu cara

nanivîsin û naxwînin. Ew wana timî ji ber dibêjin. Lê di nav gel de dibêjin, qewla dixwînin). Piştî xwendina qewlan, xwediyê malê, neferên malê destê nonerê oliyê radimîsin û xwediyê malê pera dide wan. Lê ew pere ne mecbûrî ye, dikarin nedin jî.

Her êvar nanê miriya tê derxistin, ji şîva malê xwarina herî baş derdaneke tijî dikin, tevî nên dişîne malên kaşîva, yanê jî hema malên cînara.

Gelek caran dema fitara, mirovên hev,

yan jî hema cînar, diçin malên hev fitara xwe bi hev re vedikin.

Êvara îne, piştî roj diçe ava, rojî temam dibin û dest bi cejnê dibe. Berî dest bi cejnê bikin, diçine serxweşiya malên ku miriyên wana teze hebûne. Bi xwe re araqê, şekir, yan jî qumaş dibin. Ew malên ku diçine serxweşiya wan, ew jî ji berê ve ji bo şîva mêvana karê xwe dikin. Êvara îne jî diçine malên nonerê oliyê, cejna wan pîroz dikin. Di dû re, di mala şêxekî, yanê pîrekî de dicivin, ew mirovê zane ji wan ra efsaneyên li ser Xidirnebî dibêje, distirê. Li gor gotinên mezinan, berê govendên oliyê jî hebûne, lê niha di nav kurdên êzîdî yên li Ermenîstanê dijîn, hatine jîbirkirin.

Êvara îne di pir malan de qurbana Xidirnebî tê serjêkirin.

Fitara rojîya dawiyê, eger mêvan ji bin, pê nanê ji mala xwe dikin a paşê tevî sîvra wê malê dibin, ya ku mêvanê wan e. Wê êvarê kevanî ji bo keç û xortên gihiştî, yên bêmiraz, totka sor dipêjin. Keç û xort wê totkê dixwin, avê venaxwin û wisan radizên. Berî têkevin xewê gazî Xidirnebî dikin: "Ya Xidirnebî, tu mirazbexş î, mirazê me jî bike."

Keça ku di xewnê de avê bide xortê totka sor xwarî, ew dibe mirazê wî. Gelek caran ew ji wî re dixwestin. Wisan jî, eger xort di xewnê de avê bide keça totka sor xwarî wê mirazê wê be.

Wê êvarê di malan da dolîdangê girê didin. Hem zarok, hem jî mezin xwe bi wê dolîdangê diklan. Bi bawariya oliyê, wana gunehên xwe dawîşandin. Pir caran keç, bûk û xort li dora dolîdangê berhev dibûn,

govend digirtin, distran, kêf û henek dikirin.

Êvara cejnê, stûn, arîk û dîwarên xaniyan pê ar dineqîşandin. Demên buhurî tendûr di hundurên xaniyan de bûn, dîwar, stûn û arîkên xaniyan ji dû, bi temamî reş dibûn. Ji ber vê jî pê arê spî baş dihatin neqîşandin.

Dîwar û stûn, heta destê wan digihiştê, pê pêçiya dineqîşandin, lê ji bo arîkê, pîne li serê darê dirêj dipêçan, di nav ar dadikirin û pê arîk nexş dikirin.

Bi taybetî nexşên rojê, heyvê, pewrên stêrkan, çê dikirin. Lê pir caran wisan jî nexşê nela, hov û heywanan, mirovan, çê dikirin. Ew nexş jî bo wê yekê dihatin kirin, ku mal xweşiktir bibe û bala Xidirnebî, yê şiyar bikişîne.

Êvarê dereng komê xortan di nava gund de digerin û şanoyê nişan didin. Ji wê şanoyê re dibêjin "Hatina Kosa". Nîgarê vê şanoyê, yên sereke ev in: Kose, Nare, Şiblî û xulam. Van nîgara gişkan xort dilîzin. Heta ji bo rola (nîgara) Nare jî, xortekî bê rî û simbêl cilên keça lê dikirin. Şano bi naveroka xwe pêkenî ye. Ew wek şanoke pandomîm dihate pêkanîne. Şano seranser bê deng tê leyistin.

Artîst li nav gund digerin, di malên gund gişka de şanoya xwe nişan dikin. Kevaniyên mala fêkî, şêrînayî, an jî dirav didine wan.

Ji bo bizanibin ka Xidirnebiyê pîroz qesta wê malê kiriye an jî na, keçeke azep, arê hinekî qimilandî di testekî de, elek dikir. Dema elekkirinê şarekê diavêjin ser serê keçikê. Piştî elekirina ar wê erê diavêjine ser

devê teştê. Paşê wê teştê bi ar ve datînin ser stêr.

Di her maleke kurdên êzîdî de divê stêr hebe. Ji stêr re wisan jî dibêjin xudanê malê, ew pîroz e.

Digotin Xidirnebî qesta wê malê kiriye gava dewsa nalê simê hespê wî ser ar dihate xuyayê. Eger şopa nalan bihata dîtin, ew yek şeva wê malê bextewarîkê mezin ba. Hingê ew mal qurbanan serjê dikin.

Siba cejnê keç û xortên nezewicî pariya datînin. Parî nan, yanê çike goşt datînin ser çiqêlê darekê, yanê ser dîwarekî, kevirekî û li bendê dimînin, heta çivîk wî parî hildide. Piştî parîhildanê, çivîk bi kîjan alî ve bifire, wisanê mala xwestiya xort, yanê jî xwestiyê keçê wê ji wî alî be. Roja îne, sibê zû dest bi mêvandariyê dibe. Berî gişka cejna wan malan pîroz dikin, ewên miriyê wan, yê teze hebûne, eger roja berê neçûne. Paşê cejna bûkên salê pîroz dikin, ji wan re diyariyan dibin. Rojên cejna wisan jî bo pîrozkirina cejnê diçine gund û bajarên ku merivên wan lê hene.

Di mala gişkan de sifre tên vekirin, kevani wê rojê xwarinê lapê xweş çêdikin, malên xwe dixemilînin.

Salên buhurî mêrên gund gişk di malekê de dicivyan, paşê bi dorê yeko-yeko li malên gund gişka digeriyan. Eger di nava hinêk gundiyan de dilmayînek hebûya, wê rojê diçûne dest û rûyê hev û li hev dihatin.

Roja cejnê her kes kincê xwe yên xweşik li xwe dikin; jin, keç û bûk xwe bi zêr û ziv dixemilînin. Pîr caran cilên xwe yên nû dihêlin ji bo wê rojê.

Wê rojê komên zarokan kite gorê, an jî zembîlekê hildidin û li nava gund digerin. Ew di malan da distirên, direqisin, şanoyên biçûk nîşan dikin. Kevaniyên malan fêkî, şêranî û dirav didine wan. Salên buhurî, gava xanî bi kulek bûn, ew zembîl, kite gora di kuleka da dar de dikirin û distiran:

“Dolî, dolîdangê,

Xortê malê zavangê,

Pîra malê qurbangê.”

Şêx û pîr siba cejnê li nava gund digerin, gîhê berhev dikin. Dibêjin ew taştiya hespê Xidirnebî ye. Cejna Xidirnebî, mîna hemû cejnên kurdan, bi stran û dîlan, bi kêf, henek û şabûnê ve tijî ye. Wê rojê gişk ji dil şa dibin, derd û kulên xwe, xeydandin û dilmayînen xwe ji bîra dikin. <sup>17</sup>

# PÛŞKÎN

Suleyman Demîr

Aleksandr Sergeyevîç Pûşkin li Moskova hatiye dinê û di nav salên 1799-1837-an de jiyayê. Bapîrê wî Îbrahîm Hanîbal bi eslê xwe reşikekî Afrîkî ye. Di dema xwe de xizmetkarê Çarê Rusan Peterê Mezin bû. Malbata Pûşkin di dema wî de malbateke esîlzade, halxweş û di nav der û dora Qesrê de bû. Tê gotin ku Pûşkin ji hêla dê de Afrîkî ye. Lê Pûşkin esmer û porxelek bû.

Pûşkin xwendina xwe ya lîse li Çarskoye Selo, li dibistaneka ku zaroyên serdestan diçûnê, kiriye. (Ew der bajarekî nêzî Petersburgê ye û îro navê wir Pûşkin e.) Jiyana Pûşkin a evîndarî jî bi bahoz bû. Wê demê bû Pûşkin dil ketibû Yekatarîna Andreyevna Karamazîna. Ew û mêrê xwe wê demê li wir lêkolîner bûn. Pûşkin wê demê 17 salî bû, Karamazîna 36 salî bû. Wê jî ji Pûşkin hez kiribû. Pûşkin heta mirinê ew di dilê xwe de hilandibû.

Pûşkin di temenê xortaniyê de, demekê li Petersburgê jiyaneke xortaniya beradayî jiyaye. Lê ew demeke kin e, Pûşkin di salên xortaniya xwe de dibe xwediye ramanên pêşverû û zû, ne dereng, jiyana xwe ya nivîskarî jî li ser bingehekî pêşverû, li cîyekî bilind ava dike. Pêwendiyên wî bi dekabristan re jî çêdibin û dibe şoreşger, dixwestin Çar bixin û komarekê ava bikin. Di berhemên xwe de êrîşan dibe ser Qesrê û diktatoriya Çar. Loma jî pirr zû bala polîsan kişandiye ser xwe. Sala 1820-an wî nefî jêra welêt dikin. Lê ji ber ciwanbûna wî û pêwendiyên malbata wî bi Qesrê re, wî tînin di qesra malbata wî Michaylovskoye de wek zîndanî qebûl dikin. Du salan nikarîbû ji malê derketa. Ji ber vê yekê nikarîbû beşdarî serhildanên wê demê bibûya.

Dûre Çar Nikolayê I. wî dibe ba xwe, wî dike dîroknaş fermî ye Qesrê û karê sansura nivîsên wî jî ew bi xwe dike. Di wê hevdûdîtîne de Çar jê daxwaz dike ku şerê Qesrê neke. Lê Pûşkin xwe nade ber tu bazarên li ser baweriya xwe û di rûyê wî de dibêje heger ez dema serhildanan li Petersburgê bûma, ez ê beşdar bibûma. Çar dibêje xuyaya ku ez bi wî Rûsê herî bîaqil re diaxivim. Li gor lêkolîneran, Pûşkin bi rastî jî pirr bi aqil bû. Ji berhemên wî jî xuyaye.

Jiyana Pûşkin a bi dûre, bi pirranî li Qesrê derbas dibe. Wê demê çend caran evîndar





dibe. Jinên spehî dora wî digirin û wî dikişînin nav jiyana sosyetê. Di sala 1831'ê de bi jineke bi spehîbûna xwe navdar re dizewice: Natalia Gonçarova Nikolayevna. Natalia ji Moskovayê bû lê zû fêrî jiyana Qesra Petersburg dibe û dikeve nav sosyetê. Gotin di derheqa wê û xelkê de derdikevin û digerin. Pûşkin pîrr bi vê yekê diêşe. Yek ji wanên ku navê Natalia pê re derdikeve George Charles d'Anthés bû. d'Anthés serbazekî monarşîst yê Fransî bû, dema şoreşa 1830 reviyabû Rusya. Ji sala 1834-an pê de bûbû yek ji Serbazên Yekîna Parastina Çar û Qesrê. Pûşkin roja 10-ê sibata 1837-an duello bi d'Anthés re dike û ji zikê xwe birîndar dibe. Piştî du rojan ji ber birîna xwe dimire. Pûşkîn rojeke îne, saet

2.45-an, 37 salî mir.

Natalia piştî mirina Pûşkin heft salan şînê dikişîne û nazewice. Ji heftê carekê diçe dêrê, jê re due dike û diçe ser gorra wî. Piştî heft salan yekî din dike, lê vê vatiniya li hember Pûşkin her didomîne.

Kuştina wî, xemgîniyeke mezin dabû xelkê Rûs û ronakbîrên wê demê. Gelek lêkolînerên edebiyatê, dibêjin ku ew duello komplo bû, Natalîa ji Pûşkin hez dikir, her tişt ji bo ku karibin wî bikujin, plankirî bûn.

Yek ji ronakbîrên wê demê, helbestvan Michail Lermantov pîrr li ser kuştina Pûşkin sekiniye û xeyidiye, ji bo ku cezayekî giran nedane d'Anthés, dewlet hişk rexne kiriye. M. Lermantov ji ber kirinên xwe yên di vê derheqê de nefî Kafkasya dibe. Piştî kuştina Pûşkin bi çar salan, ew jî di duello de li wir tê kuştin. Mayakovskî jî ji bo herdûyan nivîsiye û giriyyaye. M. Lermantov di helbesta ku ji bo Pûşkin bi navê "Kuştina Yê Helbestvan" nivîsîbû de wilo dibêje:

Yê helbestvan -girtiyê rûmetê- şehîd ket  
bû qûrbanek ji bo paşgotinên stemkar,

...

Hat kuştin... ma hêstir alîkariya çî dikin?

...

Ecêb e?.. Wek bi hezaran kesên din  
yê qatil jî hatibû li ba me bi cî û war bibû  
û li risqê xwe gerriyabû û xweş jiyabû-  
yekî biyanî ku li Rûsya bi cî û war bibû.

Û wî welatê me rezîl kir  
mala xwe a nû, ziman û adet hemû  
wî bi şerefa me û rûmeta me lîst  
û ew di bêhtengiyê de têngihişt  
bê destê xwe li çî bilind kiribû!..

Pûşkin him helbest nivîsîne û him jî nivîsa rast. Lê bi piranî wek helbestvan tê nasîn. Pûşkin wek avakirê zimanê Rusî yê lîteratûra hemdem û hostayê helbestvaniya Rusan tê qebûlkirin. Xwendina berhemên wî, xweşiyêke lîrîkî a bêhempa dide mirovan. Berhema wî ya navdar a bi navê Yevgeni Onegin e. Mixabin, ji Pûşkin bi tenê "Keça Kapîtan" bi Kurdî heye.

Pûşkin ji ber serketinên xwe yên di helbestvaniyê de, bûye navekî tu caran neyê jîbîrakin. Heykelên wî li çar aliyên Rusya hene û li çar aliyên dinê hîna jî xwediyê rûmetêke bilind e. Dibêjin ku kîjan Rûsê/Rûsa ku heta lîse didibistan xwendiyê, vê çarîne ji Pûşkin di-

zane:

Tê bîra min ew dema bêhempa  
Ku tu derketibû pêşberî min  
Wek xeyaleke firok  
Ew spehîbûna wek deha te bêkêmesî.

Helbesta bi navê Kleopatra û evîndarên wê, Nazim Hikmet sala 1937-an bi munasebeta sedsaliya kuştina wî wergerandibû Tirkî. Min ji wê wergera Tirkî wergerandiye Kurdî. Wergerandina helbestan ne hêsan e. Dibe ku hinek şaşî jî bûbin. Lêborîna xwe dixwazim.

Bi bawerîya min kalîteya helbestê ji hêla lîrikî de gelekî bilind e. Loma jî min ji xwendevanên Kurd re bi kêfxweşiyê mezin wergerand Kurdî.

## KLEOPATRA Û EVÎNDARÊN WÊ

Qesrê diçirîsand. Dengbêjan bi hevdû re  
Kilam digotin di ber filavta û ribabê re.  
Banûyê bi deng û awirên xwe  
Xweşî dida bezma nuwaze.  
Xwestina dilan diçû bi aliyê textê wê de.  
Lê, li ber tasa zêrîn, WÊ, ji nîşkê de  
Serê bi mucize ji ser milên xwe  
Bi xemgînî daliqand ber xwe  
Û ket nav mitalên kûr û giran.

Û, êdî wek ku ew bezma nûwaze di xewê re diçû,  
Mêvan bêdeng bibûn, deng ji dengbêjan dernediket,  
lebat di wan tunebû.  
Lê WÊ, serê ku berdabû ber xwe, dîsa hilda.  
Rohnî ji rûyê xwe dida û dest bi gotina xwe kir:  
“Dilgeşîya wê, di evîndariya min de ye.  
Li min guhdar bikin, heger ez bixwazim  
Hûn dikarin bibin bedena min.  
Kî tê bazara evîndariyê, kî?  
Ez evîna xwe difiroşim.  
Bi jiyana xwe, şeveke min  
Kî dikirre di nav we de, bêjin min?”

Bêdengiyê û tirsê girt ser hemû kesan,  
Kizîni dihat ji ber wê şewetê ji dilan.

EWÊ, bi mirûsê tirş û bêtirs  
Guhdar dikir li pist-pista şaşbûna wan  
Û awirên ku ew biçûk diditin  
Hêdî hêdî li ser wan digerlandin.  
Tavilê bi derketina yekî, kom qelişî  
Bi dû wî re, duduyên din derketin.  
Bê şik bûn, çirûsk ji çavên wan diçûn.  
Banû derket pêşiya wan, bi vî awayî  
Kirrîn û firotin qediya: sê şev hatin kirrîn.  
Oda mirinê bû, jê û pê de, tiştê li bende wan.

Îcar remildarên pîrozwer  
Li ber mêvanên matmayî  
Ji tasa bêoxir, yek bi yek,  
Dora wan eşkere dikirin.  
Ê yekem, Flavius bû,  
ji yekîna Roma a dawî  
Leşkerê helî şerker bû.  
Dikarîbû wî har bike wilo  
Ew agirê ku jinek bide.  
Qebûl kiribû şerê ku xweşiyê jê dixwest  
Wek dema di rojên şerên giran de  
Dibeziya hember neyarên xwe.  
Ê duyem, Kriton bû,  
Dadgerekî ciwan bû  
Ji gulîstana Epîkur bû.  
Helbestvan û ezîzê giravan  
Li Kharite`yan, Kibris û Amûr bû.  
Ê sêyem, wek guleke buharê nû vebûbû  
Dil bijiyar wî, çav bi dîtina wî kêfxweş dibûn.  
Nav û dengê salan pê neketibû, ne navdar bû.  
Siya çend tayên simbelan  
Nû daketibû ser lêvên wî.  
Qeweta nûhatî di dilê ciwan de

Dikeliya bi azweriya mêranî.  
Çîrûskên xiroşiyê ji çavên wî diçûn.  
Banûya bi qapan, awirên xemgîn  
Li ser wî rawestandin.  
-Ez sond dixum... Ey kaniya kêfê,  
Ez ê bi awayekî ku te hîna nediye  
Heta sibê ji te re xizmetê bikim  
Wek cêriyeke ji bo firotinê  
Ez ê dakevim oda azweriyê.  
Li min guhdar bik, xurtê ji Qibris,  
Û hûn jî hukumdarên bin erdê,  
Ey xwedayên Ayda bi xezeb,  
Ez sond dixum, ewên ku bèn  
Li xwestinên min hukum bikin  
Ez ê heta ku şev be destê sibe  
Wana di xweşiyê de bihêlim  
Û bi hunerên evîndariya nedîtî  
Westaneke giran bidin wan.  
Lê, dema tîrêjên roja sor  
Di berbanga nemir de derketin  
Ez sond dixum, wê bivirê mirinê  
Wan serên bextiyar bigindirîne.”

Û, îcar roj diçû ava,  
Wek kevanekî zêr derketibû hîv.  
Siyeye bêhiş girtibû ser Qesra Skenderiyê.  
Xuşîn bi kaniyan û agir jî bi pêtalan diket  
Buxurê hêdî hêdî bêhn dida vî alî û wî alî...  
Li hêviya fermana xwedayên dinê bû  
Azweriya hênik û şêrîn.  
Di reşaya bêdeng û ewreng de  
Di nav mucîzeyên xwestina dilan de,  
Û di siya perdeyên erguvanî de  
Oda zêrînî diçirîsand...

Wergera ji tirkî: **Suleyman Demîr**

## **Sally Prudhomme**

di 16'ê adara 1839'an de li Parîsê hatiye dinyayê. Bavê wî di salên xwe yên ciwan de dimire û Sully Prudhomme didine xwendin. Ew dîploma xwe li Parîsê digire, çend salan di şîrketeke îndustriyê de dixebite û berî ku berhema xwe ya navdar "Stances et Poèmes" binivîsîne, ew li Parîsê hiqûqê dixwîne. Di sala 1881'ê de dibe endamê Akademiya Fransayê û di sala 1901'ê de di warê edebiyatê de Xelata Nobelê ya pêşî digire.



**Xelatgirê Nobelê yê pêşî Sally Prudhomme**

# YÊ MEKSÎKÎ

Jack LONDON

Tu kesî çîroka wî nizanîbû. Tew endamên Juntayê bi yekcarî nizanîbûn bê ew çî kes e. Ew "sirra wan î piçûk" û "welatperwerê wan î mezin" bû. Û ew ji bo şoreşa Meksîkayê ya ku nêzik dibû, li gor hêza xwe, bi qasî wan bi xîretî xebitîbû. Heta ku ew bi vê yekê hesiyan, gelek wext derbas bûbû. Ji ber ku di nav Juntayê de, tu kesî jê hez nedikir. Wê roja ku ew kete hundurê lokala qelabalix û bite-qûreq ya rêxistinê, hemûyan şika ku ew ji terefê ajanên Díaz ve hatiye kîrîn, jê kiribûn. Gelek heval di girtîgehên sîvil û leşkerî yên Dewletên Yekbûyî de bûn û yên din jî ji bo ku li ber dîwarekî tûxla bên gulebaran kirin, bi destkelepçekî derbasî aliyê din yê sînor dikirin.

Lêwîk di çavpêketina cara yekem de, tu întîbayeke pozîtîv li ser wan nehiştîbû. Ew xort bû û temenê(emrê) wî, ji hijdeh salan ne zêdetir bû. Li gor temenê xwe jî pîrr girs xuya nedikir. Wî navê xwe wek Felipe Rivera dabû nas kirin û gotibû ku ew dixwaze ji bo şoreşê bixebite. Hemû ewqas bû; ne peyveke zêde û ne tu îzahatên din... Ew li ser piya bû û dipa. Ne di lêvên wî de tu bişîrandîn û ne jî di çavên wî de tu nerîneke dostane hebû. Paulino Vera yê bertewîl jî dema ku li lêwîk niherîbû, di hundurê xwe de ji nişka ve ricifandinek hîs kiribû.

Li vê derê mexlûqek ku sawek dixist dilê mirov û nedihat fahm kirin, hebû. Di çavên lêwîk yên reş de, nerînek wek nerîna marê bijahr hebû. Ev çav bi neyarîyeke kûr û konsantrekirî wek agirekî sar diçûrisandin. Wî çavên xwe ji ser bihevresûndxwaran dagerand û berê xwe da xanima Sethby ya ku daktîlo bi kar tanî. Çavên wî sanîyeyekê li ser wê ma. Dema çavên wan li hev ketin, xanima Sethby dest û lingên xwe li hevdû geriyayî hîs kir. Bi jinikê re hîseke ecêb û xerîb ya ku bû sebeba qutkirina karê wê jî peyda bû. Jinikê ji bo berdewamkirina nivîsandina nameya xwe, çend rêz ji nû ve xwendin.

Paulino Vera bi çavên tijepirs li Arrelano û Ramos nihêrî. Wan jî bi eynî awayî hem li wî û hem jî li hevdû nihêrîn. Ji çavên wan şik û bêqerarbûna wan dihat xwendin. Di vî xortê tenik û zirav de, hemû talûkeyên ku ji nenasîyê dihatin, xuya dibûn. Ew, nenasî bi xwe bû. Ew, yekî ku ji terefê şoreşgerên durust yên ku ji Díaz û zalimtiya Díaz nefreteke bêhed û hudûd ( tenê nefreteke durust ya welathezan) dikirin ve nikarîbû bihata fahm kirin. Ew, tîşteki ku aqilê wan nedigîhaştê, bû.

Vera yê ku ji hemûyan jîrtir û bileztir bû, bi dengêki sar got:

- Baş e. Tu dibêji ku ez dixwazim ji bo

şoreşê bixebitim. Çakêtê xwe ji xwe bike û li wê derê daliqîne. Ka bi min re were, ez ê cihê paçik û satilê nîşanî te bidim. Erd gemarî ye. Tu dê berê vê derê paqij bikî û dû re odeyên din. Divê gemar bê avêtin û paşê dora paqijkirina pencereyan tê.

Lêwik pirsî:

- Ma ev ji bo xatirê şoreşê ye?

Vera bersiv da:

- Belê, ev ji bo xatirê şoreşê ye.

Rivera bi nerînên bişuphe li wan kesên ku li odeyê bûn nihêrî û dû re çakêtê xwe ji xwe kir û got:

- weha be, baş e.

Û hemû ev bû. Êdî her roj dihat karê xwe; erd dimalt, firçe dikir, paqij dikir; ariya sobeyan vala dikir, êzing û komir tanî û berî ku yê wan î herî jêhatî bihata û li ber maseya xwe ya nivîsandinê rûnişt, sobe ji pêdixist.

Wî rojekê weha pirsibû:

- Ma gelo destûr heye ku ez li vê derê razêm?

Ihî! Mesele ev bû, va tiliya Díaz xuya bû. Razana li odeya Juntayê dihat maneya bidestxistinê sirrên rêxistinê, listeyên navan û navnîşanên hevalên ku li Meksîkayê dimînin. Ev daxwaza wî nehat qebûl kirin û Rîvera careke din jî behsa vê meseleyê nekir. Wan pê nizanibûn bê lawik li ku radiza û dixwar. Rojekê Arrellano çend dollar dirêjî wî kiribû. Lê wî serê xwe hejandibû û pere qebûl nekiribû. Dema ku Vera mudaxele kiribû û ji bo qebûlkirina pereyan zor dabûy jî wî weha gotibû:

-Ez ji bo şoreşê dixebitim.

Ji bo destpêkirina şoreşekê, pere lazim bû

û Junta jî di vî warî de hertim di tengasiyê de bû. Endamên Junta birçî bûn û heta ku taqet di wan de hebû dixebitûn. Lê dîsa jî gelek caran, biserketin û nebiserketina şoreşê bi peydekirina çend dollaran ve girêdayî bû. Rojekê dema ku wan kirêya du mehnan nedabûn û xwediyê xênî ew bi jixênîderxistinê tehdît kiribû, yê ku şêst dollarê zêrîn danibû ser maseya May Sethby, lawikê paqijker Felipe Rivera yê ku kincên erzan û riziwayî lê bû. Li ser maseya May Sethby, sê sed nameyên bi daktîloya ku rawestandîna lê tunebû, hatibû nivîsandin, (daxwazên alîkariyê; daxwaza selahiyeta ji grûpên karkeran yê organîzekirî; ji bo di beşa nûçeyan de muameleyeke adil, daxwaziye ji redaksiyonên rojnameyan; Protestoyên li dijî wê muameleya zalim ya ku dadgehên Dewletên Yekbûyî bi şoreşgeran re dike) nepostekirî li bende pûlan sekinibûn. Saeta Vera ya zêrî kevn ku ji bavê wî mabû, hatibû firotin. Hungulîska zêr a bêdesen ya May Sethby jî bi wî awayî çûbû. Rewş bê hêvî xuya dikir. Ramos û Arrellano simbelên xwe yê dirêj ji bêçaretiyê ba didan. Name diviyabû bihata şandin û daîreya posteyê jî pûl bi deyn nedidan. Wê gavê Rîvera şepçeyê xwe da serê xwe û derket derve. Dema ku ew vegeheriya hezar pûlên dusetî danî ser maseya May Sethby.

Vera ji hevalên xwe re got:

- Ez meraq dikim, gelo ev ne zêrên Díaz yê lanetlêhatî bin?

Eniyên xwe qermiçandin û fikirîn, lê nizanibûn bê ewê li çi bifikiriyana. Û bi vî awayî Felipe Rivera, ew lawikê ku ji bo şoreşê erd paqij dikir, dema lazim dibû, ji bo



şoreşê dana pereyên zêr û zîvî her berde-  
wam kir.

Dilên wan hê jî lê venebûbû. Wan ew  
nas nedikirin. Rêyên wan ne yek bû. Wî tu  
bauerî nedabû. Firseta pirskirinê jî nedida  
tu kesî. Ew pîrr xort bû, lê dîsa jî tu kesî  
newêrbû jê bipirsiya.

Arrelano bi awayeke bêçare got:

- Kî çi dizane, belkî ew kesekî pîrr bi esil  
û rûhekî bi tena serê xwe be. Ez nizanîm,  
nizanîm.

Ramos:

- Ew ne wek mirovên din e.

May Sethby:

- Ruhê wî pîrr zuha ye. Ji bo wî tu ta'ma  
jîyanê nemaye. Ew wek termekî ye, lê dîsa  
jî bi qasî ku mirov lê ecêbmayî bimîne, li  
ser xwe ye.

Vera:

- Ew ji dojhê derketiye. Kesên ku li do-  
jehê nemabin, nikarin weha bin û tew hîn  
zarok e.

Lê tev vê jî tu kesî nikaribû jê hez bikira.  
Ew tu carî ne dipeyivî, nedipirsî û tu pêşni-  
yar-mêşniyar jî nedikir. Ew bi rûyê xwe yê  
ku tu mane tê de xuya nedibû, li wir dise-  
kinî û guhdarî dikir. Dema ku ew di der-  
heqa şoreşê bi dengê bilind û bi heraret  
dipeyivîn, Rîvera jî ji bilî çavên xwê yên ku  
agirekî sar jê diçû, mîna miriyekî xuya di-  
kir. Çavên wî yên wek metqebek ji qeşayê  
tûj ku mirov diheyirand û dixist nava endî-  
şeyê, ji rûyekî diçû ser rûyekî din û ji gotar-  
vanekî diçû ser gotarvanekî din.

Vera bi bawerî ji May Sethby re got:

- Ew ne ajan e. Ew welathezek e. Tu şup-  
heya min ji vêya tune. Tiştê ku ez dibê-

jîm, bila bê bîra te; ew ji me hemûyan bêtir  
welathez e. Ez vê dizanim, di dilê xwe de û  
di mejiyê xwe de hîs dikim. Lê ez wî qet  
nas nakim.

May Sethby:

- Mîzaceke wî ya pîrr ters heye.

Vera ricifî û got:

- Ez dizanim. Wî bi wan çavan li min ni-  
hêrî... Ew çav, ne çavên hezkirinê ne, mi-  
rov tehdît dikin, wek pilingekî dirinde di-  
nihêrin. Ez dizanim ku ez bi vê daweyê re  
îxanetê bikim, ew ê bêşik min bikuje. Dilê  
wî tune. Ew wek polayê bêmerhamet û  
hişk û wek seqemê sert û sar e. Ew wek ta-  
va heyva şeveke sar ya zivistanî ku mirov li  
serê çiyayekî xalî ji sermayê diqefile, ye. Ez  
ne ji Dîaz û ne jî ji hemû qatîlên wan ditir-  
sim. Lê ev lawîk, ez ji vî lawîkî ditirsim. Ne  
henek e, ez bi rastî jê ditirsim. Ew wek ne-  
fesa mirinê ye.

Di gel vê jî yê ku ji bo ceribandina bawerî  
û dilsoziya Rîvera ya di kar de, yên din  
îkna kir, Vera bû. Wê demê xeta komunî-  
kasyonê ya di navbera Los Angelesê û Kalî-  
forniyaya Jêrîn de hebû, hatibû birîn. Sê  
hevrayên wan di kozikên ku wan bi xwe  
kola bûn de, hatibûn gulebarankirin û ko-  
zikên wan bûbûn mezelên wan. Du hevra-  
yên wan jî li Los Angelesê, girtiyên Dewle-  
tên Yekbûyî bûn. Şêfê Federasyonê, Juan  
Alvarado yê ku şoreşger bi xwîndê der diki-  
rin, wek wehşekî bû. Hemû planên wan  
eşkere kiribû. Wan li Kalîforniyaya Jêrîn  
nema dikaribû, bi şoreşgerên aktîv û bi  
dilxwazên xwe yên ku nuh ketibûn nav rê-  
xistinê re têkiliyan deynin. Ev wezîfe dan  
Rîverayê xort û ew ber bi başûr ve şandin.

Gava ew vegeriya, xet hatibû çêkirin û Juan Alvarado hatibû kuştin. Juan Alvarado di nav nivînê xwe de, bi kêreke ku heta ber destiyê wê di sînga wî de çikyayî hatibû dîtin. Vêya ji dervayî wezîfeya Rîvera bû, lê endamên Juntayê dizanîbûn bê di demên weha de, ew çawa bi lez bû. Wan tu tişt ji wî ne pirsîn û wî ji wan re tu tişt ne got. Lê wan li hevdu nihêrîn û ev ji çavên wî xwendin.

Vera:

-Min ji we re gotibû. Díaz divê ji zilamekî kal bêtir, ji vî xortî bitirse. Emana wî tune. Ew destê xwedê ye.

Ew şexsiyeta ku mirov ji ber nikarîbû tehamul bikira ya ku May Sethby behsa wê dikir û ji çavên tu kesî nereviyabû, bi vî awayî derketibû ortê.

Rîvera carna lêvçiryayî, hinarikên rûyê wî şînbûyî an jî bi guhekî werimî dihat. Pîrr eşkere bû ku ev birîn, encamê pevçûna wî ya li wê devera ku lê radiza û dixwar, pere qezenc dikir û li wê dinyaya gelek karên ku endamên rêxistinê pênizanîbûn dikir, bû. Piştî demekê, Rîvera di rojnameya şoreşger ya ku ji hefteyê carekê derdiket de, dest bi karê tîpografîyê kir. Carinan weha dibû ku wî nikarîbû tîp rêz bikira. Tiliyên wî yên girdikê û destên wî ewqas eciqî û êşiyayî bûn ku wî nikarîbû wan tev bilivand. Milekî wî bi kêleka wî ve daliqiyayî bû û rûyê wî jî ji ber êşeke ku nayê gotin deforme bûbû.

Arrellano got:

-Tu ji min bipirsî; ev serseriyekî dera hanê ye.

Ramos:

-Ew diçe deverên xerab.

Vera pirsî:

-Baş e, lê gelo ew pera ji ku peyde dike? Li min binihêrin, li gor ku min nuh bihîst; wî hîn îro ji bo heqê kaxizên rojnameyê sed û çil dollar daye.

May Sethby:

-Û dî re awayê wî yê wendabûnê. Ew tu carî behsa ku ew bi ku de diçe, nake.

Ramos pêşniyarek avêt ortê:

-Em divê yekî bi dî wî de bişînin.

Vera:

-Ez tu carî naxwazim, di şûna wî kesê ku dê wî taqîb bike de bim. Ez ditirsim ku ji dervayî dema ku hûn min têxin mezel, hûn dê tu carê din nikarîbin rûyê min bibînin. Mirov xofê ji vî lawikî digre. Ew dê tu carî destûra ku xwedê di nava wî û hedefa xezeba wî keve, nede.

Ramos li xwe mikur hat û got:

-Ez çî derewa bikim, ez xwe li hember wî wek zarokêkî dibînim.

Arrellano:

-Ez ji we re tişteki bibêjim; ji bo min, ew îrade û quwet bi xwe ye. Ew dehbeyek e; gurê dirinde ye; marê mirdarok e; dûpişkê ku bi mirov vedide ye.

Vera:

-Ew di şexs de muşaxesbûna şoreşê ye. Rûh û agirê şoreşê ye. Ew daxwazeke heyfa bêpîvan ya ku bi bédengî lê dixê ye. Ew milyaketê wêrankirinê yê ku di bédengiya şevê de difire ye.

May Sethby bi dilovaniyeke mezin got:

-Dilê min bi wî dişewite. Kes tu nêzîkbûnê nişanî wî nade. Ew ji herkesî nefret dike. Ew me tercîh dike, ji ber ku em û ew

ji bo yek armancê dixebitin. Ew bi tena serê xwe ye... tîkî tenê.

May Sethby kelogirî bû, dengê wê hate birîn û hêsir ketin çavên wê. Awayê jiyana Rîvera û wextên wî yên çûyin û hatinê, bi temamî nihênî bûn. Carinan hefteyek derbas dibû jî wan rûyê wî nedidîtin. Carekê ew mehekê xuya nebûbû. Lê gava ew vedigeriya, bêî ku tu peyv ji devê wî derketa, pereyên zêr datanî ser maseya May Sethby. Carinan jî bi rojan, bi hefteyan li ba Juntayê dima. Lê di wan deman de jî di saetên cîhê de diçû derve. Ji serê sibehê heta derengê şevê, li ortê xuya nedibû. Şevêkê Arrellando wî bi destên werimî û bi lêva çiriyayî ya ku hîn jî xwîn jê dihat, ditibû. Ew wê gavê li çapxaneyê dixebitî.

## II

Dem hatibû. Qedera şoreşê bi Juntayê ve hatibû girêdan. Lê Junta bi xwe, di rewşeke zor de bû. Ihtiyaca wan ya ji pereyan jî her wextê bêtir bû. Lê peydekirina pereyan jî ji her wextê zortir bû. Welathezan senta xwe ya herî dawî jî dabûn û êdî tu tiştê ku wan bikariba bidana, nemabû. Grûpên karkerên çandiniyê- karkerên rojê yên ku ji Meksîkayê hatibûn- nêviyê wê piçîka heqê xwe yê rojane didan şoreşê. Lê vêya têr nedikir û ihtiyacî bi pereyên zêdetir hebû. Ew xebata dijwar ku bi salan dihate meşandin, tu nema bû ku ber bida. Dem stewyayî bû. Ji şoreşê retu nemabû. Dehfdaneke talî ber bi pêş de, hewildaneke bi mêrxasî... û dû re milê nişanderê dê serkevtin nişan bida. Wan Meksîkaya xwe baş nas dikirin. Piştî ku şoreş dest pê bikira, êdî dê bi xwe belav

biba. Hemû sistema Dîaz dê wek qesra jî kaxizan bi erdê re bûbûya yek. Herêmên nêzîkî sînor ji bo serîhildanê amade bûn. Yankiyek bi sed zilamên ji dil, ji bo derbasî aliye din yê hudûd bibin û Kalifornîyaya Jêrîn îstîla bikin amade bûn. Lê pêwîstiya wî bi tivingan hebû. Têkiliyên Juntayê li her deverê welêt, heta bi Atlantîkê bi gelek mirovan re hebû û pêwîstiya hemûyan bi sîlehan hebû. Maceraperest, leşker, keleş, karkerên Amerîkayê, sosyalîst, anarşîst, şer- kir, penaberên Meksîkî, karkerên çandiniyê yên ku ji ber esaretê reviyabûn, karkerên madenê yên ku li Coeur d'Alene û Colorado di îşkencexaneyan re derbas bûbûn û bi daxwaza tolwergirtinê dikelin... Bi kurtî hemû kesên ji binê civakê û hemû elemanên tevlihev yên dinya hevçax li bende sîleh û cepxaneyan bûn û hemûyan bang dikirin:

-Tiving û cepxane, cepxane û tiving!

Ger ev koma mirovên ku bi hîsên tolwergirtinê dikelin û difûrin, hudûd derbas bikin, tê wê maneya ku şoreşê dest pê kiriyê. Berê wê deriyên bakur yên sînor û avahiya gumrukê tîketa destên wan. Dîaz nikaribû li hember vêya rawestiya. Dîaz dê cesaret nekira û ordiyên xwe neşanda ser wan. Ji ber ku wê mecbûrî paraziina hêla başûr bûba. Lê tev hemû tiştî jî agirê şoreşê dê ji başûr belav biba. Gel dê serî hilda. Dê bajar bi dû bajar, sîlehên xwe danîna û hemû eyalet yek bi yek biketana û ala teslîmiyê rakirana. Û di talîyê de, ordiyên qehreman yên şoreşê dê ji herçar aliyan êrîştî keleha Dîazî herî talî, bajarê Meksîkoyê bikirana.

Lê kar bi pereyan diqediya. Mirovên wan yên ji dil û bi hewes yên ku tiving bi kar bianîna hebûn. Wan tucarên ku dê sîleh bifrota û teslîmî wan bikira jî nas dikirin. Lê xebata amadekirina şoreşê hemû îmkânên Juntayê daqurtandibû. Dollarê herî dawî hatibû xerc kirin, îmkana herî talî hatibû bikaranîn û welathezê herî dawî yê birçî jî zuha bûbû. Lê şoreş li ber devê derî bû. Sîlah û cepxane! Diviyabû ku ordiyên gel çekdar bibûya. Lê çawa? Erdên Ramos yên ku dest danîbûn ser, dihate bîra wî. Arrellano ji ziyankerîya ku di xortaniya xwe de kiribû, sixêf dikir. May Sethby bi pirsra ku ger Junta hebekî destê xwe bigirta, gelo dê rewş ne guhertî ba, meşgûl bû.

Paulino Vera:

- bifikirin, azadiya Meksîkayê bi çend dollarên pîsik ve girêdayî ye, bifikirin!

Bêçaretîyekê xwe bera ser rûyê hemûyan dabû. Hêviya wan a dawî, mirovê ku wan ê bikarîba berê xwe bidayê, Jose Amarillo yê ku soza pereyan dabû wan jî li Chihuahua yê, li mala xwe hatibû girtin û li ber dîwarê govê gulebaran bûbû. Wê gavê Rîverayê ku milên xwe yên vemaltî di ava qirêjî de dakiribû û erd paqij dikir, firçe sekinand, serê xwe rakir û pirsî:

- Ma pênc hezar têr dike?

Hemûyan bi şaşmayî li hevdû nihêrîn. Vera xwezîya xwe daqurtand û di maneya "erê" de, serê xwe hejand. Ew nema dikarîbû bipreyîviya. Lê hîsa bawerîyekê xurt ketîbû hundurê wî.

Rîvera got:

- Wê gavê sîparîşa sîlehan bidin.

Û dû re axaftina xwe ya herî dirêj ya ku

heta wê rojê tu carî nehatibû kirin, kir:

- Wext pîrr teng e. Di hundurê sê hefteyan de, ez dê pênc hezaran ji we re bînim. Heta wê gavê hewa jî hêdî hêdî germ dibe. Ji xwe ez nikarim hîn zûtir peyde bikim.

Vera bi hîsa bawerîya xwe ya ku ji ber vê yekê çêbûbû re şer dikir. Mirov nikare bawer bike! Ji wê roja ku ketê nav şoreşê û heta nuha, gelek hêviyên giranbiha wenda bûbûn. Wî bawerîya xwe bi vî lawîkê paqijkerê şoreşê tanî, lê ev mesele nediket serê wî û ji ber vê jî newêrîbû bi rastî bawer bike.

Vera got:

- Tu dîn e!

Rîvera:

- Piştî sê hefteyan. Sîparîşa tivingan bidin.

Rîvera rabû ser xwe, milên xwe yên vemaltî rast kir, çakêtê xwe li xwe kir û got:

- Hûn sîparîşê bidin. Ez nuha diçim.

### III

Piştî bazdana bi vir de û wê de, pevçûn, liberhevdan û xeberdanên bi telefonan, bi şev li buroya Kelly civînek hat çêkirin. Karê Kelly pîrr bû. Wextê wî yê ku serê xwe bixuranda jî tunebû. Ew xemgîn bû, kêfa wî ne lê bû. Wî ji bo maçeke boksê bi Bill Carthey re, Danny Ward ji New Yorkê anîbû. Ji roja maçe re, bi tenê sê hefte mabûn. Lê karê wî rast nemeşiyabû û Billy Carthey birîndar bûbû. Birîna wî giran bû. Ev du rojên wî ne, di nav nivîna de bû û xwe ji hemû nûçegehînanê sporê veşartibû. Tu kesê ku têketa cîhê wî tunebû. Kelly bêî rawestîn, telegraf da hemû kesên ku di sîk-

leta sivik de hatin bîra wî, lê yek ji wan jî ne vala bû û bi kontraktên xwe ve girêdayî bûn. Hêvî nuha ji nû ve diçûrisî. Tam nediket serê wî, lê qels bûya jî hêviyek xuya dibû. Dema ku hatin hember hevdû, Kelly li Rîvera nihêrî û paşê got:

- Ez bala xwe didimê ku tu pirr cesûr î.

Çavên Rîvera bi nefreteke bi jahr dibirigandin, lê tu guhartin tê de çênebû û bi tenê weha got:

- Ez dikarim zora Ward bibim.

- Tu vê çawa dizanî? Te ew di dema maçê de tu carî dîtîyî?

Rîvera serê xwe di maneya” na “de kil kir.

Kelly got:

- Ew dikare bi çavgirî û bi destekî zora te bibe.

Rîvera milên xwe hejand. Kelly bi awakî sert jê pirsî:

- Ma hemû tiştên ku tu ê bibêjî, ev in?

Rîvera:

- Ez dikarim zora wî bibim.

Li ser vê, Michael Kelly weha got:

- Ez meraq dikim, gelo tu dikarî zora tu kesî bibî?

Michael birayê tertîpkarê maçên boksê bû û buroya bişertlîstinê ya ku navê wê “Yellowstone” bû, bi rê ve dibir. Wî li wê derê, jî bişertlîstina li ser boksê gelek pere qezenc kiribû. Rîvera jî dêlva bersivê, bi awirê sert û tijenefret li wî nihêrî. Sekreterê tertîpkar mirovekî xort û tîpekî sportmen bû. Ew bi qerf keniya.

Kelly bi axaftina xwe, ew hewa nedostane belav kir:

- Ka bisekine, tu Roberts nas dikî. Min

şand pê wî, ew divê nuha li vir bûya. Rûne û li bende wî be. Tu ji min bipirsî; tu şensa te ya biserketinê tuneye. Ez nikarim bi maçeke basît, henekê xwe bi temaşevanan bikim. Weke ku hûn jî dizanin, çihên herf nêzîkî rîngê, bi panzdeh dollaran in.

Roberts bi serxweşî ket hundur. Ew yekî zirav, dirêj û zeîf bû. Axaftina wî jî wek meşa wî, sist û bêruh bû.

Kelly raste-rast ket nav meseleyê:

- Guhdarî bike Roberts; tu dipesînî û dibêjî ku min ev zarokê Meksîkî derxistiye ortê. Wek tu dizanî, Carthey milê xwe şikandiye. Îro jî ev lawîkê hanê rabûye, hatiye vîra û bê fedî dibêje ku ew dixwaze têkeve şûna Carthey. Tu ji bo vê çi dibêjî?

Roberts serê xwe hêdî hêdî kil kir û got:

- Ev baş e, Kelly. Ew dikare baş boksê bike.

Kelly bi awayekî hêrsbûyî ji nişka ve got:

- Û dî re belkî tu dê bibêjî ku ew ê zora Ward jî bibe.

Roberts hebekî fikirî:

- Na, ez vê nabêjim. Ward rêviyekî rîngê ye û ew li kê bide, wan li erdê rast dike. Lê ew nikare weha bi hêsanî zora Rîvera bibe. Ez Rîvera nas dikim. Ew ne pariyekî hêsan e. Min tu carî nedîtiye ku ew tirsîya ye. Û hutuka wî ya çepê bi qasî ya rastê sert e. Ew di kîjan pozisyonê de be bila biba, dîsa jî dikare derbên pirr xurt lê bide.

Kelly:

- Ev tiştêkî din e, van bihêle. Ma gelo ew dikare bala temaşevanan bikşîne? Te di hemû jiyana xwe de, boksorên bêhejmar gîhandiyî. Ya rastî, ez serê xwe li ber tiştê ku tu dê bibêjî, ditewînim. Ma ev li hem-

ber pereyên temaşevanan, hêja ye, ne hêja ye?

Roberts:

- Belê ew dikare, çawa nikare! Bila tu şika te jê tunebe ku ew dê baş zorê bide Ward. Tu vî lawikî nasnakî, lê êz nas dikim. Min ew keşif kiriye. Tu pirîskeke tirsê jî pê re tune ye. Ew şeytanek e. Ger tu dixwazî pê bihesî, ew hosteyekî temam e. Ew dê wisa li Ward bixe ku devên we dê vekirî bimîne û ji ber hebûna qabiliyeteke weha ya li vî bajarî, hûn ê giş şaş bimînin. Ez naxwazim, bibêjim ku ew dê zora Ward bibê. Lê ew ê maçeke weha bilîze ku hûn ê bi rastî fahm bikin ku ew stêrkek ber bi bilindbûne ve diçe ye.

Kelly berê xwe da sekreterê xwe û got:

- Temam, baş e, telefonî Ward bike. Min jê re gotibû, ger ez yekî ku îdare bibe, peyde bikim, ez dê bişînim pêy te. Nuha ew li Yellowstoneyê fiyaqê dike.

Kelly dû re vegeriya ser meşqker:

- Ma tu tiştêkî venaxwî?

Roberts gava highballa xwe(wîskiya bi soda)ta'm kir û daqurtand, dest bi axaftine kir:

- Min tu carî ji we re negotiye ku bê min ev lawik çawa keşif kiriye. Ew çend sal berê hatibû salona meşqkirinê. Min Prayne ji bo maça ku wê bi Delaney re bikira, dixebitand. Prayne dîn e. Tu merhamet pê re nîne. Ew li hember hevalên xwe yên antremanê bê însaf bû; ger mirov bihiştta, wî dê ew perçe bikira. Ji ber vê, min tu kesê ku bixwazta bi wî re bixebitiya, nikaribû peyde bikira. Min lê nihêrî ku ev lawikê Meksîkî yê birçî li wê derê sekinî ye. Ez jî di

rewşeke pirr xerab de bûm. Min ew girt, lepik xist destên wî û ew ajot ringê. Ew wek çerm zexm bû, lê zêf bû. Wî di derheqê bingehên destpêkê yên boksê de, tu tişt nizanibû. Prayne ew perîşan kir. Wî xwe li ber du raundên ecêb girt. Dû re, dilê wî ji bîr çû. Lê dilê wî ji birçîna, ji bîr çûbû. Ma lêxistin xwaribû? Off, lêxistineke weha xwaribû ku nedihat naskirin. Min nivollar da wî û zikê wî jî tam tije kir. Dema ku xwarin dixwar, divê we bidîta bê çawa çelçelpa devê wî bû. Ev çend roj bûn ku tu tişt di qirika wî re neçûbû xwarê. Min digot, êdî ew dê nema li van deran xuya bibe. Lê dotira rojê, ew tev devûrûyê xwe yê perîşanbûyî dîsa hat û bi nivollarî û xwarinê ve qayil bû. Her ku diçû, ew baştir dibû. Ew tiştêkî bêhawe zexm e û ji diya xwe boksor ketiye. Tu hîsên wî tunene, wek peçeyekî qeşayê ye. Ji dema ku min ew nas-kiriye û heta nuha, tu carî deh gotin li dû hevdû negotine. Ew tiştê ku divê bê kirin, dike û hem jî pirr baş dike.

Sekreter got:

- Min ew li ba we dîtibû. Ew li ba we pirr xebitî.

Roberts bersiv da:

- Ew bi hemû elemanên min ên herî qenc re xebitiye. Û ew ji wan, gelek tişt fêr bû. Wî dikaribû zora hinekan ji wan bibira. Lê wî ji boksê qet hez nedikir û ev kar, tu carî bi dil û riza xwe, nedikir. Wî Lê weke ku hez dikir, dida xuya kirin.

Kelly got:

- Ger ez ne şaş bim, wî di van mehên dawî de, li klûbên piçûk boks dikir.

Roberts:

- Belê. Lê ez nizanim, bê çi bi wî hatiye. Damarê wî yê boksoriyê rabûye, çi ye. Ew wek firtineyekê derdiket ortê û hemû boksorên mezin yên mehelli, li erdê rast dikirin. Weha xuya bû ku wî dixwast pera qezenc bike û tev ku ev ji kincên wî diyar nabe jî wî gelek pere dan hev. Mirovekî ecêb e. Kes nizane, bê ew çi karî dike. Kes nizane, bê ew wextê xwe çawa û li kî derê derbas dike. Gava ku ew di beşa sporê de jî dixebite, her roj piştî qedandina kar wenda dibe. Ew carinan, çend hefteyan li ser hev xuya nabe. Lê ew guh nade nesîhetan. Zilamê ku menacertiya wî bike, dê serweteke mezin bidest bixe. Lê ew qet li vê nafikire jî. Û divê hûn dilxwaziya wî ya di warê pereyên pîr de, bibîne, wê gavê mirov dikare şertê xwe yê peymanê pê bide qebûl kirin.

Di wê esnayê de Danny Ward ket hundur. Wek sahneyeke tiyatroyê bû. Menacer û meşqerê wî jî pê re bûn. Danny bi nezaket û dostane, wek bayekî ket hundur. Silav li yên dora xwe kir; henekek bi vîya kir, henekek bi wîya kir; li vir nihêrî, li wir nihêrî; bi her kesî re, yek bi yek bişirî. Adeta wî weha bû, di van tevgerên wî de, tenê he-ta dereceyekê samîmiyet hebû. Ew aktorekî baş bû û pê dizanibû ku ji bo mirov bikaribe li vê dinyayê bigihîje derekê, nezaket û xwe şinnekirina bi her awayî, şert e. Lê ew di hundurê xwe de, boksokekî bihesab, xwînsar û tucar bû. Tiştên din, maske bûn. Yên ku wî nas dikirin, an yên ku pê re didan û distendin dizanibûn ku ew bi tenê li menfaeta xwe difikire. Ew di hemû bazariyan de hazir dibû û li gor hinekan jî menajerê wî ji navberkekî pê ve ne tu tiştêk bû;

wî menajerê xwe li ser tilîka xwe direqisand.

Lê rewşa Rîvera bi temamî guherî bû. Di damarên wî de, hem xwîna çermso-ra(indîan) û hem jî ya spanyola digeriya. Wî xwe li quncikekê, bê deng û bê livandin, e dabû erdê. Lê çavên wî yên reş li ser wan yek bi yek digeriyan û bi awayê ku dixwaze bê çi di hundurê wan de heye bixwîne, bala xwe dida hemû tiştan.

Danny got:

- Ne xwe, hezret ev e, ha?

Danny raqîbê xwe, bi çavan pîva û dû re dewam kir:

- Çi heye, çi tune ye, kurikê biçûk?

Çavên Rîvera bû wek du bizotên êgir, lê tu bersiv nedayê. Wî ji hemû biyaniyan, ji hemû Angloamerîkanan nefret dikir. Lê gava çavên wî bi vî zilamî ket, di hundurê xwe de, ji nişka ve nefretek ku her diçû bilind dibû, hîs kir.

Danny bi awakî bi qerf got:

- Hey xwedêyo! Ez hêvî dikim, tê nexwaze ku ez bi yekî kerr û lal re maçê bikim?

Dema pixkînî sekinî, wî dîsa dest pê kir:

- Qey Los Angeles xera bûye ku we çû vîya peyde kir. Gelo we ew ji kîjan zarok-xaneyê aniye?

Roberts Rîvera parazt û got:

- Danny, ji vê bawer be ku ev lawikekî pîr jîr e. Tu weha li nermikbûna wî neni-hêre, ew qet ne nerm e.

Kelly li ber geriya û got:

- Ez heyrana çavên te bim Danny, nêviyê bilêtan hatine frotin. Em çawa bikin, me yekî jê baştir nedît. Tu divê qîma xwe pê bînî, ev ji tunebûnê çêtir e.

Danny dîsa li Rîvera nihêrî, keserek kişand û got:

- Divê ez lê miqate bim da ku bi ew derba yekem re, li erdê rast nebe.

Roberts bi kerb, kir ufe-uf. Menajerê Danny bala wî kişand:

- Tu divê çavên xwe baş veke. Gava mirov bi yekî re cara yekem derdikeve maçê, bi şensa xwe ya baş bawerbûn, têrê nakê. Tu ê lê binihêrî, tevli hertiştî jî belkî ew bikaribe hutukeke bi îsabet biavêje.

Danny bişirî û got:

- Meraqa nekin, ez ê çavên xwe baş vekim. Ez ê bi destpêkê re, hakimiyetê bistînim û dû re, ji bo kêfa temaşevanan, bi wî bilîzim. Ma panzdeh raund bes in, Kelly? Û dû re naqawt(knockout)?

- Ger tu weha bikî ku bişibe rastiyê, bes e.

- Û nuha em ê bên ser bazarê.

Danny bê deng hesab kir.

- Bêguman, wek hesabê me û Carthey; ji sedî şêst û pêncê hatina ne safî. Lê divê parvekirin guhertî be. Ez bi ji sedî heştêyê qayil im.

Dû re vegeriya ser menajerê xwe û got:

- tamam?

Menajer serê xwe, di maneya "erê" de kil kir. Kelly ji Rîvera pirsî:

- Ma te fahm kir?

Rîvera serê xwe kil kir. Kelly dest bi îzahatê kir:

- Mesele weha ye; para boksoran ji sedî şêst û pêncê hatina ne safî ye. Tu yekî ne naskirî ye û ne hatiye ceribandin. Tu û Danny divê vêya li hevdû par ve bikin; para te, ji sedî bîst û ya Danny jî ji sedî heştê

ye. Ev parvekirineke li gor heqiyê ye, ne wisa Roberts?

Roberts tesdîq kir û got:

- Ev bi tamamî durust e, Rîvera. Ev ji ber ku hîn kes te nas nake, weha ye.

Rîvera:

- Ji sedî şêst û pêncê hatina ne safî, çi qas dike?

Danny:

- Belkî pênc hezar, belkî heşt hezar, tiştêkî li wê dorê. Para te jî nêzîkî hezar- hezar û şeş sedî dike. Ev ji bo lêdaneke baş ji boksorekî mîna min, pereyekî ne xerab e. Ma ne weha ye?

Rîvera bersiveke weha da ku herkes lal mabû:

- Kî zora kê bibe, bila hemû pere yên wî bin.

Civat ket nav bédengiyêke kûr.

Menajerê Danny:

- Ev, wek ku mirov şekirê zarokekî biçûk jê bistîne ye.

Danny aciz bû û serê xwe kil kir:

- Ev demeke dirêj e ku ez di nav vî karî de mim. Ez tu siyê ne dixim ser hakemê rîngê û ne ser van kesên hazir. Ez dê behsa maçên lihevkirî û hinek dek û dolabên carinan tên kirin, nekim. Lê tiştê ku ez dibêjim, ev e; derketina maçêke weha ne li gor min e. Ez ji serkevtina xwe baş bawer im; mesele ne ev e. Lê bifikire ku destê min şikest, ma ne weha? An jî yekî dilnexwaz dikare min bixapîne û tiştêkî ku laşê min sist bike bi min bide vexwarin.

Danny serê xwe bi awayekî jixwebawer kil kir û pirsî:

-Ez bi ser bikevim jî wenda bikim jî para



min ji sedî heystê ye. Tu ji vê re çi dibêjî, Meksîkiyo?

Rîvera serê xwe, di maneya "na" de kil kir. Danny wextê biteqîya. Li vê derê, êdî blof derbas dibû.

Danny got:

- Way Meksîkiyê serreş û ehmaq! Ez dikarim ji nuha de dev û bêvila te tije xwîn bikim!

Roberts ket orta wan. Tu guhertin di rûyê Rîvera de çênebû, îlada xwe domand û gotina xwe ya berê tekrar kir:

- Kî bi serbîkeve, bila hemû hatin ji wî re be.

Danny pirsî:

-Tu vêya ji bo çi dixwazî?

Bersiva Danny weha hat dayin:

- Ji ber ku ez dikarim zora te bibim.

Danny bi hêrs dikira çakêtê xwe ji xwe bikira lê menajerê wî dizanîbû ku ew vêya ji bo çavtirsandinê dike. Çakêt li ser Danny ma û Danny bi ya wan kesên ku li ber wî digeriyan, kir. Hemûyan aliyê Danny digirtin. Rîvera bi tena serê xwe bû.

Kelly:

- Li min guhdar bike, dîno! Tu bi çi çavî li xwe dinihêrî, tu ne tiştêk e! Temam, me fahm kir ku ev çend meh in ku tu zora boksorên deverê dibe. Lê Danny boksorekî ji sinifa yekem e. Ew ê piştî vê maçê, ji bo şampiyontiyê bilîze. Û kes te nas nake. Ji dervayî Los Angelesê, tu kesî nebihîstiye ku behsa te hatiye kirin.

Rîvera milên xwe hejand û got:

- Piştî vê maçê, dê kesê ku min nas neke, nemîne.

Danny bang kir:

- Ma gelo tu dikarî ji bo saniyeyekê bi tenê ji xwe îkna bikî ku tu êbikaribî zora min bibî?

Rîvera di maneya "erê" de, serê xwe kil kir.

Kelly li ber wî geriya û got:

- Ka were hişê xwe bide serê xwe û li min guhdar bikî. Serê xwe hebekî bişuxulîne, ev maç dê ji bo te bibe reklameke pîrr mezin.

Rîvera qut birî:

- Ez pereyan dixwazim, tu tiştêk din naxwazim.

Danny bi şêweyeke ji xwe ewle got:

- Tu çend tenûr nan bixwî jî, tu dê nikaribî zora min bibî.

Rîvera pirsî:

- Ger weha be, tu ji bo çi îtîraz dikî? Ger tu ewle be ku tu dê zora min bibî û pereyan têxe çenteyê xwe, tu ji bo çi zehmetiyê derdixî?

Danny:

- Baş e kero! Tu dê henekê xwe bi min bikî ha! Ez ê di rîngê de te perçe bikim. Kontraktê amade bike, Kelly. Yê ku bi serkeve wê hemû pere ji wî re be. Vê xeberê bighînin rojnameyên sporê; bibêjin ku ev dê maçeke mirin û mayinê be. Bila ev kur bizanibe bê دنیا çawa ye.

Dema sekreterê Kelly tam dest bi amadekirina kontraktê kir, Danny ew sekinand û berê xwe da Rîvera û pirsî:

- Lê wezinandin?

- Beriya ku em derkevin rîngê.

-Na na dosto, madem yê ku bi serkeve dê hemû pereyan bistîne, bila wezinandin jî sibehê saet di dehan de bibe.

Rîvera pirsî:

- Yê bi serkeve hemû pereyan distîne?

Danny di maneya<sup>7</sup> erê<sup>8</sup> de serê xwe kil kir. Ev mesele jî temam bûbû. Ew dê tam di dema ku herî xurt ba, derketa rîngê.

Rîvera got:

- Wezinandin di saet dehan de ye  
. Sekreter nivîsandina xwe domand.

Roberts ji Rîvera re, bi gazinî got:

- Ev tê maneya du kîlo û niv zêdebûnê. Te gelek tavîz dan. Te maç jî destpêkê de wenda kir. Danny dê bi qasî ciwangayekî xurt be. Tu dîn e. Ew dê ji sedî sed zora te bibe. Tu şanseke te ya biçûk jî tune.

Bersiva Rîvera nerîneke tije nefret bû. Wî nefret dikir. Wî dizanibû ku vîyê biyanî, di nav wan de yê herî durust e. Lê Rîvera tev vê jî ji wî jî nefret dikir.

#### IV

Derketina Rîvera ya rîngê hema hema qet tu bal nekişandibû. Bi tenê çend çepikên pîrr qels silav li wî kiribûn. Çavên temaşevanan ji wî ne dibirîn. Wan bi çavên ku ew dê wek zarokê di nav pencên Dannyê mezin de, bê perçekirin didît. Ji xwe temaşevan xeyalîkestî bûbûn. Wan hêviya şerekî dijwar yê ku dê di navbera Danny Ward û Billy Carthey bûbûya dikirin. Lê nuha divê ji mecbûrî, qîma xwe bi vî lawîkê rebenî nuhdestpêkirî binin. Nişanên hisên ji ber vê guhertinê, di mesela bi şertlîstinê de eşkere dibû; li ser Danny, li hember yekê, bi duduyan heta bi sisiyan şert digirtin. Ji ber ku temaşevanê ku bi şert dilîze, pereyên xwe li ser wî kesê ku dilê wî jê re dixwaze û bawer dike ku ew dê bi serkeve, radizîne.

Yê Meksîkî li quncikê rûniştibû û dipa. Zeman derbas nedibû. Danny wî li wê derê disekinand. Ev lîstikeke kevn bû. Lê li ser boksoşên nuh, hertim tesîreke mezin dikir. Dema ku ew weha di quncikê de, bi taswasa xwe û bi temaşevanan re bi tenê diman, tîrsek diket dilê wan. Lê vê carê ev lîstik bi ser neketibû. Roberts rast digot. Rîvera destûra tîrsê neda. Bi rastî jî di Rîvera de, tu asab-masab tunebû. Rîvera li gor kesên ku di emrê wî de bûn, ziravtir û zêftir bû. Ev atmosfera ku di destpêkê de mirov tîk dibe, qet tu tesîr lê ne kir. Alîkarên wî biyanî bûn. Ew, kes in ku ji tu tiştêkî re nedibûn û ne hêja bûn pênc pera. Ew rebenên rîngê yê bêheysiyet û bêenerjî bûn. Quncika wan, quncika wendakirinê bû. Di vî warî de tu şikek wan î biçûk jî tunebû.

Spider Hagerty bala Rîvera kişand û got:

- Divê hayê te ji te hebe.

Spider serekalîkarê wî bû.

- Heta ku ji te bê, maçê dirêj bike... Kelly dixwaze ku tu weha bikî. Ger tu weha nekî, rojname dê bibêjin, ev maç, maçêke ku berê li ser hatiye li hev kirin e. Bi vî awayî, li hemû Los Angelesê dê sempatiya ku ji bo vê sporê heye, kêm bibe.

Ev gotin, gotinên hêvî şikandinê bûn. Lê Rîvera qet guh nedida van gotinan. Wî hertim ji hemû maçên bokse yê ku ji bo xatirê pereyan çêdibûn, nefret dikir. Ji bo ku ji birçîna nemire, ketibû vî karî. Ew li lokalên meşqkirinê, bûbû qurmê derban yê ku mirov pê meşqê dike. Laşê wî ji bo bokse, mukemmel bû. Lê wî bala xwe nedida vêya jî. Her çi dibe, bila bibe, wî ji bokse nefret dikir. Beriya ku ew tîkeve nav

Juntayê, ji bo xatirê pereyan boks dikir û wî dizanîbû ku mirov di vî meslekî de, pîr rehet pera qezenc dike. Û ew, ne ew kesê yekem bû ku di vî meslekê ku jê nefret dikir de, bi ser diket.

Wî guhneda hîsên xwe. Her çi diba, bila biba, diviyabû ev maça qezenc bikira. Netîceya maçê divê ne bi awayekî din ba. Li piştê wî, hêzên mezin yên ku ev qebralixî li vê derê ye, tu carî nikare xeyal bike, hebûn. Sebeba vê baweriyê jî ev hêz bû. Danny Ward ji bo pereyan û ji bo jiyaneke xweş ya ku bi rêya pereyan tê, şer dikir. Lê tiştê ku Rîvera ji bo wê şer dikir, ew tiştê ku di mejiyê wî de dikeliya, bû. Dema ku ew bi tenê li quncika xwe rûniştibû û li bende raqîbê xwe bû, hemû tiştên ku wî diajot ser şer, di ber çavên wî yên wek bizotên êgir re derbas dibûn.

Wî ew fabrikeyên li Rio Blanca yên ku dîwarên wan spîkirî û bi quwweta avê dixebitîn, anî ber çavên xwe. Wî şeş hezar karkerên birçî û rengavêtî û zarokên biçûk yên heft-heşt salî ku ji bo di rojê de deh Senta bistîne, xwe dîperitandin, didît. Wî ew kesên ku di boyaxaneyan de, emrê xwe dirizandin, ew cenazena didîtin. Hat bîra wî ku bavê wî, navê wan boyexanan kiribû "şikêftên întîxarê". Li wê derê salekê mayin, dihat maneya mirinê. Dû re, malên wan yên ku weke qutîyan bûn û dema tev wê jî ku diya wî wext didît û pê şa dibû, bi bîr anî. Û bavê wî hat ber çavê wî; bi sîngeke fireh û mezin, bi baqê simbêlan û ji herkesî qencîr û delatîr. Dilê wî ewqas fireh bû ku ew hezkirina ku di dilê wî de hilnedihat hem têra diya wî dikir û hem jî têra

Muchachoyê biçûk yê ku li kêlekekê dileyîzî dikir. Wê demê navê wî, ne Felipe Rîvera bû. Navê wî jî ber navê dê û bavêwî, Fernandez bû. Wan bi navê Juan bangî wî dikirin. Dû re, dema dît ku komîserê polîsan ji navê Fernandez nefret dike, wî bi xwe navê xwe guhert.

Hey Joaquin Fernandezê mezin û dilo-van! Wî di bîranînên Rîvera de cîhekî mezin digirt. Wê gavê hişê wî baş nedigihastê û fahm nedikir. Lê nuha, dema ku ew li derbasbûnê difikirî, fahm dikir. Bavê wî hat ber çavên wî; li wê çapxaneya biçûk herf dixistin rêzê an jî li ser maseya ku tiştên li ser wê tevlihev bûn, nivîsên ku dawîya wan qet nedihat, dinivîsand. Wî karkerên ku di tariya şevê de, mirov di got qey sûc kirine bi dizî dihatin mala wan û bi bavê wî re diketin nava munaqeseyên dûr û dirêj, bi bîr anî. Û wê gavê Muchachoyê ku li qoziyê radîza jî hertim ne di xew de bû. Bi dengê Spider Hagerty ji xeyalan şiyar bû.

Hagerty:

- Hema tu bi carekê xwe li erdê rast neke û maxlûb nebe ha. Talîmat weha ye, lêxistina xwe bixwe û pereyên xwe bistîne.

Deh deqîqe derbas bûbûn û Rîvera hîn jî li qozîya xwe rûniştibû. Danny li ortê nexuyabû. Xuyabû ku dê hîleya xwe bi qasî ku bikarîba dirêj bikira.

Di vê navbeynê de, hinek xeyalên din hatin ber çavên Rîvera. Lokavta ku ji ber greva ji bo piştgiriya karkerên ku li Pueblayê di grevê de bûn, li hember karkerên ji Rio Blancoyê dihat bikar anîn... Birçîbûn... Ew gîha û kokên nebatan yên ku ji serê çîyan berhev dikirin û dixwarin û herkes pê

nexweş diket...Dû re ew kabûsa... Ew saha vala ya ku li ber ambarên şîrketê, karkerên birçî yên ku hejmara wan digihaşt hezaran û leşkerên Porfirio Díaz... Ew agirê ku ji tivingên kesên ku dixwest greva piştgiriyê ya karkeran bi xwîne bifetisîne, derdiket û mirin vedirşiya... Û ew şeva hanê!.. Vagonên berê xwe dabûn Vera- Cruzayê heta ber dev bi termên ku dê ji segmasiyan re bibin adan dagirtî... Derketina wî ya ser terman û di nav wan termên ku mûyên laşê mirov gij dikirin de, li dê û bavê xwe gerîn û dîtina wan, wek îro dihat bîra wî... Tew dîya wî pîrr baş dihat bîra wî... Laşê wê di bin termên din de wenda bûbû, çûbû. Bi tenê rûyê wê xuya dibû. Dema ku tivingên firo-tî yên Porfirio Díaz dîsa dest bi gulebaranê kiribûn, wî xwe dîsa avêtibû erdê û wek çûkê ku ketibû feqê terpilîbû û ji wir bi dûr ketibû.

Dengekî ecêb wek dengê pêlên deryayê hat guhên wî. Bi dû wê re, di nav komeke alîkar de, Danny ward xuya bû. Hemû kesên ku di salonê de bûn, ji bo qehramanê navdar yê ku serkevtina wî ji nuha ve xuyabû, li çepikan dixistin. Herkesî navê wî bang dikir û herkesî piştgiriya wî dikir. wekî din jî dema ku Danny di nav kindiran re bi fîyaqe derbas bû û derket ringê, devên alîkarên Rîvera jî ji hev mabûn. Kenekî pîrr comert xwe bera ser rûyê Danny dabû. Dema ku Danny dikeniya, hemû rûyê wî, heta hundurê çavên wî jî dikeniyên. Divê boksor weha bin! Qenciya wî, hîsên wî yên dostaniyê ji çavên wî dihatin xwendin. Kesê ku nas nedikir, tunebû. Espîrî belav dikir, haqêhaq wî bû û di nav kindiran re si-

lav dida hevalên xwe.

Temaşevanên ku li dûr rûniştibûn, ji ber heyranbûna xwe, heta deng di wan de hebû, bang dikirin:

- Danny, şêr Danny!

Ev merasîma nîşandana hezkirinê, tam pênc deqîqeyan ajot. Tu kesî Rîvera zilam nedihesiband û eleqê nîşan nedida. Di çavên temaşevanan de, hebûn û tunebûna wî wek hev bû.

Spider Hagerty rûyê xwe yê qermîçokî nêzîkî yê Rîvera kir û got:

- Li min binihere, divê tu ne tirsî û bila talîmat ji bîra te neçin. Divê tu îdare bikî. Weha zû bi zû mexlûbiyet nabe. Yan na, divê tu zanibe ku me ji bo lêxistina te ya li odeya kincguhertinê, emir stendiye. Tu fahm dikî? Divê tu di ber xwe de bidî.

Temaşevanan dest bi çepikan kirin. Danny xwe ber bi cîhê ku ew lê rûniştibû hat, xwe daqûl kir, destê Rîvera yê rastê xist nav destên xwe û bi awayekî dostane guvaşt. Bi devlikeniya xwe di ber bêvila wî de sekinîbû. Temaşevanan ji bo vê reftariya Danny ya wek numûneyeke sportmeniyê dihate dîtin, heta ji wan dihat li çepikan xistin. Danny mîna birayekî, silav li raqîbê xwe dikir. Lêvên Danny liviya û temaşevanan ev mîna nîşana şanseke qenc hesibandin û bi awayekî ji xwe derbasbûyî, ji nû ve li çepikan xistin. Bi tenê Rîvera van peyvên ku hêdî hêdî û bi dizî dihatin gotin, dibihîst.

Ji nava lêvên Danny bi bişirandineke ji dil ev peyv hatibû gotin:

- Meksîkiyê biçûk, kûçikê heram! Ez dê te bikujim!

Rîvera tev neliviya. Ji cîhê xwe jî ranebû. Hew bi çavên tije nefret lê niherî. Wê gavê mirovekî di nav kindiran re bang kir û got:

- Rabe ser xwe, ker lawê kera!

Temaşevan ji ber vê hereketa ku bi sportmeniyê re li hevdû nake, qeherîn û ew bi hevdû re protesto kirin. Lê ew tev neliviya û li quncika xwe rûniştî ma. Dema ku Danny ber bi quncika xwe zîvirî, temaşevanan dîsa li çepikan xistin. Gava Danny xwe tazî kir, vine-vineke heyraniyê bilind bû. Laşê wî zirav û xurt xuya dikir. rengê çermê wî mîna yê jinan spîboz û şayik bû. Sûretên wî hertim di kovarên sporê de derdikekin. Dema ku Spider Hagerty vezelê Rîvera jê kir, temaşevan xeyal şikestî bûbûn û nerazîbûna wan dihate bihîstin. Ji ber qemberbûna wî, laşê wî zuha xuya dibû. Halbûkî laşê wî bi adaleyan ve hatibû xemilandin, lê ev bi qasî yê raqîbê wî tesîr nekiribûn. Lê ew tiştê ku bala temaşevanan nekişandibû, firehbûna sînga wî bû. Ne sertbûna goştê wî, ne jî ew sîstema tenik ya asaban ku mîna torekê xwe li laşê wî gerandibû, bala tu kesî dikşand. Ew di çavên temaşevanan de, mîna xortekî hîjdehsalî ku laşê wî dişibiya yê zarokê piçûk dihate xuyakirin. Ma qey Danny weha bû! Danny 24 salî bû û laşê wî, laşê zilama bû. Gava ku wan li orta rîngê li tembîhên hakim yê talî guhdar dikirin, ev fêrî bêtir xuya dibû. Çavên Rîvera jî nişka ve bi Roberts ket. Li paşîya rojnamevanan rûniştibû. Îro jî her wextê serxweştir bû. Ji ber serxweşîya wî, zimanê wî jî giran bûbû.

Roberts digot:

- Guh medê Rîvera, bila ev di hişê de

be ku ew nikare te bikuje. Ew dê di destpêkê de ji nişka ve û bê plan li te bide, lê divê tu şaş nebe. Têkeve parastinê û wext derbas bike. Ew nikare zerareke mezin bide te. Weha bihesibîne ku tu antremanê dikî.

Rîvera tu reaksiyon nîşan neda û ji ber vê jî mirov nizanîbû bê deng çûyê an na.

Roberts li zîlamê kêleka xwe zîvirî û kir piste pist:

- Ax, tu nizanî bê ew çi şeytanekî bédeng e. Ew hertim weha ye.

Nefreta ku di çavên Rîvera de hebû, wenda bûbû. Şiklên tivingên bêhejmar dibiriqandin. Her rûyê ku di salonê de xuya dibû, bûbû tivingek. Çavên wî ji deverên Meksîkayê yê nêzî sînor û şoreşgerên ku di nava kincên rizîyayî de ne pê ve, tu tiştêkî din ne didît. Li quncika xwe dipa. Alîkarên wî rahiştin kursiya ku vedibe û dikeve tev û di nava kindiran re derketin derveyî rîngê. Danny li hember wî bû. Gongê lêxist. Maçê dest pê kir. Temaşevanan bi kêf bang kirin. Maçêke weha ku baweriya mirov tîne, hîn nehatibû dîtin. Rojnameyan rast digotin. Ev maçêke tolwergirtinê bû. Danny bi xweçengkirina yekem ve, ji çaran sisiyê wê mesafeya dûr ya ku di nava wî Rîvera de hebû, kurt kir û xwe avêt ser raqîbê xwe. Ev jî dida nîşan dan ku bê Danny çawa dixwaze yê Meksîkî bieciqîne. Ne yek, ne deh, hutukên bêhejmar lêdixistin. Tofana hutukan rabûbû. Rîvera di nava van hutukên bêhejmar de wenda bûbû. Ew di bin pêlên hutukên boksorê ku hosteyê karê xwe bû û ku di her pozîsyonê de hutuk diavêtin de mabû, çûbû. Di bin vê giraniyê de eciqîbû, li kindiran diket. Gava hêkim

ew ber bi orta rîngê ve dianî, ew dîsan ber bi benan ve dihat çengkirin.

Ev nedîşîbihiya maçeke boksê. Ev cîna-yet bi xwe bû, cenawertî bû. Danny tiştê ku dikare bike, bi awayekî wehşî îspat dikir. Kêf û heyecana temaşevanan gihaştibû bandevê. Ji ber vê jî wan ferq nedikir ku lawîkê Meksîkî hîn jî li ser piya mabû. Lêwîk xwe li ber derbên Danny yê ku mirov gêj dikir, nikarîbû bigirta û mirov digot qey ew yekcar li ortê nexuya bû. Ev rewş du-sê deqîqeyan weha dom kir. Dema ku ew ji hev veqetiyên, yê Meksîkî hat dîtîn. Lêva wî çiriyayî bû û xwîn ji bêvilê dihat. Ji ber ku piştê wî li kindiran ketibû masûr lê rabibû. Sînga wî mîna kûrikê ranedibû û danediket û çavên wî jî wek hertim mîna agirê sar diçûrisandin, lê çî feyde, wan ev ferq nedikirin. Wî di antremanan de gelek şampiyonên har dîtibû. Ma hindik caran bûbû hedefa êrişên wan î bêaman! Ew li hember van derban, ji car bi nîv dollarê û heta di hefteyekê de panzdeh dollaran, fêrî tehamulkirinê bûbû. Wî di wê dibistana bêaman de, xwendineke pirr zor kiribû.

Ji nişka ve, tiştêkî ku tu kes ne li bendê bû, qewimî. Ew tofana ku mirov gêj dikir, bi carekê rawestiya. Rîvera li ser piya û bi tena serê xwe bû. Danny, ew Dannyê mezin li ser piştê, li erdê hatibû rast kirin. Dema ku hişê wî dihate serê wî, laşê wî kil dibû. Ew ne kil bûbû, ne lingên wî li hev geriyabû, ne jî hêdî hêdî ketibû. Hutuka Rîvera ya rastê wek derba mirinê ji nişka ve lê ketibû û ew li wir rast kiribû. Hakem Rîvera bi paş de dahf da, li ser qehramanê ketî sekinî û dest bi jimartina sanîyeyan kir. Ji

kê bihata bila bihata, lê temaşevanan ji ber hutukên weha yê ku mirov dixistin xwarê, li çepikan dixistin. Lê nuha herkes bê deng mabû. Kes ne li bende tiştêkî weha bû, vê bûyerê herkes şaş kiribû. Herkesî bê bêdengîyeke asabî, li dengê jimartina sanîyeyan guhdar kirin.

Dengê Roberts bêdengîya ku xwe berê ser wê deverê dabû, belav kir:

- Ma min ji we re negotîbû ku ew bi herdu hutukên xwe dikare boksê bike?

Di saniyeya pêncan de, Danny xwe bi ser zik ve qeliband û di ya heftan de, li ser çongên xwe sekinî. Di navbera saniyeya nehan û dehan de jî ji bo rabûna ser piyar amade bû. Ger dema saniyeya dehan bihata jimartin jî çongên wî li erdê bimaya, wê gavê ew dê mexlûb bihata hesibandîn. Ger heta dehan, çongên wî ji erdê rabûbe, ew li ser lingan rawestiyayî tê qebûlkirin û wê gavê mafê Rîvera hebû ku ji bo wî li erdê rast bike, ji nû ve hutukan lê bixe. Dema ku wî çongê xwe rakira, Rîvera dê bi ser çavan de vekira. Ji ber vê, ew li dora xwe dizîvirî. Mirov gava bala xwe didayê, didît ku hakim jî bi wî re dizîvirî. Dema hakim saniye dijmartin, hêdî hêdî hereket dikir. Rîvera vêya ferq dikir. Hemû biyanî li hember wî bûn, heta hakim bi xwe jî.

Hakim, bi jimartina nehan re dehfeq da Rîvera. Ev neheqiyek bû. Lê ev neheqî têra ku Danny bi bişirandinekê rabe ser piyan kiribû. Bi milên xwe zik, çav û rûyên xwe girt û xwe li Rîvera gerand. Li gor qaîdeyên listîkê, diviyabû hakim wan ji hevdû veqetanda, lê mêrik çavên xwe ji vê re girt. Danny jî mîna mîdyeya ku xwe hişk bi ka-

înaya(ew beşê keştiyê yê ku di bin avê de limîne) keştiyê ve girtibe, Rîvera zevt kiribû û bernedida. Ji ber vê jî bi qasî ku bi ser tewe de were, zeman peyde kiribû. Ger ew heta dawiya vê raundê, li ser lingan biseki-niya, wê gavê dê bikarîba di quncika xwe de tam deqîqeyekê bêhna xwe berda. Û weha jî bû. Tev dijarî û bêhêvîtiya ku li holê bû jî ew dîsa dibişirî.

Temaşevanekî weha bang kir:

- Ew dîsa mîna berê, bi kêf xuya dike!

Temaşevanan xwe bi vê tesellî kirin û awayê xwe yê berê domandin.

Gava Danny hat quncika xwe, ji alîkarên xwe re bi hêrs got:

- Hutukên evê Meksîkî mîna xezeba xwedê ye!

Tu ta'ma raunda duyem û sêyem jî tunebû. Danny xwe pêş de diavê, direve, bi wî digre, xwe diparêze û bi vî awayî dixwest gêjbûna ji ber hutuka raunda yekem ya ku wî tevizandibû, ji ser xwe biavêje. Ya rastî ew bi wê hutukê gêj bûbû, lê ji ber ku di forma xwe de bû, dîsa bi ser hişê xwe de hatibû. Lê wî êdî nema dikarîbû wê taktîka xwe ya wehşî bi kar bianiya. Wî êdî dizanîbû bê evê Meksîkî çi xurt û jêhatî ye. Wî nuha hemû şiyar û zanebûna xwe ya di warê boksê de bi kar dianî. Di hemû listikên xwe de hoste bû. Tu hutukê xurt nikarîbû biavêta, lê dîsa jî wî bi saya teknîka xwe, raqîbê xwe gêj dikir û dibetiland. Gava Rîvera hutukê diavêtê, wî sê hutuk diavêtê, lê ev ne hutukin bi tesîr bûn. Tesîra hutukên wî ne ji ber xurtbûna wan, lê ji ber pirrbûna hejmara wan dihat. Wî hurmeta vî zarokê ku herdu hutukên xwe bi

hostetiyeke mezin bi kar dianî, digirt.

Rîvera di parastinê de, dest bikaranîna hutuka xwe ya çepê kir. Gava xwe li hember êrişan diparast, hutukên wî yên çepê li ser hev li dev û bêvila Danny diketin. Lê Danny dikarîbû di gelek stîlan de şer bikira û ya rastî jî ji ber vê, ji bo şampiyontiyê mîna namzet dihat destnîşan kirin. Di boksê de dikarîbû bi rehetî ji stîlekê derbasî ya din bibûya. Wî nuha jî dest bi stîla ji hundur kiribû. Ew di vê stîlê de gelek bi serkevtî bû. Bi vî awayî, xwe ji hutukên ku ji aliyê çepê dihatin jî diparast. Gava ku wî hutuka xwe ji binî de ber bi jor ve avêt û yê Meksîkî li erdê xist, temaşevanan wextî govend bigirtana. Rîvera xwe da ser çongeke xwe û li bende hejmartina saniyeyan ma. Wî ferq kir ku bê hakim çawa bi lez dihejmêre.

Danny di raunda heftan de, ew aparkuta xwe ya meşhûr dîsa lê xist. Rîvera bi tenê hebekî kil bû, lê di wê navê de Danny ew bi derbekê di nav kindiran re avêt derve. Rîvera bi ser serê xwe ve ket ser rojnamevanan. Mêrikan alîkariya wî kirin û ew hilkişandin heta ber kindiran. Dema hakim dihejmart, wî jî xwe dabû ser çongeke xwe û bêhna xwe vedikir. Ji bo ketina hundurê rîngê, divê ew di nav kindiran re derbas bûbûya. Danny jî ji xwedê ev dixwest. Hakim xwe tev lê nedikir, tew jî bo paşdevkşandinê Danny îkaz jî nedikir.

Hişê temaşevanan ji serê wan çûbû û heta ji wan dihat bang dikirin:

- Wî bikuje, Danny! Danny, wî bikuje!

Tiştê ku ji destê Danny dihat, tewsîr ne-

dikir, lê Rîvera ne di saniyeya nehan de, di ya heyştan de ji nişka ve xwe di nav kindirran re rakir û ket rîngê. Û ew û Danny hatin hember hevdu. Wê gavê hakim ket orta wan û mîna hakimekî alîgir, hemû rehetiyên ku ji bo Danny diviyabû peyde kir û Rîvera bi paş de kişand. Halbûkî gava cîh li Danny teng bûbû, raqîbê xwe zevt kiribû û bernedabû, wê gavê hakim wan ji hevdu ji nekiribû.

Rîvera heta dawîya vê raundê îdare kir. Pişt re hişê wî hat serê wî û ber çavên wî ronî bû. Hemû wek hevdu bûn; hemû, biyaniyên ku bi nefretê dagirtî bûn. Di warê neheqiyê de tu ferq di navbera wan de tunebû. Di vê dema mirin û mayinê de, hinêk tişt dihatin ber çavên wî: Rêhesina ku di nava çolê re derbas dibû, polîsên Meksîkî û Amerîkî, girtîgeh û gelê ku di nav kincên qetiyayî de bû... Manzarayên jiyana piştî greva "Rio Blanco"yê yên ku nefreta mirov zêdetir dikin û dilê mirov dişewitîne... Dû re wî dît ku bê bahoza şoreşa sor ya biheysiyet çawa van manzaranan ji wela-tên wî paqij dike. Sîleh li hember wî bûn. Her rûyekî ku wî jê nefret dikir, sîlehek bû. Wî ji bo xatirê sîlehan şer dikir. Ew bi sîlehan re bûbû yek. Ew şoreş bi xwe bû. Wî ji bo hemû Meksîkayê şer dikir.

Temaşevan ji Rîvera hêrs bûbûn. Ji bo çî wî ew lédana ku heq kiribû, nedixwar? Wî wek navê xwe dizanibû ku ew ê vê maçê wenda bike! Ji bo çî weha di ber xwe de dida? Temaşevanên ku meyla wan li ser Rîvera bûn, gelekî hindik bûn. Ew jî wan temaşevanên ku piştî xwe bi şensa xwe ya şertlîstinê ve girêdabûn, bûn. Wan teva baş

bawer dikirin ku Danny dê bi serkeve, lê dîsa jî li ser yê Meksîkî bi awayê li hember yekê sisê û li hember çaran jî deh, pere razandibûn. Hetta yên ku li ser bê Rîvera dê di raunda çendan de naqawt bibê, bi şert lîstibûn jî hebûn. Peryên ku li dora rîngê diçûn û dihatin, nedihat hesabandin. Yên ku digotin, Rîvera dê nikaribe heta raunda heftan îdare bike, hebûn. Ew kesên ku ji şertlîstinê bi qezenc derdiketin, nuha jî piştî xwe didan kursiyên xwe û bi heyecan beşdarî nava wan kesên ku ji bo Danny diqîriyan.

Rîvera destûra mexlûbiyetê nedida. Raqîbê wî di raunda heyştan de, ji bo aparkutekê lê bide, bêçsebeb li valabûnekê geriya. Rîvera di raunda nehan de, weha kir ku devê temaşevanan dîsa ji hev vebû. Di dema ku ew nêzikî hevdu bûbûn de, Rîvera ji nişka ve xwe jê xelas kir û di wê mesafeya ku bi qasî bihustekê de, hutuka xwe ji jêr ber bi jor ve avêtê. Danny got "gurrm" û ket erdê. Li bende hejmartina saniyeyan ma. Devê temaşevanan bihustekê vekirî mabû. Danny bi sîleha xwe derb xwaribû. Ew aparkuta wî ya rastê ya mîna destanekê di devê xelkê de, nuha li hember wî hatibû bikaranîn. Gava ku neh hat hejmartin û Danny rabû ser xwe, Rîvera ber bi wî çû, lê hakim ket orta wan û nehişt tu hutukan lê bide. Halbûkî gava ji berdêla Danny Rîvera diket erdê, hakim rêya Danny qet nedibirrî.

Rîvera di raunda dehan de, du carên din jî erd bi raqîbê xwe da maçîkirin. Danny dîn bûbû. Lê bêî ku dev ji bişirandina xwe berde, dîsa dest bi êrîşên xwe yên wehşî



yên ku di destpêka maçê de kiribû, kir. Lê her çi dibû, bila bûbûya, wî tev li wan hutukên ku li ser hev dihat avêtin jî nikarîbû Rîvera kil bikira. Halbukî Rîvera di nava vê bahozê de tam sê caran erd pê dabû maçîkirin. Danny êdî nema dikarîbû bi ser xwe ve bihata. Di raunda yanzdehan de, bi temamî perîşan bûbû, heta raunda çardehan jî hemû şiyana xwe ya di vî meslekî de peyde bûbû, bi kar anîbû; ber bi pêş ve diçe, paş ve vedikişe, dest bi parastinê dike, şer dike, direve û bi vî awayî dixwaze quweta xwe paş de bîne. Ji aliyê din ve jî bi metodên fenek yê boksorekî bi tecrube, bi faul şer dikir. Wî hemû fenê ku dizanîbû, bi kar anî; mîna ku tesaduf e, Rîvera zevt dikir, lepikên wî dixist bin çengên xwe û ber-nedida û ji bo bîhna Rîvera biçikîne, lepikên xwe dida ser devê wî. Dema ku xwe li Rîvera digerland, di guhê wî de sixêfê nemayî dikir. Herkes, lê bi rastî herkes, hem hakim û hem jî temaşevanan hêla Danny digirtin, herkesî ji bo ku ew qezenc bike, xwe perçe dikirin. Wan dizanîbû bê Danny li çi difikirî; ew li benda wê dema ku dê bi hemû taqata xwe hutukek li Rîvera xista, bû. Danny vekirî şer dikir, paş ve vedikişiya, wî teşwîqî ser xwe dikir û li firseta ku wî ji xafil de bigre û lê bide digeriya. Wê gavê wî dê heta quwet tê de heba hutukek lê bidaya û maç biqedanda. Piştî vê hutukê gelek rehet bû, wî dê mîna her boksorê mezin, berê bi hutuka xwe ya rastê li zikê wî bixista, dû re çenga wî û diqediya diçû... Heta ku ew li ser piya bimîne, dikare vê bike, ji ber ku wî bi quweta milên xwe, nav dabû.

Alîkarên Rîvera, di navbera raundan de, qet alîkariya wî nedikirin. Peşkirên ku wan pê bawesîn dikirin, ew qet hênik nedikir. Spider Hagerty xwedêgiravî aqil dida wî, lê Rîvera wek navê xwe dizanîbû ku ev taktîk şaş in. Herkes li dij wî bûn. Wî di raunda çardehan de Danny dîsa li erdê rast kir. Hakim dest bi hejmara saniyeyan kiribû û Rîvera jî paş ve vekîşiyabû û milên xwe bera ber xwe dabû û îstirahat dikir. Pis-pisên li qoziya wî alî ji çavên wî nedireviyan. Wî dît ku Michael Kelly çû ba Roberts û di guhê wî de kir pis pis. Rîvera li çolê mezin bûbû û guhên wî bi qasî yê pisîkekê hasas bûn. Ji ber vê yekê jî wî hinek ji axaftina wan bihîstibû. Wî dixwest hemû axaftinên wan bibihîse, ji ber vê jî dema raqîbê wî rabû ser piyan, wî heta ber kindiran ajot.

Michael digot:

- Biçe ba wî!

Roberts di maneya "erê" de serê xwe kil dikir.

- Jê re bibêje ku çi dibe bila bibe, lê divê Danny vê maçê qezenc bike. Min hemû malê xwe xistiye ortê. Ger ev mesele di raunda panzdehan de neqede, ez mahf dibim. Ev lawik li peyva te guhdarî dike. Biçe ba wî û jê re tiştêkî bibêje.

Wê gavê Rîvera fahm kir ku ev mesele pîrr ciddî ye û herkes ji bo têkçûna wî dixebite. Wî Danny careke din li erdê rast kir. Milên xwe bera ber xwe da û li bende rabûna wî ma.

Tam di wê navê de Roberts bang kir:

- Biçe quncika xwe! Êdî heta dehan, nema ji cihê xwe radibe.

Ew mîna ku di antremanan de emir di-

de, dipeyivî. Lê Rîvera bi çavên tijenefret lênihêrî û dû re xwe da benda rabûna Danny. Piştî raundê, dema ku Rîvera çû quncika xwe, Kelly xwe gîhand ba wî û jê re got:

- Kuro kero, êdî bes e, xwe mexlûb bike! Rîvera divê tu mexlûb bibî. Ger tu bi ya min bikî, ez ê te di nava pereyan de dakim. Ez ê careke din bihêlîm ku tu zora Danny bibî. Lê ka nuha were bi ya min bikî û êdî xwe mexlûb bikî!

Ji çavên Rîvera xuyabû ku wî ev gotin bi-hîstibû, lê tu îşaretên ku qebûl dike an nake, nedabû.

Kelly bi hêrs jê pirsî:

- Tu ji bo çi tişteki nabêji?

Spider xwe avêt ortê û got:

- Tu qûna xwe jî biqetîne, wê zora te biçe. Tu çi dikî, bikî, lê hakim dê di dawiyê de weha bike ku tu ê mexlûb bibî. Ger tu guhê xwe bidî Kelly, wê ji bo te baş be.

Kelly li ber wî geriya û got:

- Ez qurbana te bim, tê xwe mexlûb bikî! Ji bo ku tu bibî şampiyon, çi jî destên bê, ez ê bikim.

Tu peyv ji devê Rîvera derneket, lê bi tenê weha got:

- Soza min soz e. Ger min got, ez ê bikim, ez dikim.

Dengê gongê hat. Rîvera bîhna talûkeyekê stendibû. Temaşevan bi lîstika ku dihat gerandin, neesyabûn. Rîvera pê nizanibû bê talûkeyeke çawa ye, lê wî nuha talûkeyek di ringê de, li ber bêvila xwe hîs dikir. Weha xuyabû ku baweriya Danny ya di destpêka maçê de hebû, bi şûn de hatibû. Cesareta wî ya ku xwe bi pêş de diavêt, Rî-

vera xiste nava endîşeyekê. Dolabin dizivîrîn. Danny êrîşî Rîvera kir, lê Rîvera xwe jê xelas kir û xwe da kêlekê. Xuya bû ku raqîbê wî dixwest xwe nêzîkî bike û şer bike. Ji bo hîleya ku dihat fikirandin, qey pêwîstî bi rewşeke weha hebû. Rîvera xwe paş de vekîşand û li ringê çû û hat. Lê wî dizanibû ku çi bikira bila bikira, di dawiyê de wê muheqeq bihatana nêzîkî hevdû û ew hîle dê bihata kirin. Gava Danny êrîşî wî kir, wî weha da xuyakirin ku sînga wan dike bigihêje hevdû, lê tam dema ku sînga wan hat hember hevdû, Rîvera jî nişka ve paş de vekîşiya. Di wê demê de, ji quncika Danny dengê "faul"ê hat. Hakim nema dizanibû bê wê çawa bikira. Biryara ku diviyabû da, di nava lêvên wî yên ku diriciştin de ma.

Wê gavê lawikekî ji balkonê bang kir:

- Faula ecemiyani!

Bi ser vê de, Danny berê xwe da Rîvera û dest bi sixêfên pîrr pîs kir. Rîvera êdî biryara xwe dabû ku ew ê nema ji nêzîk ve şer bike. Bi vî awayî şensa xwe dadixist nêvî, lê wî ev jî pîrr baş dizanibû ku serkevtin bi wê hutuka ku dê meselê bi temamî tayin bike ve girêdayî bû. Wan dê ew di firseta yekem de, ji ber sûcê li dij qaîdeyan dîskvalîfîye bikirana û ev mesele biqedandana. Danny êdî bê hesab êrîşî dikir. Wî di du rûndan de bera dû Meksîkîyê ku nedihîşt ew xwe nêzîkî wî bike, da. Rîvera hutuk li ser hutukan xwar. Ji bo ku xwe nexe talûkeyê, li hember hemû derban îdare kir. Ev rewşa talî, hişê temaşevanên ku piştgiriya Danny digirtin ji serê wan biribû; di cîhê xwe de nedisekinîn. Wan tu ma'ne nedidan vê rewşa hanê. Boksorê ku taca serê

wan bû, tu nemabû ku maçe bi serkevîne biqedîne. Bi nefret bi ser Rîvera de diqîriyan:

- Tu ji bo çi şer nakî û direvî? Tirsonekê heram! Tu jî lê bide, kûçik! Li wî bide Danny, wî bikuje!

Di wê salona mezin de, Rîvera bi tenê newketibû heyecanê. Tiştê xerîb ev bû ku ew mirovekî ji van kesên ku li vê derê bûn bêtir dikeliya û ya din jî ew ji bûbû şahidê heyecanên ku ji hêrsa kollektîv ya wî deh hezarê li vê derê mezintir. Ji ber wê, ev heyecan û germî, mîna hênikayiya êvareke havînê bû.

Danny heta raunda hivedehan jî bi qurbanê xwe lîst. Carekê Rîvera bi tesîra hutukekê kil bû û dema ku dikira li ser piştê bike-ta, milên xwe bera ber xwe da. Danny got qey firseta ku ew lê digeriya, bi dest wî ket. Êdî yê Meksîkî û wîcdanê Danny. Lê Rîvera bi vê numarayê ew xapand û ji nişka ve hutukek li orta devê Danny xist. Lingên Danny ji erdê qut bû. Gava ku rabû ser piyan, hutukeke ecêb li çeng û stuyê wî ket. Rîvera ev lêdan sê caran li ser hev tekrar kir. Her çi dibe, bila bibe, lê ne mumkun bû ku mirov bigota, ev hutukanan li dijî qaîdeyan e.

Kelly li hêkim nihêrî û bi awakî bêçare naliya:

- Ax, Bill! Bill!

Hakim bi xemgînî bersiv da:

-Ez çi bikim, ew tu firsetê nade min.

Danny ji bo rabûna ser piyan, hewil da. Menajerê wî nedixwest peşkîrê biavêje rîngê, lê Kelly û yê ku li kêlekê rûniştibûn, ji bo rawestandina maçe bangî polîsan

kirin. Rîvera dît ku komîserê zikmezîna di nav kindiran re derbaşt rîngê bû. Tu ma'ne neda vêya, got qey ev jî xayintiyêke ji wan xayintiyên biyaniyan bû. Danny li hember wî li ser piyan kil dibû. Tam gava ku hakim û komîser ji bo ji hevduveqetandinê xwe bi hevdu re dirêjî Rîvera kirin, Rîvera jî derba talî li Danny xist. Êdî ne hewce bû ku mirov maç rawestanda. Danny li wê erdê weha rastkirî mabû.

Rîvera bi dengê sar ji hakim re got:

- Bihejmêre!

Dema hejmartin qediya, alîkarên Danny ew hilgirtin û birin quncika wî.

Rîvera bi awakî ji xwe bawer, pirsî:

- Kê zora kê bir?

Hakim bê dilê xwe, bi destê wî girt û bilind kir. Tu kesî Rîvera pîroz nedikir. Dema ku ew ber bi quncika xwe ve çû, tu kesî neda pê wî. Alîkarên wî kursiya wî jî dananibûn. Wî piştî xwe da kindiran û hem li alîkarên xwe û hem li qelebalixa ku ji deh hezar biyaniyan pêk dihat, bi nefret nihêrî. Taqet di çongên wî de nemabûn, ji ber betilbûnê digiriya. Gava ku ma'dê wî dixeliya, sûretên dijminan di ber çavên wî re diçûn û dihatin. Dûre hat bîra wî ku ev tîving in. Tîving êdî yê wî bûn. Şoreş dikarîbû dest pê bikira. ♪

**Wergera ji tirkî:**

**Mustafa AYDOGAN**

# TU BI XWE HAT

Toza êvarên te

weşiya  
cih girt  
di nav baskên çûnê de

Bûkên te hatin

bi hespên kimêt û  
gemkirî bi serîdana

xewnên  
malbatê

Tu bi xwe hat

lê ez winda

Tu bi xwe hat

bi te re  
befr û  
ar...!

Tu bi xwe hat

bi te re  
bîhna genim  
û serada simbilan

Tu bi xwe hat

tijî bi lîlînê

Periyên te bi ba ketin

Pê re xewn... xewnên te

û  
tu  
çûn

û ez mam şevbêrkek bê ziman!!!

**Mervanê Keleş**

# GIRTIYÊ ŞEVA REŞ

Firat Cewerî

**D**i kerrîtî û tarîtiya şevê de, dengê fizîna bayê kurr, dengê fikîna têlên dîregên telefonan, tîrseke bêhawe bi ser bajêr de direşand. Di wê saetê de ji bilî polîs û leşkerên nobedar û ji bilî segên bajêr yên bêxwedî ku li dora dikanên qesaban diçûn û dihatin, kes tune bû. Wan di şeveke wilo de li deriyê te xistibûn. Bi teqîna derî re tu ji nava nivînê xwe pekiyabû, te destê xwe avêtibû gomlekê li ber serê xwe û tu rabûbû ser xwe. Ger ne ji dengê jina te yê bi tîrs û lerzokî bûya, te ê hema bi bazdan biçûya derî vekira. "Derî veneke Selman, em pêşî ji polîsan re telefon bikin" wê gotibû. Mîna ku te dizanîbû mêvanên te yên bêwext polîs in, te bi lez bişkokên gomlegê xwe girtibûn û te ji hundur "hûn kî ne?" bang kiribû. "Em in Doktor, derî veke, nexweşekî me heye" dengên ji derve gotibûn. Herçiqas te gotibû, "destûra min tune ye ez nexweş û birîndarên nenas bi şev derzî û derman bikim" jî, peyayên ji derve bi celebekî deriyê te vekiribûn û ketibûn hundur. Bi dengên wan zarokên we yên biçûk jî şiyar bûbûn, xwe li kirasê diya xwe yê şevê pêçabûn û geh li diya xwe, geh li te, geh jî li wê koma peyayên girs î nenas nihêrî bûn. Tu bi xwe şaş û ecêbmayî mabû, te çîrok fêhm nekiribû. Wan pêşî xwe mîna "hevalan" bi te dabûne naskirin, lê ji ber ku tu zarokê herêmê bû û te panzdeh salan li wî bajarê xwe yê biçûk doktorî kiribû, te piraniyê rûniştewanan bajêr nas dikirin. Gava ew têgihîştibûn ku te ew nas kirine, wan xwe mîna polîsan bi te dabûne naskirin. Te pêşî li kaxiza wan ya destûrê pirsî bû, paşê te sûcê xwe mereq kiribû. Yekî ji wan kaxizeke qermiçî ji bêrika xwe derxistibû, ji dûr ve nişanî te dabû, paşê dîsan bi lez xistibû bêrika xwe. Yê herî li dawiyê î bejinkurt, ku ji bo nexweşiya xwe ya zerikê carekê hatibû ba te, mîna ku ji bo li hemberî doktorê xwe nelirêtiyekê dike, şerm kiribû, loma serê xwe xistibû ber xwe, qet li çavên te nenihêrîbû.

Munaqêşeya we ya li ser lingan zêde neajotibû, wan destûr nedabûn tu zêde bipeyivî, emir li te kiribûn ku tu bi lez kincên xwe li xwe bikî û bidî dû wan. Te jî wilo kiribû. Berî

ku hûn ji hundur derkevin, tu li ber derî li ser stûyê xwe zivirîbû, bi awirên tijî mane li jina xwe nihêrîbû, dabû pêşiya wan û li dolmîşa wan, ya li jêrî hewşê sekinandîbû siwar bûbûn û ji malê bi dûr ketibûn.

Wan du caran tu li nava bajêr gerandibûn, bajarê ku te pîrraniya emrê xwe lê buhurandibû, wê şevê bi te ecêb hatibû. Çavên te li serê her kuçeyekê li peyayên nenas û bi sîlah ketibûn. Gava wan tu ji bajêr derxistibûn û hûn ketibûn riya gundekî çiyê, tirseke mirinê li te peyda bûbû. Ji bo tu hebekî tîrsa xwe bitemirînê û dilê xwe têxî cih, te dîsan ji wan pîrsa sûcê xwe kiribû. Yê ku herî li dawiyê rûniştibû û wê şevê jî berçavkeke reş li ber çavan bû, ji paşiyê de hutikek bi hêz li paş stûyê te xistibû û bi te dabû xuyakirin ku tu bi sûcê xwe dizanî. Tu bi lêdana wî gelekî li ber xwe ketibû, lê te li ber xwe dabû û bi wan dabû zanîn ku tu bi sûcê xwe nizanî. Gava dolmîşa we tibabekî ji bajêr bi dûr ketibû û şewqa elektirîkên bajêr ji ber çavan wenda bûbû, tu li bûyerên van mehên dawî fikirîbû, loma tirseke bêhawe bi ser te de girtibû, gomlegê te bi carekê ve ji xwêdanê şil bûbû. "Ez dixwazim hîni sûcê xwe bibim, hûn dikin min bi ku de bibin?" mîna ku tu ne li ser hişê xwe bû, te pîrsî bû. Munaqêşe û kurtûpîstek bi nava polîsan ketibû, piştî çend deqîqeyekî wan dîsan berê dolmîşa xwe ber bi bajêr ve kiribûn. Şewqa elektirîkên bajarê te yê zaroktiyê dîsan hêviya jiyane dabû te, dilê te yê jar şa kiribû. Lê ew dilşahiya te zêde neajotibû. Dolmîşa we li ber deriyê avahiyeke mezin sekinî bû. Gava wan tu ji dolmîşê daxistibûn û biribûn hundurê wê avahiya mezin ya ji kevîran, hema yekî li ber derî çavên te girê dabûn û paşê tu dehf dabû hundur. Bi dehfa wî tu deverû ketibû erdê, lê wan dîsan bi milên te girtibûn û tu ji erdê rakiribûn. "Ma Doktor ev e?" yekî ji yê din pîrsî bû. Te ji berdêla wî bersiv dabû "Erê, ez im" te gotibû û te texmîn kiribû ku êdî ew ê li hemberî te bi hurmet tevbigerin. Te gotibû "çawa be ez doktorê bajêr im, zarokan şaştiyek kirine, ez girtime, lê ew ê niha min berdîn û di ser re jî ew ê uzra xwe ji min bixwazin". Hê tu wilo difikirî, yekî ji paşiyê de bi qemçika paş stûyê te girtibû, du caran serê te li dîwêr xistibû û gotibû: "Tu ê birîndarên wan derman bikî ha! Ka bila ew jî werin birînen te derman bikin!" Û birîna te ya pêşî di laşê te de vedibû, xwîneke germ ji serê te herikîbû ser paçikê ber çavên te. Te li ber xwe dabû "ez bêşûc im" te gotibû. Lê te nikarîbû bêşûcbûna xwe bi wan bidaya qebûl kirin. Te di tariya çavên xwe de ronahî û pakiya hundurê xwe dîtibû. Û loma, ji bo ew guh bidin bêşûcbûna te, te bi dengê bilind û bi hêrs "Hûn bêqanûniyê dikin, ez bêşûc im" gotibû. Hêrsbûna te ew hêrstir kiribûn, ji her hêlê ve hutuk û pehîn li laşê te ketibûn. Te xwestibû tu xwe ji ber lêdanên wan biparêzî, lê bi lêdana yekî ji wan tiliya te ya girdikê fikiya bû. Te guh nedabûyê, ji hêrs û qehra bêşûcbûna xwe te êşa laşê xwe ji bîr kiribû. Wan jî êdî dev ji te berdabûn, tu çavgirtî li ser kursiyekê dabûne rûniştandin û yekî ji wan cigarek jî pêxistibû û dabû te. Te wextî cigara wî qebûl nekira, lê te xwestibû kurtedemek be jî tu teseliya xwe di wê cigareyê de bibînî. Tu di wê navbira kurt de li derengiya şevê fikirîbû. Tu li zarokên xwe fikirî bû. Tu li diya wan fikirî bû. Lê dengên bang

û xeberên wan tu veciniqandibû. Xuya bû hinin din jî anîbûn. Dengê girî û libergerînên yên nûhatî, yên zarokan bûn. Yekî ji wan digot "Wele haya min ji wan tune ye, ez çûbûm ser gora birayê xwe". "Tu çûbûyî ser gora birayê xwe?" yê polîs jî digot û bi kulm û pehînan li lêwîk dixist. "Hûn ê hemû wilo derewan bikin, hûn ê me bixapînin. Hûn ê hemû bidin dû hev û herin goristanê, herin ser gorên şehîdên xwe(!)".

Mîna ew cara pêşî bû tu pê dihesiya ku çûyîna ser gorên miriyan li bajêr qedexe bû. Te tehemul nekiribû. Te xwestibû tu ji ser kursiya xwe bipekî û bi dengê bilind neheqîya wan bi wan bidî zanîn. Hîn tu wilo difikirî, du heban bi milên te girtibûn û tu ji ser kursiyê rakiribûn. Wan tu pênc-şeş gavan meşandibûn û dîsan sekinandibûn. Te di bin paçîkê li ber çavên xwe maseyek dîtibû. Li ser masê saetek, pakêteke Marlboro û kibrîtekê xuya dikir. Peyayê ku li ber wê masê bû ji te xwestibû ku tu bêrikên xwe vala bikî ser masê. Te bi ya wî kiribû, te tavilê bêrikên xwe vala kiribûn. Wî jî alîkariya te kiribû, destê xwe avêtibû qayîşa te û ew ji pantorê te kişandibû. Paşê jî wî saeta te û hungulîska te jî derxistibûn. Te xwestibû tu ji wî jî sîcê xwe bipirsî, lê te nepirsibû, tu li bendî emrê wan rawestiyabû. Dîsan du heb, her yek ketibû milekî te û tu ber bi cihekî nenas ve biribûn. Wê rewşa han herçiqas çavgiştî zaroktiya te anîbû bîra te jî, lê yên di milên te de tu ji xeyala zaroktiya te jî bi dûr xistibûn. "Xwe deyne, wê serê te li zikê avahiyê bikeve, hêdî bimeşe tu ê di avê wer bî. Kuro tu ket!" wan gotibûn û tu çend deqîqeyan wilo meşandibûn, ta ku wan tu avêtibûn pişt deriyekî hesinî, hundurê hucreyeke biçûk. Gava wan tu avêtibûn hundur, bêî ku ew xwe nîşanî te bidin, wan paçîkê li ber çavên te hilanîbûn. Di wê hucreya teng û gemarî de, mîna ku tu gihîştibû azadiya xwe, kêfa te hatibû. Êdî te dikarîbû bidîta. Çavên te vekirî bûn. Qîmeta ronahiyê li ba te bilind bûbû. Te xwe demekê di quncîka hucreya xwe de kiribû qomik û ziq li deriyê hesinî nihêrî bû. Li ser deriyê zingargirtî hin nivîs hatibûn xeritandin. Te demekê xwest ku tu wan nivîsan bixwînî, lê ew nedihatî xwendin. Te çend axînen kûr li ser hev kişandibûn. Tu di wê hucreya teng de li dinyayeke fireh difikirî. Ji bo ku tu jî carekê bi hin hincetan ji hin hevalên xwe re behsa girtina xwe û hucreya xwe bikî, te hêdî xwe berdabû ser çongên xwe û te hucreya xwe pîva bû. Hucreya te sê bihust di sisê û nîvan de bû. Tu demeke dirêj, heta ku lingên te tevîzîbûn, li ser tûtikan rûniştibû û fikirîbû. Te carina bawer nedikir, te çavên xwe digirtin û te dixwest ku ew xewnek bûya. Te dinyayek xeyalên pak di wê hucreya xwe ya teng de çêdikir. Tu geh li ser tûtikan rûdinişt, serê xwe dixist nava herdu çîmên xwe, geh te xwe berdida erdê, te herdu destên xwe li çîmên xwe digerlandin, geh tu radibû ser xwe, te piştî xwe disparte quncîkekê, destên xwe dixistin bin çongên xwe û demekê wilo li ser lingan dimayî. Lê dengê barîn û qîrînên ku dihatin te, tîrseke ku te heta wê demê hîs nekiribû, dixiste dilê te. "Gelo ma ew ê li min jî wilo bikin" te di dilê xwe de digot. Û te xwe ji wê re jî amade kiribû. Bi niyeta ku belkî ew te têxin felaqê, te di wê hucreya xwe ya sar û cemidî de sol û goreyên xwe ji lingên xwe derxistibûn. "Ger lingên min ji serman bitevizin, ez ê zêde êşê

nekişînim” te di dilê xwe de gotibû. Û ew ramana han jî ne ji ber şarezabûna te ya dokto-  
riyê, lê belê ew li wir bi te re çêbûbû. Carna di nav re dengên teperepa lingên mirovan,  
xeberên ne li rê, girî û libergerînan li korîdorê dihat. Carekê jî hema yek avêtibûn ber de-  
riyê hucreya te. Ew ji serma dirikrikî, şingîniya diranên wî xweş dihatin te. Xuya bû wî  
gelek lêdan xwaribû. Gava te xuşîniya avê bihîst, te texmîn kir ku wan ava cemidî bi ser  
wî dakirin. Hingî bêhngirtin û bêhnberdana wî wilo bi lez bû ku te di dilê xwe de got  
”Ger oksîjenê nedine vî ew ê bimire”. Yê di wê rewşê de dixwest tiştinan bibêje, lê ji ser-  
ma, lihevketina diranên wî destûr nedida. Di pişt wî deriyê hesinî û qalind de, ew mîna  
sehneyekê dihate ber çavên te. Weke ku tu fikirî bû, kirin. Bi teperepa lingên çend miro-  
vên din, doktokek jî hat. Ji bo bi hêsanî bêhngirtin û bêhnberdana wî, doktor jî jê re dibû  
alîkar. Di wê navê de pêla alîkariyê di dilê te de jî rabûbû, lê tavilê tîrsa mirinê ketibû dilê  
te. ”Ev çi dinyayek bînerdê ye, ev çi jiyaneke veşirtî ye” te di dilê xwe de gotibû. Ew celeb-  
jiyan gelekî bi te ecêb hatibû. Mîna ku piştî kurtedemekê ew ê ruhstîn li deriyê te bixe û  
dawiya jiyana te bîne, tu di hundirê hucreya xwe de bi aciziyêke bêtarîf geh rûdinişt, geh  
radibû. Piştî ku dengê yê li ber derî hate birîn û hatin ew birin, yekî bejinkurt, esmer û bi  
rih, deriyê te vekiribû, tepsiyêke tîrşîka fasûliyan û perçak nanê sominî avêtibû ber te. Tu  
hê li quncika hucreya xwe li ser tûtikan rûniştibû û te ziq li wê tepsîka xwarinê nihêrî bû.  
Ew tevgera te li xweşa wî neçûbû, ”Te neciband Doktor beg?” wî bi qerf û bi hêrs ji te re  
gotibû. Gava te bersiva wî nedabû û te bi xayizbûn nihêrîna xwe ya tepsîkê domandibû,  
ew hêstir bûbû, lê ew zêde bi ser te de nehatibû. Ji ber ku te mereq kiribû, bê xwarina  
kîjan demê ye, te ji wî pîrsa saetê kiribû. Ew dîsan bi ser te de qîriya bû ”pîrsa saetê qede-  
xe ye” gotibû û ji ber ku wî nexwestibû dirêj bike, deriyê te li ser te girtibû û çûbû. Te ew  
têpsîka xwarinê ber bi xwe ve kişandibû û demêke dirêj lê nihêrîbû. Tu birçî bûbû, lê te  
kiribû nekiribû dilê te nebijiyabûyê. Ji xwe gava dîsan dengê wê jinika li hucreya jêrî hu-  
creya te hatibû, xwarin hew di ber te de çûbû. Jinikê her ji deh panzdeh deqîqeyan carekê  
bi herdu destan ji hundur de li deriyê hucreya xwe dixist û bi dengê bi qêrîn bangî nobe-  
daran dikir û pîrsa lawê xwe ji wan dikir. Carina nobedaran pê ve baz didan, bi hêrs deri-  
yê wê vedikirin, xeber û gotinên ne li rê jê re dikirin. Lê nobedarê ku deriyê wê vedikir zû  
bi zû ji nava lepên wê nedifilîtî û wê her pîrsa lawê xwe dikir. ”We lawê min kuştîyee, we  
Mîrzeyê min kuştîyee” wê digot. ”Lawê te sax e, pîrê, tişteke bi lawê te nehatiye” nobe-  
daran jî bi tirkîyêke şaş û nexweş lê vedigerandin. Te hertim li diyaloga pîrê û nobedaran  
guhdarî dikir. Gava carekê pîrê ji yê nobedar re gotibû ”Yox Wele sen yalan soylîyorsin”  
û hin çêr û xeber ji wan re dabû, tu bêhî hemdê xwe di ber xwe de kenîyabû. Û gava çavên  
te ji nişka ve li kêzîka mezin ya di tacîka xwarinê de ketibû, di wê kêliyê de li rûyê dinyayê  
çi xwarin hebûya, li ber çavên te reş bûbûn. Tu hema ji quncika xwe ji ser tûtikan hol bû-  
bû û te bi hemû hêza xwe li derî xistibû. Nobedarek ji dûr ve ji dê û jina te re xeber dabû  
û bi hêrs ber bi hucreya te ve hatibû. Lê te lêdana xwe ya li derî domandibû. Tu wextî ji



ser hişê xwe biçûya, lê tu dîsan bi ser xwe ve hatibû. Nobedarê bejinkurt î bi rih deriyê te vekiribû û bi ser te de qîriya bû. "Çi ye, tu çi dixwazî?" wî gotibû. "Vê xwarinê ji vir bibe" te gotibû. Mêrik bi dengê bilind bi te kenîya bû, "Ha ha ha, dilê Doktor beg naçe xwarina me! Divê ji Doktor beg re xwarina taybetî çêbibe" wî gotibû û paşê bi carekê ve rûyê wî hatibû guhertin û bi hêrs bi ser te de qîriya bû. Te tu mane nedabû hêrsbûna wî, te hem jê nefret kiribû, hem jî gunehê te pê hatibû. "Dêmek tu bi şev birîndaran derman dikî, tu bi tirimpêla xwe diçî cih û deveran û birîndarên wan tînî li mala xwe derman dikî, ha!" wî dîsan gotibû, bi hêrs destê xwe yê rastê li sînga te xistibû û piştî te li dîwarê betonî xistibû. Gava piştî te li dîwêr ketibû, intûniyek ji te hatibû, mîna ku kezeba te ji devê te derketibe, te êşeke bêhawe hîs kiribû. Lê te li xwe danenîbû, li hemberî yekî mîna wî te nexwestibû xwe qels nîşan bidî, te peyva xwe jî birfî bû, wî çi gotibû, te guh nedabûyê, te nexwestibû lê guhadarî bikî. Yê wî jî çi hatibû ber devê wî, wî gotibû. Gava wî rahiştibû firaxa te, derî li ser te girtibû û çûbû, yê di hucreya li kêleka te de li dîwêr xistibû û gotibû "Doktor, tu guh mede vî, ew li vir tenê firaxşo ye, ew ji vir e, lê ew xwe li ser serê me mezin dike, xwe tiştêkî dihesibîne." Te pêşî ji wî dengî şuphe kiribû, te ew weke listikeke polîsan dîtibû, lê paşê te hêdî hêdî bawerîya xwe pê anîbû. Te li cih û warê wî, li kar û mijûliyên wî pirsî bû. Wî tu nas dikir, carekê zaroka xwe anîbû ba te, bi gotina wî te ji bo muayenê pere jê nestandibû. Lê nehatibû bîra te. Te di hucreyêke teng de, li pişt dîwarekî beton î qalind bi yekî ku te rûyê wî nedidît re, hevaltiyek, dostaniyek datanî. Sohbeta we bi deqîqeyan ajotibû. Wî di hundurê çend deqîqeyan de ji te re jiyana xwe ya bi salan gotibû. Dostanî û dilpakîya wî kiribû ku tu jî dilê xwe ji wî re vekî, jê re behsa çîroka jiyana xwe bikî. Te bi kurtî ji wî re behs kiribû û te bi wî dabû zanîn ku di çil û neh saliya xwe de ev cara yekem e ku tu hatiya girtin û tu ji sûcê xwe bêhay î. Mîna ku hebekî bi mêrik ecêb hatibû, "Çawa tu heta niha ji destên wan filitî yî" wî gotibû û tavilê bi ser ve zêde kiribû ku ew heta niha bi kêmanî çar çaran hatiye girtin, carekê du salan û çend çaran jî demên kurt girtî maye. Gava we ji dûr ve dengê teperepa lingên nobedar bihîstibû, mêrik peyva xwe kurt birfîbû û ji te re gotibû, ku li Şîrnexê dikaneke wî ya wênekariyê bi navê "Foto Şîpşak" heye û ger tu bixwazî wî peyda bikî, tu dikarî wî li wê dikanê bibînî. Te gunehê xwe pê anîbû û rewşa dikaneke xwediyê wê bi salan jê dûr be anîbû ber çavên xwe. Lê dengê teperepa lingên nobedar bi xurtî nêzik bûbû û bala te ya xeyala dikana cîranê te belav kiribû. Tu tirsîyabû, ku îcar ew ê te bibin û îcar tu ê serpehatiya xwediyê wan dengên bi nalîn, bergerîn û bi feryat bijî. Lê wan vê carê bi şingînî deriyê hucreya kêleka te vekiribûn û xwediyê dikana "Foto Şîpşak" biribûn. Mêrik li ber xwe dabû, lê xuyabû yên ku hatibûn her yek ketibûn bin milekî wî û ew li dû xwe kişkişandibûn. An jî di deng û tevgera wan wilo hatibû ber çavên te. Tu ji aliyekî ve gelekî li ber ketibû û gunehê xwe pê anîbû, ji aliyê din ve jî ji bo ku wan tu nebiribûn, tu dilşa bûbûyî. Lê te tavilê ji ber wê hîsa xwe şerm kiribû, tîrsa êş û eziyetê egoîzma te xurt kiribû. Piştî ku wan yê di hucreya kê-

leka te de biribûn bi nîvsactê, dengê borîna peyayekî di asmana de derketibû. "Hebe tune be ew e" te di dilê xwe de gotibû. Û te di wê kêlikê de ji mirovatiyê şerm kiribû. Te ji nizanîbû bê çima, lê tu tam di wê navê de li çêbûna zaroka xwe ya pêşî fikirî bû. Ew hîsên xweş yê ku pêlên hênîk li dilê te xistibûn, te bi hemû bavan re parve kiribû. Tu li qîmeta însanekî fikirîbû û tam gava tu li qîmeta îsanekî û îsanetiyê difikirî, dengê teperepa lingên du peyan ji korîdorê hatibûn. Wan herdu peyan deriyê hucreya te vekiribûn, tu li qorziya rastê, destên te di bin çengên te de dîtibûn. Tu li bendî bû ku ew bi ser te de biqîrin û xeber û gotinên xerab ji te re bikin, lê wan bi tenê hêdîka her yekî bi milekî te girtibûn û xwestibûn te bi xwe re bibin. Tu jî qet li dij derneketibû, tenê te çavên xwe li ser wan gerandibûn û tu bi wan re çûbûyî. Te di bîra wan de anîbû ku divê ew çavên te bigirin, lê vê carê mîna ew hêrs bûbin, wan bi şidet milên te kişandibûn û tu biribûn odeya mezinekî xwe. Te ew mezinê wan yê bejindirêj, çavşîn û rûbiken nas dikir. Ew çend caran ji bo hin nexweşiyên xwe hatibû ba te; te jî, digel ku te bi karê wî dizanîbû, ji bo ew biyanî bû, te qîmet dabûyê û te ew berî xelkê bajêr girtibû hundur. Gava ew di nava destên wan herdu peyayên girs û bi rih de çav li te ketibû, mîna ji bo ku wan ew tu bi wî babetî anîbûn, ew bi wan re hêrs bûbû, ji ser qoltixa xwe ya çermînî rabûbû û bi dostanî li pêşiya te rabûbû. Wê devbikenî û dostaniya wî dilê te şa kiribû, bê hemdî te rûyê te jî keniyabû. Wî destê te guvaştibû, tu dabû rûniştandin, cigare îkramî te kiribû û ji beqçiyê ber derî du çayê xwestibû. Te du hilmên kûr li ser hev li cigarê xistibûn û mîna ku te dixwest tu gazinên xwe ji mezinê wan re bikî, te geh li wî nihêrî bû, geh jî te awirên xwe bera erdê dabûn û ji ber xwe şerm kiribû. "Zarokan tu bi şaşî anîne, Doktor" mîna ku ew jî li ber te ketibe, wî gotibû. Û wî bi ser ve zêde kiribû, "Ji me re gilî hatiye ku te terorîstek derman kiriye, tu alîkariya wan dikî. Herçiqas min ji yê me re got, Doktor tiştêkî wilo nake, Doktor li gorî qanûnan dihere jî, lê yekî birîndar dibêje ku te bi şev ew li mala xwe derman kiriye". Te nizanîbû te ê çî bigota. Rast bû, te birîndarek li mala xwe derman kiribû. Şev nivê şevê hinan li deriyê te xistibûn, li ber te geriyabûn û xwestibûn tu birîndarê wan derman bikî. Herçiqas te gelekî bi dîqet û bi tirs ew girtibûn hundur jî, bêî ku tu ji wan bipirsî bê ew kî ne, tu bi saetan li birîna xortekî çardeh-panzdeh salî mijûl bûbû, te du gulle jê derxistibûn û te ew derman kiribû. Ji ber ku ew ne cara yekemîn bû ku şev nivê şevê li deriyê te diket û alîkarî ji te dihate xwestin. Hema bêje, ji roja tu bûbûyî doktor û te li bajarê xwe dest bi doktoriye kiribû, ne her şev bûya jî, bi kêmanî heftê carekê nivê şevê li deriyê te diket û tu bi derd û kulên xelkê re radibûyî. Lê tenê carekê birîndarekî li deriyê te xistibû, ew jî digel ku te bi rewşê dizanîbû, dîsan te deriyê xwe jê re vekiribû û te ew xortê nûgihîştî ji mirinê xelas kiribû. Û niha, gava wan ew xortê jihaldeketî anîbûn hemberî te, tu şaş û ecêbmayî mabû. Te xwestibû tu ji cihê xwe bipengizî, bi ser wan de biqîrî û bibêjî, vî xortî bibin nexweşxanê, lê tu bédeng di cihê xwe de rûniştibûyî, ji bêçaretiyê te awirên xwe berdabûn serê pozikên solên xwe. Yê ku lawik anîbûn, bi ser wî de

qîriyabûn "Doktorê tu derman kir ev bû?". Te pêşî lawik nas nekiribû, ya rebî, çi bi wî lawikî hatibû? Ew bûbû mîna darikekî, gepên wî kort bûbûn, porê wî yê zerik li hev geriyabû, ji xwe mirov digot qey newqa wî bi pişta wî ve zeliqiye, gomlegê wî mîna ebayekê jê re fireh bûbû. Lêwîk bi stûxwarî li te nihêribû. Ew dihejiya, bi zorê li ser xwe disekinî. Ne bi alîkariya herdu polîsên bi rih û rûtiş bûya, lawikê biherikiya erdê. "Ez ji te re dibêjim, doktorê ku tu li mala xwe derman kir, ev bû?" yê milê rastê bi şidet lawik hejandibû û jê pirsî bû. "Erê, ev bû" lêwîk gotibû û bi awirin melûl û westiyayî li te nihêribû. "Temam, tamam, wî bibin" mezinê wan emir li wan kiribû. Wan lawik bi dû xwe de kişîşandibûn û biribûn. Tu sar mabû, te nizanîbû te ê çi bigota. Mîna yê ewqas sal xwendibû û dostanî bi ewqas kesên navdar re danîbû, ne tu be, tu di cihê xwe de mîna gundiyeke saf, ji dinyayê bêhay, sar mabûyî. Mezinê wan cigareke din jî îkramî te kiribû. Wextî te cigara wî negirta, lê te dîsan bêî hemdê xwe cigareyek ji pakêta wî kişandibû û bi hestê wî yê li ser masê pêxistibû. Te di nermî û dostaniya xav ya mezinê wan de derxistibû. "Lê Doktor, me ev ji te nedîpa" mezinê wan gotibû û ji cihê xwe rabûbû. "Me ev ji te nedîpa" wî ducare kiribû. "Tu dizanî bê tu çi dikî, Doktor?" wî bi dengê hebekî sert gotibû, lê paşê mîna poşman bûbe, dîsan bi nermî bi ser ve zêde kiribû "Em dizanin mirovên nola te xwende û bîrbir tiştên wilo nakin".

Te dizanîbû bê ew di çi rewşê de bû û dixwest çi bibêje. Paşê ew li ser kursiyekê li ba te rûniştibû. Wî destê xwe dirêjî ser masê kiribû û rahiştibû wê albuma mezin ya qehweyî. Berî ew albumê veke "A ev e, Doktor, ev hemû hatine kuştin, dawîya li ber dewletê rabûn ev e" wî gotibû û mîna ku bixwaze hîn bibe bê wan gotinên wî çi tesîr li te kirine, awirek avêtibû te, lê dîsan, mîna nexweze tu ji wê awirê haydar bibî, tavilê albuma di destê xwe de vekiribû. Te pêşî fêhm nekiribû, te mereq kiribû, bê ew dixwaze çi nîşanî te bide. Lê wî kursiya xwe hê bêtir ber bi te ve kişandibû û rûpelê pêşî yê albuma vekirî dabû ber çavên te. "A tu van dibînî, van li gundê N... du leşkerên me şehîd kirine, lê ma wê bi ku de xelas bibin, dawîya van ev e". Te kûr kûr li wî resimê bi reng, yê ku hema hema hemû rûpelê albumê girtibû, nihêribû û bêî ku di destê te de be, lerezekê laşê te girtibû. Wê yekha han bala mezinê wan kişandibû, lê mîna wî ferq nekiribe, ew tevgeriyabû, te jî tavilê di wê tevgera wî de derxistibû, lê dîsan jî te awirên xwe ji ser rêsim danegerandibû. Te di dilê xwe de mereq kiribû bê ew çawan û bi çi awayî hatibûn kuştin. Sê kes bûn, keçek û du xort. Yê xort mîna ku razayî be dixuya, tenê bin çavê wî yê çepê reş bûbû. Keçikek ji wan jî ji navê berjor tazî bû, hinek xwîn di nava pêşîrên wê yê nûgîhiştî de herikî bû bin pişta wê, lê serê wê nexuya bû, bilûzê ku ji wê hatibû kirin, pê rûyê wê nuxumandibûn. Te texmîn kiribû ku wê serê wê bi celebekî hatibe jêkirin. Lê serê keçika din ku li jêrî lingên keçika rûnuxumandî bû, xweş diyar bû, çavên wê yê mezin vekiribûn. Gava te bi niyeta belkî tu wê nas bikî, xwe nêzîktirî albumê kiribû, weke ew bi te re bişirîbû, te kenek li ser lêvên wê yê ji hev ferq kiribû. Mêrik rûpelê albumê qulupandibû. Vê carê komek ter-

mên mirovan li ser hev û du leşkerên mîna ku poz dabin kamerayê, li ber çavên te ketibûn. Mezinê wan hem digot, hem jî rûpelên albumê di ser hev re duqulupandin. Tu pê re nedigihîşt, bi niyeta belkî tu hinekan nas bikî, her çiqas te bi dîqet li wan dinihêrî jî, heta nivê albumê xelas bû jî, te kes nas nekiribû. Lê tam album li ber xelasbûnê bû, çavên te li lawikekî ku hertim ji bo gurçikên xwe dihate ba te, ket. Gava mêrik xwest wî rûpelî jî biqulipîne, te bi destê wî girtibû û careke din lê nihêrîbû. Erê, ew lawik bi xwe bû, resimê wî ji navê berjor hatibû kişandin, digel ku hin ji rûyê wî şewitî bû jî, dîsan te ew baş nas dikir. Wê yeka han bala mezinê wan kişandibû, "Tu vî nas dikî, Doktor?" wî pirsî bû. Tu di erê nayê de mabûyî. Gelo te bigota çî? Hê tu difikirî, wî careke din ji te pirsî bû, "Erê Doktor, tu vî nas dikî?" Te derew kiribû, te bersiva "na" dabûyê, lê mîna ku te ji ber derewa xwe şerm kiribû, te serê xwe bera ber xwe dabû. Wî texmîn kiribû te ew lawikê ku belkî hê neketibû çardeh saliya xwe, nas dikir. Lê wî zêde guh nedabûyê, devê albuma xwe girtibû û dîsan danîbû ser masê. "Ev hemû ji aliyê hêzên ewlekarî ve hatine kuştin, nivê wan ermenî ne, nesunetkirî ne" wî gotibû û bi dengêkî tehdîtîkirin, dîsan bi te dabû zanîn ku li hemberî dewletê rabûn ne hêsan e, wê dawîya hemûyan wilo bibe. Mîna kuliyan zimane te xwaribû, peyv ji devê te derneketibû, te nizanîbû te ê çî bikira, te nizanîbû wan ê çî bikirana ji te, te nizanîbû tu ê bi çî celebî bi wî re bipeyiviya. Bêhna te teng bûbû. Tu bêçare bû. Te xwe di wê kêlikê de şibandibû çûkekî baskokirî. Gava mezinê wan cigareyek pêxistibû, tu li bendî bû ku ew yekê bide te jî. Lê wî wilo nekiribû, pê li bişkokê kiribû û bi hêrs emir dabû hinan da werin te bibin. Gava du kesên bi navmil û bi rih hatibûn, çavên te girê dabûn, bi milên te girtibûn û tu biribûn, te ew kirinên mezinê wan yên li hemberî xwe tavilê ji bir kiribûn û te meraq kiribû ku êdî ew ê çî bikin ji te. Ji her derê dengê nalîn û libergerînan dihat. Wan tu bi çavên girtî dehî dabûn hundurê odeyeke sar, tu deverû ketibû xwarê, te li erdê jî ji serê xwe çend pehîn xwaribûn. Yekî bi dengêkî gurr û bi tirkîyeke xerab ji jîna te re xeber dabû û bi te dabû zanîn ku ew ê çî binin serê te. Ji xwe pir tê re neçûbû, tu şilfî tazî kiribûn, herdu destên te bi jor ve dabûn girêdan, çend satil av bi ser te dakiribûn û ji her hêlekê ve derbe li te ketibûn. Tenê te êşên pêşî hîs kiribûn, bêî hemdê xwe tu qîriyabû, tu li ber wan jî geriyabû. Lê paşê weke tu têkevî xeweke kûr, te hew tiştêk hîs kiribû. Gava te çavên xwe vekiribûn, te xwe li ser textekî dirêjkirî dîtibû. Tu hê jî tazî bû, lê betaniyeke gemarî bi te hatibû dakirin. Tu êdî ji dangan vediciniqî. Wan tu dîsan biribûn, eynî tişt bi te kiribûn. Vê yeka han bi rojan ajotibû, ew tiştên ku te di pirtûk û rojnameyan de xwendibûn, hemû bi serê te de anîbûn. Tu hê jî dijiya. Te demekê ji wê jîyanê, ji mirovatîyê şerm kiribû, tu bêhawe li ber xwe ketibû. Hefteyek derbas bûbû, lê haya te jê tunebû, bi te mîna çend rojan hatibû. Te di wê hefteyê de ji bilî avê tiştêk nexwaribû. Riha te ya ku te her sibeh kur dikir, dirêj bûbû. Porê te li hev geriyabû, çavên te kort çûbûn û binê çavên te reş bûbûn. Ger neynikek hebûya û te bikarîba li xwe binihêriya, te ê bidîta ku mîna wî lawikê ku wan anîbûn pêşberî te li te hatibû. Zikê

te bi pišta te ve zeliqî bû, ger qayîşa te li pišta te bûya, ji bo pantorê te ji te de nekeve, di-viyabû te bi qulpuka dawî ve girê bidaya. Lê belê wan qayîşa te jî ji te standibûn û niha pantorê te ji te de diket. Te carê bi bêhêziya xwe bi zorê ew dikişande jor.

Gava sibehêkê deriyê hucreya te bi hêdîka vebûbû û wan tu bi çavên girtî bi dû xwe de kişkişandibûn, te texmîn kiribû ew ê dîsan te bibin odeya îşkencê. Te xwestibû tu li ber wan bigerî, xwe biavêjî lingên wan, lê te nekiribû, tu bi înad di nava milên wan de meşiyabû. Gava wan tu xistibûn hundurê odeyekê û tu li ser kursiyekê dabûne rûniştandin, te ji dengên dektîloyan û di bin paçikê li ber çavên xwe de ji şewq û ronahiya hundur fêhm kiribû ku ew ne odeya îşkencê ye. Dengê ken û henekên wan yên fahş tu aciz kiribû, lê te nedabû xuyakirin, te destên xwe danîbûn ser hev û bi stûxwarî di cihê xwe de bêdeng ma-bûyî. Çend heban gotinên ne li rê ji te re kiribûn, erza te şikandibûn, lê te dîsan tişt negotibû. Bi texmîna te yekî ku nuh ji derve hatibû, bi dengêkî mîna yê pîrekan ziravokî ji yên li wir re gotibû: "Haa, Doktor beg jî li vir e." Bi gotina "begîtî" te dizanîbû wî henekê xwe bi te kiribû, lê tavilê dektîlonivîsê ku li milê te yê çepê rûniştibû, ji te nav û paşnavê te pirsî bû. Bi şerdê ku tu peyva "komutanîm" bînin serê her gotineke xwe, te nav û paşnavê xwe jê re gotibû. Wî li navnîşana te jî pirsî bû. Te ew jî bi eynî zimanî bersivandibû.

Paşê wî li karê te, li navê dê û bavê te, li hejmara xwişk û birayên te, li malbatên xwişk û birayên te yên zewicî jî pirsîbû û bi bersivdayîna te re bi şinge şing nivîsandibû. Piştî wî pirsên xwe xelas kiribûn, wî ew kaxez bi te dabû îmzekirin û tu dîsan, çavgirêdayî şandibû hucreya te. Mîna ku tu hîni hucreya xwe bûbûyî. Te di wê hucreya xwe ya tengik de dînyayek xeyal çêkiribû. Te pir caran însan, însanetî bêmane dîtibû; gelek caran jî gunehê te bi însanan hatibû. Gunehê te bi te jî dihat. Carinan te hîs dikir ku hinek gunehê xwe bi te bînin tu ê bibêjî qûr û bigirî. Erê, mîna zarokekî bi îskîn bigirî. Ji ber her tiştî, ji bo her tiştî. Lê tam te belengaziya xwe bi bîr anîbû û girî ketibû qirika te, teperepa linginan hatibû te û xwediyê wan lingan, ku nobedarin nenas bûn, deriyê te vekiribûn û bi nermî bi te dabûn zanîn ku tu ê werî berdan. Te nizanîbû te ê kêf bikira an jî li ber biketayî. Te dabû dû wan û hûn bi hev re çûbûn hêwaneke mezin û sar. Li hêwana sar, komek xortên nekurkirî, bi awirên melûl, reben, destên xwe danîbûn ser hev û li bendî tişteke rawestiyabûn. Tu jî bû yek ji wan. Tiştê ecêb, gava tu li girtiyan û li rewşa wan difikirî, mîna ku tu ne yek ji wan bî, te bi awerike din ew bi bîr dianîn. "Xwedê bike wan tu neêşandibin, Doktor" dengê ji milê te yê çepê hatibû. Tu hema li ser milê xwe zivirîbû û te ziq li xwediyê wî dengî nihêribû. Te ew şibandibû, lê te nas nekiribû. Lawik zeyif bûbû, gepên wî kort çûbûn, newqa wî bi pišta wî ve zeliqî bû, kujê gomlegê wî yê ku ji ber pantorê wî derketibû, dilopin xwîne lê hişk bûbûn. Gava lêwik fêhm kir ku te ew nas nekiriye, wî navê xwe gotibû û bi te dabû zanîn ku ew li qehwexaneyê hemberî doktorxana te kar dike. Hema di wê navê de, mîna birûskêkê di mêjiyê te de derbas bû ku di nava we girtiyan de wekhevîyek heye. Her kes ji azadiyê bêpar e, gotin û xeberên ne li rê li her kesî têne kirin.

Lawik ji ber berdana xwe bi kêf bû, wî eziyeta xwe ji bîr kiribû, li te difikirî, ger bikarîba tiştek ji bo te bikira, wî ê bi kêfxweşî bikira. Ji awirên wî te ew fêhm dikir. "Piştî kontrolkirina doktor wê me berdin", wî bi heyecan gotibû. Gava di wê navê de yekî emir dabû we ku hûn ji bilî derpî hemû kincên xwe ji xwe bikin, diyaloga we ji hatibû birîn û lawikê çayger berî gişan kincên xwe ji xwe kiribûn. Çimên wî yên lûlikî bêpirç bûn, mirov bi rehetî dikaribû parsûyên wî bihejmartina. Gava çavên we li hev ketibûn, lawik bi te re bişiribû. Pir tê re neçûbû we hemûyan kincên xwe ji xwe kiribûn. Her kesî ji her kesî fedî dikir. Ji serma hêwana mezin û fereh, hin ji we diricifîn. Gava doktorekî ciwan û çeleng bi aletên xwe yên doktoriyê hatibû we kontrol bike, te ji doktoriya xwe şerm kiribû. Ji ber ku tu li serî bû, wî pêşî tu kontrol kiribû. "Tu jî doktor î ne wilo?" wî bi tinaz gotibû û piştî ku tu kontrol kiribû, bi te dabû zanîn ku êdî tu dikarî kincên xwe li xwe bikî. Te hêdî hêdî kincên xwe li xwe kiribûn, alavên xwe yên ku wan roja pêşî ji te standibûn, bi paş ve standibûn, qayîşa xwe bi qulpika herî dawî ve bi ser pantorê xwe ve girê dabû û derketibûyê derve. Li ber derî, mezinê wan destê xwe dabû te, bi xavî bi te re bişirî bû û hêdî di ber xwe de, "li ser wî tiştê em peyivîn, bifikire" gotibû.

Gava tu ji hewşa mezin ya polîsyanê, an jî bi gotina te, ya îşkenceyanê derketibû û tevî pêla mirovên li bajêr yên bêmane bûbûyî, te serê deqîqeyekê li paş xwe nihêribû. Azadî bi te xweş hatibû; lê jîyan, tevgera mirovan, kenê wan, xeberên wan, hemû bi te pûç û bêmane hatibûn. Gava yekî ji nişka ve xwe avêtibû te, tu veciniqî bû. "Tu hatî berdan, Doktor?" wî gotibû. Çaxa te dîtibû ku cîranê te ye, hebekî bêhna te hatibû ber te. Cîranê te tavilê ji texsiyekê re fikandibû, texsî bi bayê bezê li ber we rawestiyabû, tu ketibû pêş, cîranê te ketibû paş û li gorî tarîfa cîranê te şofêrê texsiyê yê xort ber bi mala te ve ajotibû. Gava texsî ketibû kuçeya we ya fireh û herdu zarokên te ji nava wê qerebalixa li ber hewşa we bazdabûn pêşiya te, ji ber hîsa bêrikirin û hezkirineke bêsinor hêşir ji çavên te hatibûn... ✍

# ŞÊX MEMDÛHÊ BIRÎFKANÎ


**H**erwekî tê zanîn ku gotina helbestan, ya stiranan, kirina ken û girî, tev ji ber fûra kela dilê mirov derdikevin. Lewra mirov bi wan hinekî nepxa dilê xwe dadixîne û hêsan dibe. Îcar ew nepxa dil, çî ji ber xweşî û şadiyê bin, çî jî ji ber reşî û bêbextiya bêbextan bin gava ku dilê mirov ji agirê vîn û nevinê were kelandin û fûr pê bikevin, hingê divê ku ew dil dakeve û were qeysa xwe ya berê. Eger wisan nebe, dibe jî ku kirîzeke nihênî were û wî canê pîroz ê ku nexşeke yezdanî ye bihingêve û ji gerdûna keysxweş bihinêre goristanê.

Ji berê ve jî gotine ku "Girî, ne karê mêran e" û ken zêde ji wan re xiş nake. Nexwe ji mêran re tenê gotina stiran û helbestan dimîne. Îcar gava ew bi stiran û helbestan re bibin hevîrî, bê ku bigrîn hinekî bi wan kula dilê xwe dirijînin.

Gotina helbest û stiran, niha zêdetir para Kurdan e. Ji ber ku di vê Sedsala Bîstê de hemû derd û kul, zor û zehmetî, bindestî û belengazî, herweha çiqas teşqele û gelşên kesnedîtû ku hene, bûne para Kurdan û bi jiyana wan re tene jiyandin. Ha ji ber vê hindê ye jî ku helbest, stiran, cihekî xwe yê taybetî di edebiyata kurdî de vegirtine û xwe kirine beşeke wê.

Gava mirov li vêjeya kurdî dinere, mirov dibîne ku qelemşoriyeke wisan hunerî tê de heye ku jê re hicirkên mixê mirovan dikelin û qulçavkên dilê birîndar pê xweşî û hêsan dibin. Yek ji wan qelemşorên ku helbestên pirreng afirandine jî, Şêx Memdûhê Birîfkî ye.

Mamoste Sadiq Behaedînê Amêdî, di pirtûka xwe ya bi navê "Hozanvanê Kurd", rûpel: 605-613-an de, behsa Şêx Memdûhê Birîfkî kiriye û çend texlîten cuda ji hel-



**Zeynelabidîn Zinar**

bestên wî yên cihêawe jî pêşkêşê çavên dûr-  
bînan kiriye.

Di vê hejmara NÛDEMê de, îcar me  
xwest ku wî helbestvanê hêja bidin naskirin  
û çend nimûne ji helbestên wî jî pêşkêş bi-  
kin.

Şêx Memdûhê Birîfkî, di 1911-an de li  
gundê Badê ku girêdayê bi bajarê Dihokê  
ve ye, hatiye dinyayê. Navê bavê wî Şêx  
Muhsin e, bapîrê wî Şêx Abdulcebarê kurê  
Ebdulqeharê kurê Ebdulahê kurê Ebdulce-  
bar e. Ew bi koka xwe, digîje malbata Şêx  
Nûredînê Birîfkî yê bi navûdeng ku ew  
malbat bi koka xwe ji bakûrê Kurdistanê, ji  
bajarê Xelatê ye. Şêx Memdûhê Birîfkî di  
Rêçika Qadirî de şêxekî navdar bû û li her  
çar beşên Kurdistana dabeşkirî rind dihate  
naskirin, du caran jî çûye Hecê. Ew malx-  
weyê sê jinan, bavê yazdeh kur û pênc ke-  
çan bûye.

Memdûh Birîfkî piştî ku xwendina xwe  
kuta kiriye, çûye bingeha xwe li Dihokê  
vegirtiye û li jiyana domandiyê, herweha li  
wir bûye serokê Beşa Yekîtîya Nivîskaran a  
li Dihokê jî. Ji berhemên wî, agahdariya  
me tenê bi dîwaneke wî heye. Wekî din  
eger berhemên wî hebin, em pê nizanin.

Li Dihokê êdî temenê Şêx Memdûhê Bi-  
rîfkî hin bi hin ber bi kalîtîyê ve çûye û di  
yazdehê Nîsana 1976'an de li Bexdadê din-  
ya ruhn lê tarî bûye. Niha laşê wî yê paqij  
li Goristana Dihokê dimîne û gora wî de-  
vereke bi navûnîşan e.

\*\*\*\*\*

Şêx Memdûh, di zaroktiya xwe de gava  
dev bi xwendina Qur'anê kiriye, hin bi hin

fêrî xwendin û nivîsandinê jî bûye. Piştê li  
gundê Birîfkanê sê salan li cem Hacî Mela  
Ebdulayê Ertûşî ku dersdarê Tekyeya Birîf-  
kanê bû xwendiyê. Piştî sê salan ji wir çûye  
gundê Spîndarê û li wir jî nêzî salekê li cem  
Mela Ehmedê kurê Mela Ebdulxaliq xwen-  
diye. Paştê çûye Hêşeta Mezin a li nêz  
Mizûriyan û li wir demekê maye, li Tekya-  
ya Şêx Ebdurehman Ertûşî li nik dersdar  
Hacî Mela Ehmed xwendiyê. Piştî demeke  
dirêj ku li wir maye, îcar çûye gundê Ke-  
mekayê û li cem dersdarê hêja Hacî Mela  
Îsa kurê Salihê Kemekî xwendiyê. Li Ke-  
mekayê nêzî du salan digel pismamên xwe  
Şêx Celaledînê kurê Şêx Nûrî, Zeynelabi-  
dînê kurê Mihyedîn, Ebdulcebarê kurê Eb-  
dulqehar û birayê xwe Ebdulhemîd xwen-  
diye. Paştê Şêx Memdûh ji Kemekayê çû-  
ye Zaxoyê û li cem Seydayê zana Mele Eh-  
medê kurê Mela Ebdulxaliq xwendiyê, li  
wir domandiyê heta ku xwendinnameya  
seydatiyê ji dersdarê hêja Mela Ehmed  
wergirtiye.

Şêx Memdûhê Birîfkî helbestvanekî dest-  
hel, pir jîr û zîrek bûye. Çewa ku di helbes-  
tên wî de jî diyar dibe, di vehandin û lihe-  
vanîn, kêş, nîkl û darêjtinê de li ser cûreyên  
klasîkî yên kurdî çûye. Xasma ew di vehan-  
din û kêş û sengandinên Melayê Cizîrî û  
yên Feqiyê Teyran de gelekî têgihaştî û za-  
na bûye. Bi taybetî jî ew heyran û rêzevanê  
Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Ehmedê  
Xanî bûye. Herweha li ser rêça wan çûye,  
di babet û şûfê helbestên wan de jî helbest  
afirandine.

Belam tiştê ku tête ber çavan; Birîfkî li  
ser awayên hozanvanên Sedsala Bîstê pir



bizavker bûye û her li ser şopa wan ajotiye ku çendî bêjî heta ji dest hatiye helbestên xwe bi kurdiyeye safî ristine û li dû bêje û hevokên kurdî pir geriyaye.

Herweha Şêx Memdûh bi xeysetê rêberêk ji yên Rêçika Qadirî, li her çar beşên Kurdistanê jî pir geriyaye û di wan geryan û rêwitiyên xwe de gelek destnivîs û berhemên kurdî berhev kirine û ew jî mirinê rizgar hiştine. Lê li gorî gotinan, gelek ji wan berhem û bermayên ku hatine berhevkirin, heta niha jî derneketine ruhniyê û nişa xwe danexistine nêv adana çanda kurdî.

Ev çend helbestên Şêxê Birîfkî li jêrê wek nimûne rûqalî çavan dibin. Xasma ya bi sernavê "Welatê Min" ku zêdetir balkêş e:

## WELATÊ MIN

Şax û daxên welatê me pir e ji şengebiya  
Çiçek û alal û beybûn qul bi qul ketne  
çiya

Nêrgizên serdigiran şermendeyê xemla te  
ne

Li çîmenêt nazik û ter sinbil diden avr-  
wîya

Sorgulên sîmayê rengîn terzena girtî xu-  
nav

Daxedar im bo binevîşên xurmeyî li ber  
keviya

Çarkinarê keviya sosin û sinbil xemilîn  
Mêr û baxê di beheştê didene ber çikiya

Heçî coma tu binê bexçeyê Ridwan e  
welat

Baxê Îrem te hebit dê bideyne mizgîniya

Rez û bax û çîmena şalwîl û balwîl dix-  
wînin

Deng û awazê şîrîn kevte nihâl û geliya

Miriyê biyanî lê danî, sê şeva dê jîteve  
Her dema binêrî bihar e, kanê noşdar e  
giya

Ax jê zêr e, çiya binêre durr û elmas in  
hemî

Çend cewher cumle yekser wê ji nik me  
çûn çiya

Kan û gencên di welatê me pir in, mal  
dane yek

Sedhezar in tev bijar in, makê kîmiya ye  
giya

Serwerê çendî cîhan heq bê guman erdê  
me ye

Qurteka (qurçeka) avê ji dola sax diket  
bitivariya

Heçî vî erdî bibînit paşî jê bibene derê  
Şêt dibit hadir di gavê û har dikevte riya

Bes bibêje, kêr birêje, Exlatî nasê ji mêj  
e

Cih biheşt e, çiya û deşt e, av heyat e li  
kaniya

Çewa ku ji van herdu helbestên li jêrê di-  
yar dibe, Şêx Birîfkî ne tenê di welatparê-  
ziyê de, herweha di evîn û bengîtiyê de jî  
pir xametûjî kiriye û kela dilê xwe rijandi-  
ye:

## EVÎNA MEMDÛH

Ev ro ji xeman bê çare û vanedil im ez  
Agir di hinava wekî gazê disojim ez  
Agir di hinava te kirî şîbhê tenwîrê  
Ser ta qedem rengê bîhê helpevijim ez

Jan têne giyanim weku bilbil bi fixan im  
Perwane ez im, sotim û bê deng dimirim  
ez

Xwînrêj e ji çavan wekî barana biharê  
Şev ta seherê dwîr ji xewê her digezim ez

Şev gorî digel te ji me ra Eynîheyat e  
Ger bêyî li ser min, li mirinê xwoş dibezim ez

Çavnêrî li te derdê evînê li me diyar kir  
Her çendî veşêrim ji serî her dihejim ez

Deh sal in ji derdê te xem û tah diyar in  
Ma hêj tu nizanî dikelim ez

Memdûh ji derda dil û canê xwo di ser  
da  
Ma hêj ne bes, dil sotî, sûretpel im ez.

## LALEŞÎN

Ez çûme Laleşînê  
Li nav Elkî û Bilîsa  
Min dî li wê cuwanek  
Wek fenerê teyîsa  
Şengeşîrîn û nazik  
Xunçeleba pelazik  
Derhal me can bû gazik  
Ji derdê evînê dîsa  
Min gote wê: Tu rind î  
Şengeşîrîn û qend î  
Li ber katuyê bilind î  
Wek Tûrê Nebî Mûsa!  
Go: Ez şîrîn û şepal im  
Bi qed û xet û xal im  
Kurdîstana delal im  
Kevtime destê pîsa!

Şêxê Birîvkî vê helbesta xwe ya li jêrê jî, li  
gora nîkl û mezeya helbestên Feqiyê Tey-  
ran ristiye:

## DÎLBERÊ

Dîlberê, dara şîrînê  
Jaro, bêmalo, dilo  
Kevtiyîne derdê evînê  
Ay dilê min, ay dilo!  
Kevtine ber derd û janê  
Wek Memê sotî gumanê  
Ah! ji destê vê ciwanê  
Ay dilê min, ay dilo.

# ÇEND NAMEYÊN KAFKA YÊN JI MÎLENAYÊ RE

Meran-Untermais  
Pansiyona Ottoburgê

## Xanima delal Mîlena,

Min pêşî ji te re ji Pragê, paşê jî ji Meranê nivîsandibû. Lê te bersiva min neda. Ez zanim ne di cih de ye ku ez li bendî bersivên wan perçekaxezên piçûk rawestim. Gorî ku te neni-vîsandiye, divê tu baş bî; em bi pirranî gava ku baş in bêdeng dimînin, ger wilo be divê kêfa min were. Tenê şika min ji tişteki heye-ji ber wê yekê ez îro dinivîsînim-hêvîdar im ez te naşikînim? ( Divê destekî min î hov hebe ku li hemberî daxwazên min yên wilo tevbigere). An jî-ya xerabtir- "Ez van rojan hebekî bêhna xwe berdidim" te gotibû, belkî ew rojên te yên baş derbas bûn, kî dizane, belkî dîsan rojên te yên nexweş dest pê kirine? Şika ku min tu şikandibe, ne di cih de ye, ez dizanim, û di derheqa vê yekê de jî tişteki ez bêjim tune ye; lê ger tu nexweş bî, xerab e, ez nikanim şîretan jî bikim-Ez li ku şîretkirin li ku? Tenê ez dixwazim vê bipirsim: Çima tu hinekî ji Vîyanayê venaqetî? Tu wekî yên din ne bêwelatî ku! Gelo jî bo tu hebekî bêhna xwe berdî tu naçî Bohemyayê? Dibe jî ber hin sedemên ku ez nizanim tu naxwzî biçî Bohemyayê; wê çaxê here cihekî din... Were Meranê! Ma tu hiç hatiya vir? Ez li bendî te û du tiştan im: An ew ê bêdengiya te dom bike, ew jî tê vê maneyê: "Li ber min nekeve, ez baş im" an jî tu ê ji min re binivîsînî. Çi ecêb e... Ez nikanim rûyê te bi hemû awayî binim ber çavên xwe, lê li pastexanê, gava tu di nava maseyan de derbas bû û çû, baş tê bîra min. Ez niha mîna ku şiklê te û lixwekirina te dibînm.

Ji can Kafka



**Franz Kafka**

## Milenaya delal,

Tu li wê dinya Viyanayê ya nexweş bi zehmetî karê wergerê dikî. Ev ji aliyekî rûreşiyê, ji aliyekî jî dilşahiye dide min. Gerek te di vê navê de ji Wolff\* name girtibe, ji ber ku ji mêj ve ye wî gotibû ew ê ji te re nameyekê bişîne.

Di katelokekê de ew kurteçîroka bi navê "Yê ku dike", ne ya min e. Divê şaşiyek çêbûbe. Lê ger ew weke çîroka min ya herî baş bête dîtin, belkî, ez nizanim.

Gerî min ji nameya te ya vê dawiyê û ji ya berê jî fêhm kiriye, xuyaye ew bêhtengî û nexweşiya te derbas bûye; ez bawer im ji bo mêrê te jî wilo ye, tu nizanî bê ez çiqasî vê yekê ji we re daxwaz dikim. Rojek yekşemê, piştî nîvro tê bîra min. Berî bi salan bû. Ez li keştûgehê miskîn miskîn ber bi jêr û jor ve ji xwe re dimeşiyam, ez hingê pêrgê mêrê te bûbûm. Ji vê pêrgîhatinê em herdu jî ne kêfxweş bûn. Ku bi maneyên cihê be jî di "serînepi-xandinê" de em herdu jî hoste dihatin hesabandin. Nayê bîra min, nizanim gelo em bi hev re meşiyabûn, dibe ku me bi tenê silav li hev kiribû. Lê xem nake, ji xwe ev yeka han ne girînge jî. Ev bîranîneke gelek kevin e, em nû nekin, bila wilo veşartî bimîne. Gelo mala we xweş e?

\* Wolff weşangerê Kafka bû.

Kafkayê te

Meran-Untermais  
Pnasyona Ottoburgê

## Xanima delal Mîlena,

Barana ku du roj û şevêkê dibariya niha dawî hat, dibe ku jî ev dawîhatin demî be, lê dîsan jî hêjayî pîrozkirinê ye, ez jî bi nivîsandina vê nameyê pîroz dikim. Ev baran ne ku nedihate kişandin; lê hindik be jî dîsan gava mirov li der û doreke xerîb be, rehetiyê dide dilê mirov. Ev ji der û dora xerîb tê. Ez ne şaş bim tu jî (Tiştê ku tê fehmkirin, ew hevdu dîtina kurt û bêdeng nayê ji bîrkin) rojên pêşî ji ber biyanîbûna xwe li Viyanayê dilşa bûyî. Paşê ji ber hin sedeman wê ew dilşabûna te dawî hatibe. Ger dawî hatibe, gelo tu hê jî ji mayina der û doreke xerîb hez dikî? (Ger tu hez bikî ne nîşaneke başiyê ye, dibe ku jî divê tu hez nekî).

Ez li vir baş im. Li vê cîhana mirî laşê min hê bêtir pakiyê hilnagire. Balkona oda min digihê heya bexçe. Mirov ji gul û lavlavkan nikane derbasî balkonê bibe. (Hewa pîrr ecêb e li vir. Li Pragê di hewayên wilo de av diqerise. Li vir gulên balkonê movik vedidin). He- ma bêje pozê min û rojê li hev dikevin (Ya rastî ji asmanekî bi ewrên tarî ve nixumandî, an na ev hefteyêke ku min rûyê rojê nedîtîye) gumgumok û çûk - ev herdu benderuhên ku qet li hev nakin - têne seredana min. Min çiqas dixwest tu werî Meranê! Berî niha bi demekê "Bêhna min dernakeve" te nivîstî bû. Salixdana te rast e, ger tu werî vir ew ê bêhna te fireh bibe.

Bi silavên ji can F. Kafka



## Xanima delal Milena,

Kezeba te jî ha! Min hemû rojê ev di serê xwe de bir û anî, jê pê ve jî tiştek nehate bîra min. Nebêje qey nexweşî min ditirsîne, gofî tiştên ku me behs kiriye - ez dixwazim wilo be jî - bi te re pîrr sivik dest pê kiriye. (Kêm zêde nivê Ewrûpaya roava bi êşa zirav in) ez bi xwe pê dizanim, ev zêdeyî sê salan e ku ji xerabiya wê bêtir qenciya wê gihîştîye min. Berî sê salan, şeveke nivê şevê bi hatina xwînê bi min re dest pê kir. Wek her tiştên nû mirov bi heyecan dibê, mirov ditirse jî; ez hema rabûm ( ez paşê têgihîştim ku divê ez qet tevnelivim) ez çûm ber pencerê, min xwe daqûl kir, ez li hundurê odê geriyam, ez çûm ba mûslîxê, ez li ser nivîna rûniştim - hê jî xwîna min nesekinî bû. Lê digel vê jî ez ne xemgîn bûm. Min dizanîbû ku xwîn bisekîniya, ew bêxewiya min ya ku sê-çar salan dom kiribû, wê dawî bihata. Xwîn sekinî. (Ew roj ev roj e careke din jî nebû). Ez jî heya sibehê ketim xeweke kûr. Sibehê zû xizmetkara min ( wê çaxê ez dûrî Şonbrunê rûdiniştim) keçikeke baş, delal û rindik bû, gava ew çav li xwînê ket: "Divê tu herî ser doktor" wê got, "pîrr tê

re naçe tu ê bimirî". Lê min xwe ji her car baştir hîs dikir. Ez çûm kar, ancax piştî nîvro ez çûme ser doktor. Jê pê ve ne zêde girîng e, ne hewce ye ez behs bikim. Ez dixwazim vê ji te re bibêjim: Ya ku min xemgîn dike ne nexweşiya te ye. (Ez xwe dispêrim bîranînên xwe û ez dixwazim baweriya xwe pê bînim. Digel wê ziravbûna te ya dilşewat, dilxweşiyeke ku aydê gundiyan e bi te re heye. Ji ber vê yekê jî ez dibêjim nabe. Bila haya te jê hebe, an na kezeba te naêşe) ku min xemgîn dike, min difikirîne, sedema vê nexweşiya te ye: "Perê min tune ye, ez bi çayê û nên dijim. Ez ji saet duduwan ta bi heştan dixebitim" te nivîsandîye.

Baş e, em ji van derbas bin. Ez ji van tiştan fêhm nakim. Dibe ku jî mirov nikane hemû tiştî di namê de binivîsîne, divê mirov li hemberî hevdu rûne û li ser van tiştan bipeyive. Erê ez dibêjim em ji van tiştan derbas bin, lê tenê ez di namê de dikarim ji wan derbas bibim, wekî din bêhnekê jî ji bîra min naçe. Ez difikirim, gelo wê ev nexweşiya te ji çi be. Ez bi ya xwe dizanim. Ji xwe sedema ya pîrr kesan jî yek e. Wîlo dibe: Mêjî êdî nikane rahêje eş û zehmetiyan." Ji min evqas tê" dibêje, "yê ku dixwaze ev hemû tiştên girîng li ser lingan bimîne hebe, bila alîkariya min bike, bila barê min sivik bike, belkî em jî jiyana wî hebekî din jî bidomînin". Ji ber pîrr tiştên ku kezeba spî wînda bike tune ye, ez va ye li vir im, dibêje. Haya min ji bazara di navbera mêjî û kezeba min de tune ye. Lê ez niha têdighîjim, ku ev celeb bazar çiqasî talûke ye.

Baş e, tu dixwazî çi bikî? Dibe ku jî qet ne girîng e. Ger tu li xwe miqate bî tu ê tavilê ji vê nexweşiyê xelas bibî. Divê meriv û nasên te bi vê yekê bizanibin. Êdî cih ji ramanên egoîst re jî tune ye. Çawa? Ma ev jî ne riyeye azadbûnê ye? Ma ez neheq im? Naa, na, ez henekan dikim, heta tu ji min re nenivîsînî û behsa başiya jiyana xwe nekî, ez qet kêfxweş nabim.

Piştî ku min nameya te ya dawî xwend, ez êdî nema dibêjim çima tu ji Viyanayê venaqetî, ez niha te fêhm dikim. Lê gelek cihên nêzîkî Viyanayê jî hene, tu dikanî li wan deran bêhna xwe berdî û hinekî bi ser xwe ve werî.

Tu dibînî, ez îro nikanim tişteki din binivîsînim. Bi a min ji vê girîngtir jî tişteke tune ye. Ez ê sibehê behsa tiştên dinê bikim. Herweha ez ê spasiya ji bo defterê jî bispêrim sibehê; tesîr li min kir, ez şermdar kirim, lê ez kêfxweş jî kirim. Raweste, ez dixwazim tişteki din jî ji te re bibêjim: Ger tu saniyekê jî ji xewa xwe bidî wergerên min, ez ê vê yekê ji xwe re mîna nifirekê bihesibînim. Ger rojek ji rojan mehkemeyek vebe, bêî ku dirêj bikin, wê bêjin bêxewiya wê sûcê wî bû, ew ê biheq min sûcdar bikin. Gava ez dibêjim meke, ez li xwe difikirim, ez ji bo xwe li ber te digirim.

Franz Kafkayê te



**Mehabad  
Qeredaxî**

# BERD

Kat detezê

Biwar le jêr bumelerzey temen da

Tarîkî dekate rûpoşî zamekan

Ew berdaney rastiye le koşda ye... serî rojekan deşkênin

Min demewê... le her kwêyek berd hebê... sema bikim

Le her kwêyek berd hebê

Turekeyek şîer bixeme jêr balî temen me... û deroze bikem

Min siwalî rûnakî dekim

Le ber dergayî estêrekan... bû çorê tirife... umrêk dewestim

Le ber pencerey xor da ta bêkota deparêmewe

Ta zemîleyekî pir le hêşûrî germî û tîşkîm dedatê

Le tûnêlî kazîwe da

Ke piyalek rûnakî le çawî estêreyekewe derjê

Ke zengyaney bûlêl le koşî xewnewe derjê

Deng, deng koyan dekemewe

Deyanewê le serabêk da zemen bişon

Deyanewê le dolêk da lotke heşarden

Le boşayî da asman wînkên

Le sirûd da deng derbênin

Deyanewê le min da şîir bikujin

Le berd da rastî nezîf ken

Kat detezê û lalbûn le ser şanoy xak da



Basî mergî şiwên bo cemaerî tarîkî  
degêrêtewe

Kurrkurreyekî xolemêşî... bedenûk  
hêlanekey xoy derûxênê

Êdî derextêk derga le çoleke nakatewe  
Şewnimêk... lêwî gela terr nakat

Efsus...  
Maç debête peyamî ceng  
Ewîn debête teplî şerêkî sard  
Le nêwanî bizutnewey gul û hêrişî dirrk da  
Tîşk debête qasîdêkî bêser  
Lê nêwanî komelgey tarîkî û tarawgey roh da

Bêdengî...  
Peyame sûtawekan degeyenête memleketî  
şew

Kat heldexlîskê  
Şiwên... derçê

Hon... hon ala wek firmêsk heldewerê  
Desk... desk... mêjû wek qersîl desutê

26. 9. 1994, Swêd

#### **Ferhengok:**

Biwar: Delîve, mecal, firsend.

Zamekan: Birîn.

Turekeyek: Kîsek, tûrikek.

Deroze: Xazokî.

Tirîfe: Sinahî, ronahî.

Kazîwe: Berbang, elend.

Heşar: Veşartin.

Çûleke: Çûk, çûçik.

Şewnim: Xunav, avî.

Efsus: Mixabin.

Heldexlîskê: şemitandin, hilisîn.

Desk: Gurzek, qevdek.

Detezê: qerisî, cemidî.

## XEWN

Şev,  
bêdengî û  
xeman xwe  
daweşandin

Ji min re  
rondikên zer pêxistin  
bûne barê min/te

Di nedemekê de  
Di necihekî de  
tevzînokên hêviya kedî  
bi xwelîpîfkê  
nenuxumîne


Di  
beyebanê sawirên min de  
çemekî mişt î teng  
xwe divezilîne

Ez...!  
Bi sîtava bîranînên xwe/te  
volkanekî  
bajarekî  
ditiptipînim.

Evîndar im  
Nameya te didixdixînim.  
Li ser bejna yara xwe  
piyalek meyê dialêsim  
sirûda pîroz  
dihûnim.

**Tengezarê Marînî**

# BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!



Ger hewesa te li ser helbest, çîrok, roman, hevpeyvîn, lêkolîn, huner, sînema û hwd hebe, pêşniyazê me heye; bibe aboneyê NÛDEMÊ!

Ger tu dixwazî ji tevgera huner û edebiyatê ya her çar perçeyên welêt haydar bibî û edebiyata dinyayê ya kevnar û nûjen bi zimanê kurdî bixwînî, dîsan bibe aboneyê NÛDEMÊ!

NÛDEM dixwaze ji avakirina edebiyata kurdî re bibe alîkar, tu jî alîkariya wê bike, bibe abone!

Abonetiya NÛDEMÊ gelekî hêsan e, an telefonekê veke, an jî çend rêzan binivîsîne û


**NÛDEM**

No 1 1992



**NÛDEM**

No 2 1992



**NÛDEM**

No 3 1992



**NÛDEM**


No 10 1994



Kavazo Hazeri, Edohi & Candi

**NÛDEM**

No 11 1994



Kavazo Hazeri, Edohi & Candi

Kavazo Hazeri, Edohi & Candi

**NÛDEM**

No 4 1992



Kavazo Hazeri, Edohi & Candi



Kavazo Hazeri, Edohi & Candi



Kavazo Hazeri, Edohi & Candi

**NÛDEM**

No 7 1993



**NÛDEM**

No 8 1993



**NÛDEM**

No 9 1994



Kavazo Hazeri, Edohi & Candi

**NÛDEM**

No 12 1994